# NETEWA DEMOKRATÎK Û ŞAXÊN WÊ

***<u>Têbinî:</u>* “ Ew pirtûk ji aliyê Akademiya Zanistên Civakî ya Abdullah Ocalan ve hatiye amadekirin. Di amadekirina pirtûkê de ji parêzname û hevdîtinên bi Rêber Apo re, sûd hatiye girtin. Wergera wê ya bi zimanê Kurdî û Erebî jî, ji aliyê Akademinya Civaka Demokratîk a Abid Xelîl û Asya Yûksel ve hatiye kirin. Weke pergal gava Netewa Demokratîk tê nirxandin, piranî bakurê Kurdistanê û tecrûbeya li wir bidest hatiye girtin. Lê, heman nirxandin û tecrûbe ji bo her parçeyek Kurdistanê, Rojhilata Navîn û her devereke ku pergala Netewa Demokratîk lê tê avakirin, derbasdar e û dikare bibe mînak.”**

## *NAVEROK*


*XWESERIYA DEMOKRATÎK*........................................................ ***7***

Projeya Min a Çareseriyê Esasgirtina Xweseriya Demokratîk e ................................................................ 18

*NETEWA DEMOKRATÎK*........................................................ ***29***

Şertên Avabûna Netewê........................................................ 30

Dewlet, Çîn û Netew........................................................ 35

Weke Nasnameya Demokratîk a Civakê Netew................ 39

Exlaq, Polîtîka û Netew........................................................ 44

*ŞAXA SIYASÎ YA XWESERIYA DEMOKRATÎK*........................ ***49***

Siyaseta demokratîk, siyaseta rast a gel e.......................... 52

Heya Xebatên Zîhniyetê Nebin, Siyaseta Demokratîk Nayê Meşandin.................................................................. 54

Kadroyê Siyaseta Demokratîk Wê Bi Kevneşopiya Berxwedanê Ya Rojhilata Navîn Xweyî Bibe...................... 57

Baweriya Ji Hişmendî û Çanda Demokratîk a Gel Esas e ........................................................................ 60

Siyaset, Ne Hunera Parastina Statûkoyê Ye ....................... 62

Kêm dewlet gelek civak e, kêm qedexe gelek azadî ye.. 63

*ŞAXA HIQÛQÊ YA XWESERIYA DEMOKRATÎK*..................... ***66***

Bi Makezagonek Nû û Demokratîk Xweseriya Demokratîk:............................................................. 70

Konfederalîzma Demokratîk - Xweseriya Demokratîk . 76

*ŞAXA ABORÎ YA XWESERIYA DEMOKRATÎK*......................... ***81***

Di Xweseriya Demokratîk De Milkiyeta Taybet................. 85

Parastina Hawirnasiyê(ekolojî) û Teknîka Bi Xwezayê Re Lihevhatî......................................................................... 92

Girîngdayîna Çandiniyê........................................................ 95

Pergaleke Ku Derfetên Kar Zêde Dike û Bêkariyê Ji Holê Radike............................................................................ 98

Kooperatîfên Hilberandin-Mezaxtinê.............................. 100

Çêkirin û Bikaranîna Bendavan ......................................... 106

Bikaranîna Çavkaniyên Sererd û Binerd .......................... 108

Di Backirinê De Pîvanên Ku Esas Werin Girtin............. 110

*ŞAXA ÇANDÊ YA XWESERIYA DEMOKRATÎK* ...................... ***114***
1) Netewa demokratîk, xweseriya demokratîk û ziman...... 114
2- Netewa demokratîk, xweseriya demokratîk û dîrok ....... 126
3- Netewa demokratîk, xweseriya demokratîk û huner ...... 137
*ŞAXA DÎPLOMASÎ YA XWESERIYA DEMOKRATÎK* ............. ***147***
Dîplomasiya Ji Derveyî Dewletê ........................................ 150
2-Dîplomasiya Kurdistana Xweser a Demokratîk a Bi Pêkhateyên Parçeyan Re: ..................................................... 157
3- Dîplomasiya Derve ya Kurdistana Xweser a Demokratîk ................................................................... 161
Dîplomasiya Di Navbera Gelan De ..................................... 164
4- Dîplomasiya Pekhateyên Kurdistana Xweser a Demokratîk a Bi Pêkhateyên Parçeyên Din Re............... 166
*ŞAXA XWEPARASTIN A XWESERIYA DEMOKRATÎK* .......... ***169***
Di Kurdistana Xweser a Demokratîk De Xweparastin 176
*NÊZÎKBÛNÊN ÇEWT ÊN DI DERBARÊ XWESERIYA DEMOKRATÎK DE* ........................................................ ***182***
Nêzîkbûnên Çewt Ên Di Derbarê Xweseriya Demokratîk De: .................................................................................. 184
Xweseriya Demokratîk Xwe Dispêre Pêkhatina Piraniyî Ya Civakê ............................................................................ 184
Xweseriya Demokratîk Xisleteke Gerdûnî Digire Ser Xwe... 185
Xweseriya Demokratîk Hilberîna Angaştek Ku Çareseriyê Ji Derveyî Dewletê Dibîne Ye ......................... 187
Cudahiya Dewleta Unîter-Dewleta Netewe ..................... 189
Xweseriya Demokratîk Ne Projeya Cudakeriyê Ye, Ya Yekitiyê Ye ........................................................................ 191
Bi Xweseriya Demokratîk Tevahiya Cudatî Digihijin Mafên Xwe Yên Ku Hatine Xespkirin ................................. 194
Xweseriya Demokratîk Di Heman Demê De Cudabûna Xwe Ji Dewletê Daxwaz Dike ............................................... 196

## XWESERIYA DEMOKRATÎK

Rêveberiyên xweser ên di asta bajar, cih û herêman de ku di dîrokê de tim giranehiyeke wan a mezin hebû, di nava kevneşopiyên çandî yên gelek girîng ên ku bûne qurbaniyên netew-dewletperestiyê de ne. Di tevahiya rêveberiyên dewletî û civakî yên hatine pêkanîn de, rêveberî û xweseriya xas a xwecihî û herêman her hebûye. Jixwe bi taybetmendiyeke din a cuda ne pêkan e ku dewlet û împaratoriyên mezin werin birêvebirin. Navendperestiya hişt, di esas de weke xisletê(karakter) tekedest a modernîteyê, nexweşiyeke netew-dewletê ye. Weke pêwîstiyek qanûna kar a ezamî hatiye ferzkirin. Ji ber ku burokratên burjûva yên çîna navîn ên ku wekî ûrekî mezin dibin bibin deshilatdar, hatiye sazkirin. Ji ber ku ne yek, bi hezaran pergalên kral ava bikin, weke modeleke ku tenê dikare bi faşîzmê bimeşe, hatiye pêşxistin.

Çaxê ku bi awayeke lez hilweşîna moderniteya klasîk pêk tê, her çi qasî piraniya wan di çawaniya lîberal a cureya postmodernîteyê de bin jî, hin ji wan bi pêşketina tevgerên çandî yên ku tên wateya qutbûna radîkal rist lîstine û di wir de barê herî giran tevgerên xweser ên xwecihî û herêmî digirin ser xwe. Vegerîna ji çanda xwe ya ku di tevahiya serdeman de bi awayeke hêz şaxa siyasî, aborî û civakî jiyan kirine,

ji nû de zîndibûnek dibe mewzûbehs. Wê ya beriya tevgerên ku di wateya civaka dîrokî ya gelek girîng de ne tê. Bê rizgariya bajar, xwecihî û herêmê, rizgarbûna ji nexweşiya netew-dewletê ne pêkan e. Pêkhateya ku wê ya herî baş fêmkiriye û pêkaniye, endamên Yekitiya Ewropayê ne. Hem di bin navê modernîteyê de hovitiyên ku çar sed salên tên jiyankirin, hem jî şerê cîhanê yê yekemîn û duyemîn, derseke besayî daye çanda Ewropa. Zagonên xweseriyê yên bajar, xwecihî û herêmî ku weke pêngava yekemîn hatine pratîkirin, ne tesadûfî ne. Despêkê nîjadkujî di nav de, netew-dewletperestiyê ji bo tevahiya hebûnên çandî nîjadkujiyeke çawa aniye, wê ya bi têgihiştina wan ve eleqedar e.

Îro di Yekîtiya Ewropayê de pêkanîna xebatên herî ber bi çav ên di bergeha bajar, mehelî û çandên herêmî de, di çareseriya tevahiya pirsgirêkên kûrewî de weke hêmanekî(unsûr) herî girîng a sereke rist dilîze. Her çi qasî radîkal nebe jî, tevgereke çandî ya girîng û pêwîst e. Jixwe di tevahiya parzemînên(qite) dinyayê de ji ber ku homojenbûna rêveberiya navendî tam nehatiye spartin û pêşxistin, xweserbûna gelek bajar, mehelî û herêman zindîbûna xwe parastiye. Ji Federasyona Rûsya heya Çîn û Hindîstanê, ji tevahiya parzemîna Amerîkayê(DYA federal e, li Kanadayê xwesertî li pêş e, jixwe Amerîkaya Latînî di rewşa xwesertiya herêmî de ye) heya Afrîkayê(Li Afrîkayê heya rêveberiya kevneşop a eşîrî û herêmî nebe, pêkhatin û rêvebirina dewletê çênabe) pozîsyonên xweser û xebatên xweseriyê mijarên herî çalak û rojaneyî ne. Nexweşiya navendperestiya hişk a netew-dewletperestiyê di hin dewletên Rojhilata Navîn de ku

hejmara wan bi sînor e û di dîktatoriyên din de tê pêkanîn.

Dezgehên netew-dewletê yên navendperestiya hişk ku bûuta herî girîng a modernîteya klasîk e, di jor de bi tengkirina sermayeya kûrewî û di jêr de bi tengkirina tevgerên çandî jevketinên ku tên jiyankirin, hewl tê dayîn ku herî zêde bi rêbazên xwesertî yên bajar, mehelî û herêmî werin îkamekirin. Ew meyla ku di roja me ya îro de her ku diçe bi hêz dibe, pêwîst e ku bi tevgera netewa-demokratîk re jî di nav hev de pêşve biçe. Netewa demokratîk weke teşe(terz) gelek nêzîkî konfederalîzmê ye. Konfederalîzm, bi awayekî teşeya rêveberiya siyasî ya netewên demokratîk e. Bajarekî bi hêz, tenê bi rêveberiyên xweser ên herêmî û mehelî dikare hebûna xwe bi dest bixe. Weke teşeya rêveberiyê her du tevger jî di rewşa heman û ketin hev de ne. Netew û netewbûna demokratîk, bê xwesertiya bajar, mehelî û herêmî nikare hêza rêveberiyê bi dest bixe. Yan dê bikeve kaosê belav bibe, yan jî dê bi modeleke nû ya netew-dewletperestiyê derbas bibe. Ji ber ku nekeve her du rewşa, divê tevgera netewa demokratîk bi teqez xweseriya demokratîk a bajar, mehelî û herêmî pêş bixe. Li beranberî wê ya, ji ber ku rêveberiyên xweser ên bajar, mehelî û herêmî bi giştî neyên daqurtîn, ji ber ku hêza xwe ya aborî, civakî û siyasî tam bikar bîne, pêwîst e ku weke netewa demokratîk bi tevgera netewî ya demokratîk re bibe yek. Netew-dewletperestî, ji bo her du tevgeran yekdestên hêz ên navendperestiya pir zêde ya ku li ber derî digire û dide spêrtin, tenê bi lihevhatineke saxlem a di navbera hev du de dikare were derbaskirin. Di rewşeke berovajî de her du tevger ango bûyer, weke

ku berê jî gelek caran hatiye jiyan kirin, di bin gefên homojenkirinê de nikarin ji tasfiye û helandinê rizgar bibin. Şertên dîrokî çawa ku di sed sala 19. de zêdetir li gel netew-dewletperestiyê bû, di şertên roja îro de(ango rastiyên sed sala 21. ) jî li gel netewên demokratîk û rêveberiyên xweser ên bajar, mehelî û herêmî yên ku di her astê de xwedî hêz e ye.

Di serdema navîn de polîtîkayên xweseriyê yên bajaran, karibûne hin berfirehtir werin pêkanîn. Bajarên ku li hemberî împaratoriyên mezin li berxwe didin bi qasî ku neyên hejmartin zêde ne. Li hemberî împaratoriyên Îslamî(Emevî, Ebasî, Selçûqî, Tîmur, Babûr, Osmanî) heya împaratoriya Cengîzî û li hemberî împaratoriyên Xiristiyanî(Bîzans, Îspanya, Avûstûrya, Rûsiya Çar, Birîtanya) heya împaratoriyên Çînê bi sedan bajaran(Ji Omana(okyanûs) mezin heya omana Atlas û parzemîna Amerîkayê, ji Çola Sahraya Mezin heya Sîbîryayê) li ser navê polîtîkaya xweseriyê pêwîst dîtine ku heya ji dîrokê tune dibin, li berxwe bidin. Mînaka ku dişibe zevîkirina Kartacayê, bajarê Otrar ê ku li hemberî Cengîz Xanî berxwe daye heye. Ew jî kirine zevî. Mirov dikare bi sedan mînakên bajarên Ewropayê ku hem li hemberî hêzên împaratoran, hem jî li hemberî navendperestiya netew-dewletperestiyê berxwe dane bide. Bi taybetî bajarên Îtalya û Almanyayê heya nîveka sed sala 19. jî ji ber ku dezgehên xwe yên xweser biparêzên berxedanên gelek mezin dane. Ji wê berxwedanê mînakên li pêş Venedîk û Amsterdam in.

Ji ber ku di sed sala 19. de netew-dewletê di her alî de serkeftin bi dest xistiye, bûye sedema

derbeyeke mezin a xweseriya bajaran a ku bi hezar salan hebûna xwe domandine. Lê belê postmodernîte û xweseriyên bajaran ji nû de belav dibin. Siyasetvaniya bajaran derdikeve pêş.

Li hemberî hêzên şaristaniyê ên di dîrokê de, ne tenê siyasetvaniya bajar, ji ber ku di rewşa hêza polîtîk a xweser de bimînin, weke qebîle, eşîret, cemaetên olî, ekolên felsefî hwd. hin beşên civakî gelek berxedanî kirine. Çîroka xweseriyê ya sê hezar û pênc sed salan(BZ. 1600- heya roja îro) a qebîleya Îbrahîmî dibe ku mînaka herî bi nav û deng be. Di dîrokê de heya roja me ya îro, di dewlemendbûna zêde û xulikariya Yahudiyan de polîtîkaya xweseriyê ya qebîleya Îbrahîmî risteke xuyaker lîstiye. Beranberî veguherandina împaratorî û amûrê deshilatdariyê ya ola Îslamê, mezhebên berxwedanê yên gelek mezin derketine holê. Mezhebên Elewîtî û Xaricîtî, polîtîkayên jiyanî yên xweser ên qebîle û eşîretan didin der. Hikumraniya Sunî, li dijî kevneşopiya sultaniyê derketina mezhebên muxalif ên ku di bunya her qewman de tê dîtin, di rastiya xwe de encama polîtîkayên berxwedêrî û azadîxwaziyê ya gelên eşîret û qebîleyan e. Bi awayekî li dijî mêtîngeriya Îslama sunî, tevgerên yekemîn ên azadî û serxwebûna gelan in. Bi heman awayî di Xiristiyanî û Mûsewiyê de jî gelek mezhebên berxwedêriyê hene. Tevahiya serdema navîn bi cemaetên xwecihî, bajariyî, qebîleyî û olî tejiye ku ji bo polîtîkayên xwe yên xwesertiyê jiyanekî bi berxwedêrî derbas kirine. Jiyana berxwedêriya keşîşxaneyê(manastiriyê) ya sê sed salên nîv-nepeniyê ya cemaetên yekem ên Xiristiyaniyê, di amadekirina şaristaniya nûjen de risteke sereke lîstiye. Polîtîkayên xweser ên serdema

antîk(kevin) ên ekolên felsefeya Yewnan, rista amadeker a bingeh zanistiyê lîstiye. Gel û netewên ku heya roja îro hatine, herî zêde wê rastiyê deyndarê kalikên xwe yên weke eşîret û qebîleyan in ku li serê çiya û nava çolan de bi hezar salan li berxwe dane.

Tevgerên rizgariya neteweyî yên serdema modern, berdevamiya wê kevneşopiyê ne. Her çi qasî weke dewleta serbixwe hatibe berovajîkirin jî, armanca ku hemû li pey dibezin, serxwebûna polîtîk e. Serxwebûna polîtîk a lîberalîzmê her çi qasî bi veguherandina serxwebûna netew dewleta sexte polîtîkayê di erka wê ya rast de asteng bike jî, dîsa tê wateya domandina kevneşopiya berxwdêr a polîtîk.

Di dîrokê de polîtîkayên xweseriyê yên mehelî û herêmî her hebûne û di domandina hebûna civaka exlaqî û polîtîk de ristekî girîng lîstine. Di serî de qadên çiyayî, çol û daristanî di nav de, di erdnîgariyeke gelek girîng a li ser rûyê erdî de netew û gelên ku weke qebîle, eşîret, civaka gund û bajaran jiyan kirine, li hemberî hêzên şaristaniyê bi polîtîkayên serxwebûn û xweseriyê her tim berxwedan nîşan dane. Ji ber wê çendê em dibêjin ku; di dîrokê de meyla serwer ne serî tewandine, berxwedan e. Eger wisa nebûya, dê dinya weke Misra Fîravûnî bûya. Heya em nezanibin ku bê berxwedan û polîtîkayê tu herêm û xwecihiyeke mirovan namîne, em ê nikaribin dîrokê rast şîrove bikin. Eger heya niha jî gelên Amerîkaya Latînî, Afrîka û Asyayê, bi hemû reng û çandan xwe li berxwe didin, wê ya tê vê wateyê ku dîroka wan jî wisa ye. Ji ber ku dîrok ‘niha’ye.

Di navbera hêzên şaristaniyê û hêzên demokratîk de weke ku gelek caran pêkhatiye, hêzên moderníteya kapîtalîst û hêzên moderníteya demokratîk jî li ser esasê pejîrandina hebûn û nasnameya hev du û naskirina rêveberiya xweser a demokratîk, dikarin di nava aştiyê de bi hev re jiyan bikin. Di wê bergehê û şertan de, di hundir û derveyî sînorên netew-dewletê de, bi pêkhatina siyasî ya konfederala demokratîk û pêkhatinên netew-dewletê, dikarin bi hev re aştiyane jiyan bikin. Çawa ku konfederalîzma demokratîk xwediyê potansiyeleke wisa ye ku dikare neyîniyên xwe yên ku xwe dispêrên sîstematîka netew-dewletê derbas bike, amûra herî guncav a polîtîkirina civakê ye jî. Konfederalîzma demokratîk hêsan e û dikare pêk were. Weke yekeyek polîtîk her civat, etnîsîte, çand, cemaeta olî, tevgera entelektûel, yekîneya aborî hwd. dikarin xwe bi sazkirina xwesertiyî îfade bikin. Federe an jî têgeha xwesertî û xwebûnê, mirov dikare di wê çerçovê û bergehê de binirxîne.

Eger em wê rewşê li ber çav bigirin, di derbarê konfederalîzma demokratîk de em dikarin wê ya bêjin:

Konfederalîzma demokratîk ber bi pêkhateyên siyasî yên cuda û gelek tebeqeyan re vekiriye. Pêkhatinên siyasî yên cuda yên berwarî(ufqî) û tîkane(emûdî), bi sedema vesaziya civaka heyî ya têkel re pêwîst e. Pêkhatinên siyasî yên navendî, mehelî û herêmî di nava hevsengiyekî de bi hev re digire. Ji ber ku her ji wan yek bersivê dide şertên şênber û vesaziya siyasî ya piranîparêz, nêzîkî peydakirina riyên çareseriya herî rast a pirsgirêkên civakî ne. Bi pêkhatinên siyasî xwe îfadekirina

nasnameyên çandî, nîjadî û netewî, mafê wan ê herî xwezayî ye. A rast civaka exlaqî û polîtîk wê ya pêwîst dike. Çi bi awayî netew-dewlet, çi bi awayî komar, çi jî bi awayî demokrasiyên bûrjuva dibe, bi rêgezên dewletê re ber bi lihevhatinên rêgezî ve vekiriye. Li ser esasê aştiya rêgezî dikare bi hev re were jiyankirin.

Konfederalîzma demokratîk xwe dispêre civaka exlaqî û polîtîk. Projeya şablonîst a ku xwe dispêre endezyariyên civakê ya kapîtalîst, sosyalîst, feodal, endûstriyalîst, birandoxî, hewldanê civakê di bergeha yekdestên kapîtalîs de dibîne. Ew cure di rastiya civakê de nîne, propaganda wê heye. Weke esasî civak bi polîtîk û exlaqî ne. Yekedestên ekonomîk, siyasî, bîrdozî û leşkerî wê rewşa xwezayî ya civakê dikiritînin û pergalên ku li pey zêdek-nirx(zêdebarî) ango xeraca civakî dibezin in. Bi serê xwe tu nirxekî wê nîne. Şoreş jî bi serê xwe nikare civakê biafirîne. Şoreş, tenê weke operasyonên ku civakê dejenere dike, kevn dihêle û ji ber ku bigihîje nirxê xwe yê exlaqî û polîtîk ê esasî, dikarin ristekî erênî bilîzin. Wekî din vîna azad a civaka exlaqî û polîtîk dide xuyakirin.

Konfederalîzma demokratîk xwe dispêre siyaseta demokratîk. Li beranberî feraseta îdare û rêveberiya navendperestiya hişk, xeta rast û bûrokratîk a netew-dewletê, tevahiya grupên civakî û nasnameyên çandî bi pêkhatinên siyasî yên ku xwe pê îfade dikin dikarin xwerêvebirina civakê pêk bînin. Ne bi tayînkirina di astên cuda de, bi rêveberên ku bi

hilbijartinê hatin li ser erkê, kar tê dîtin. Ya girîng jêhatîbûna biryarê ya bi meclîs û nîqaşan e. Rêveberiya li gorî serê xwe ne derbasdar e. Ji lijneya koordînasyonê ya navenda giştî(meclîs, komîsyon, kongre) heya dezgehên xwecihî li gorî bastûra(bunye) her grup û çandê, bi venêrîna lijneyên ku di nava cudahiyan de yekitiyê digerin û bi pir pêkhateyan re venêrîn û rêveberiya demokratîk a karên civakî dikare pêk were.

Konfederalîzma demokratîk xwe dispêre xweparastinê. Yekîneyên xweparastinê ne li gorî yekdestiya leşkerî, li gorî pêwîstiya ewlekariya hundirîn û derve, di bin çavdêriyake xurt a dezgehên demokratîk de hêza bingeh e. Peywirên wê; weke dezgehê biryara wekhevperestiyê ya li ser esasê cudahî û azadiyê ya civaka exlaqî û polîtîk, vîna siyaseta demokratîk derbasdar dihêle. Destwerdana hêzên ku di hundir û derve de wê vînê vala derdixîne, asteng û tune dike, bê bandor dihêle. Dezgeha fermandeya yekîneyan, hem di bin dezgehên siyaseta demokratîk, hem jî di bin venêrîna cot a endamên yekîneyê de ne, lewma pêwîstî were dîtin bi pêşniyar û erêkirina beranberî hev, bi awayekî rehet dikare were guhertin.

Di rêxistinbûna konfederal a demokratîk de gelemperî cihê hegemonyayê, bi taybetî cihê hegemonyaya bîrdozîk nîne. Rêgeza hegemonîk di şaristaniyên klasîk de derbasdar e. Di şaristaniyên demokratîk û modernîteyê de, bi xweşbînî li hêz û bîrdoziyên hegemonîk nayê nêrîn. Gava ku sînorên îfadeya cuda û rêveberiya demokratîk derbas dike, bi azadiya xwerêvebirin û îfadeyê tên bêbandorkirin. Feraseta beranberî hev a di rêvebirina kolektîf a karên civakê de, girêdanbûna rêzgirtina pêşniyarên

cuda û esasên bîryarên demokratîk şert e. Di wê mijarê de ruxmî li hev aliqîna şaristaniya klasîk a giştî û feraseta rêveberiya modernîteya kapîtalîst û netew-dewletê, di navbera ferasetên rêveber a şaristaniya demokratîk û modernîteyê de cudahî û cihêtiyeke mezin heye.

Di heman demê de hegemonya bîrdozîk ne mewzûbehs e. Piranîparêzî, di navbera nêrînên cuda û bîrdoziyan de derbasdar e. Pêwîstiya rêvebiriyê ya ku xwe bi kamûfleya bîrdozîk bi hêz bike, nîne. Lewma, çawa ku pêwîstiyê bi nîjadperestî, olperestî, zanistiya pozîtivîst û zayedperestiyê nabîne, li dijî avakirina hegemonyayê ye jî. Bê ku bingehê civaka exlaqî û polîtîk bimehîne û li pey hegemonyayê bibeze, xwedî maf e ku her cure nêrîn, raman û baweriyê bi awayekî azad îfade bike.

Rêxistinbûna konfederal a demokratîk, li beranberî feraseta yekîtiya NY( Netewên Yekbûyî)

a netew-dewletên ku di bin venêrîna hêza hegemonîk a super de ne, li gel civakên netewî yên Yekîtiya Konfederala Demokratîk a Dinyayê ye. Çi weke hejmarî, çi jî weke çawanî li gorî krîterên siyaseta demokratîk civakên gelek berfireh di Konfederasyona Demokratîk a Dinyayê de bi yek kirin, ji bo dinyayeke hîn bi ewle, wekhevîparêz, ekolojîk, dadwerî û hilberîner şert e.

Konfederalîzma demokratîk wekî ku tê zanîn ne teşeyeke rêvebirina ya roja me ya îro ye. Pergaleke ku bi hemû giranehiya xwe di dîrokê de cihê xwe girtiye.

Di wê wateyê de dîrok ne navend dewletî ye, konfederal e. Ji ber ku forma dewletê gelek fermî bûye hatiye nasîn. Lê belê, jiyana civakî zêdetir nêzîkî konfederalîzmê ye. Gava ku dewlet her ber bi navendperestiyê ve dibeze, berjewendiya yekdestên deshilatdariyê esas digire. Wekî din nikare wan berjewendiyan biparêze. Tenê navendperestiyekî gelek xurt dikare ewlebûnê biparêze. Di konfederalîzmê de berovajiya wê ya derbasdar e. Ji ber ku ya esas digire ne yekdestî ye, civak e. Lewma neçare ku bi qasî ku ji dest tê, xwe ji navendperestiyê dûr bigire. Ji ber ku civak ne homojen in(yek kutle) û ji gelek civat, sazî û cudahiyan pêk tên, hemû jî neçar dimînin ku di nava ahengekî de tevdayiyê biparêzin. Lewma ji bo wan piraniyan rêveberiyekî navendperestiyek zêde, dê her tim rê ber bi teqînan veke. Di dîrokê de gelek mînakên wisa hene. Konfederalîzma demokratîk jî, ji ber guncavbûna xwe ya ku her civat, sazî û cudahî dikarin bi awayekî rehet şewq vedin, zêdetir tê jiyankirin. Eger weke pergalekî zêde nayê naskirin, ji ber bîrdozî û pêkhatinekî hegemonîk a hebûneke fermî ye. Her çi qasî pênaseyekî wê ya fermî nebe jî, civak di dîrokê de weke esasî konfederalîst e. Hemû rêveberiyên eşîret, qebîle û qewman, her tim destûr dane konfederalîzma ku têkiliyên wê di çawaniyeke sist de ne. Nexwe wekî din xweseriya wan a hundir zerar dibîne. Wê ya jî hebûna wan belav dike. Heya di nava hundirê împaratoriyan de jî gelek rêveberiyên cuda hene. Rêveberiyên her cure qebîle, eşîret, qewm, otorîteyên olî, qraltî, heya komar û demokrasiyê jî, dikarin di bunyeya împaratoriyekî de bigihijin hev. Di wê wateyê de împaratoriyên ku herî navendî tê hesiban din jî, bi awayekî konfedaralîzê tînin ziman. Meyla

navendî; modeleke îdarî ye, ne civak e û meyla yekdestî ye ku pêwîstiyê pê dibîne.

Cudahî, dijbertiya kapîtalîst û modernîteya demokratîk tenê ne îdealek e, du cîhanên ku di şênbertiyê de jiyan dikin in. Di dîrokê de ew du cîhan, di rewşa dijbertiyên diyaletîk de car caran bi hev re şerên bê eman kirine, lê di navbera xwe de aştî jî kêm nekirine. Di roja me ya îro de jî, bi heman têkilî û nakokiyên xwe hin caran şer dikin, hin caran jî pêk tên. Bêguman; di pêxirtengiya binyatgeriya pergala heyî de weke entelektuel, polîtîk û etîk kesên ku dikarin derketineke rast, baş û bedew bikin, wê bikaribin encamê jî diyar bikin.

## Projeya Min a Çareseriyê Esasgirtina Xweseriya Demokratîk e

Li beranberî bidestxistina hebûna li ser bingehê sermayedarî, endûstrî û netew-dewletê ya modernîteya kapîtalîst, min hewl da ku bi berfirehî dahurandin û vekirina moderniteya demokratîk a ku li ser bingeha komunalîte, eko-endûstriyel û netewa-demokratîk hebûnê bidest dixê, pêşkêş bikim. Min hewl da ku ez komunalîteya demokratîk ne weke wekheviya civakek homojen, weke bidestxistina çendaniya(nîcel)kesekî heya ya mîlyon kesan, weke her civateke ku çawaniya civaka exlaqî û polîtîk digire li ser xwe *(her cure civaka ku ji jinê heya civata zilaman, ji spor û hunerê heya endûstriyê, ji entelektûelan heya şivanan, ji qebîleyê heya şîrketan, ji malbatê heya netewan, ji gund heya bajaran, ji xwecihiyê heya kûrewîbûnê, ji klanî heya civaka kûrewiyê)* pênase bikim. Min rastiya civaka eko-endûsriyî weke civaka gund-çandinî û civaka bajar-

endûstrî ku hev du têr dikin û weke civakên eko-endûstriyî ku bi teqezî xwe li gorî ekolojiyê guncav dikin, pênase kir. Min hewl da ku netewa demokratîk jî bi pêkanên konfederalîst ên demokratîk ku weke teşeya polîtîk a bingeh e, ji nîjad heya olê, ji civatên bajariyî, xwecihî, herêmî û netewî heya cureyeke nû ya netewê ku di rewşa pêkhatinên siyasî yên xweser a demokratîk de ku her cure hebûnên çandî ava dike, a rastir li hemberî cinawirên netew-dewletperestiyê weke pirnasnameyî, pirçandî û pêkhatina siyasî ya pirnetew bidahûrînim û vekim.

Di wê bergeha rastiya dîrokê de, ez dikarim ji bo xweseriya demokratîk wiha bêjim;

Projeya min a çareseriyê, esasgirtina xweseriya demokratîk e. Projaya min a xweseriya demokratîk, çareseriyeke ku bi sînorên di nava xwe de nakeve pevçûnê, her wiha di esasê xwe de hegemonya gerdûnî red dike, lê pêre nakeve şer, bi şertê parastina rêgezên xwe, çareseriyeke ku di nava hegemonya kûrewî de ku jê re ‘împaratorî’ tê gotin winda nabe û dikare hebûna xwe bidomîne. Ew çareserî, rêgezên konfederalîzma demokratîk jî digire nava xwe. Min qala siyasî, civakî-çandî, aborî, dîplomatîk, ewlekarî û hiquq kiribû. Xweseriya demokratîk wan şeş rêgezan dihewîne. Li ser bingehê xweseriya demokratîk çareseriya wê pirsgirêkê dê tevahiya Rojhilata Navîn ronî bike. Dê ji bo Îtalya û Îspanyayê jî bibe modelek. Nêrînên min ên di derbarê dewlet û deshilatdariyê de bi nêrînên Gramscî re di heman rastênhevê(paralel) de ne. Marks netew-dewlet qebûl kir. Lê ez qebûl nakim. Sedemê bingehîn a qeyrana ku niha li Ewropa jiyan dike jî, dîsa feraset û vesaziya netew-dewletê ye.

Armanc û nêrîna me; di riyên aştiyane de wê çareseriyê bi xesarekî herî kêm pêk bîne.

Em dikarin xweseriya demokratîk wisa îzah bikin; ger netewa demokratîk ruhek be, xweseriya demokratîk jî beden e. Xweseriya demokratîk di avabûna netewa demokratîk de weke goşt û nênokê ye. Rewşa bedenbûn û şênberbûna wê ye. Çend şaxên xweseriya demokratîk hene:

**1-Şaxa Siyasî:** Ew şax jî dibe meclîs. Ango dibe kongreyekî ya gel. Ew kongre, kongreya civaka demokratîk e. Lijneyeke rêveber a biçûk a wê kongreyê heye.

**2-Şaxa Hiqûqî:** Statûya hiqûqê ya projeya xweseriya demokratîk îfade dike. Em ji wê ya re statû bêjin. Katalanî jî wê ya weke 'statû' îfade dikin. Wê ya gelek girîng e. Weke hiqûq dê statûya Kurdan çawa be? Hûn hiqûqê dizanin. Makeqanûn û qanûnan derdixîne pêş. Qanûn, çerçove û naveroka xweseriya demokratîk dide diyarkirin.

**3-Şaxa Aborî:** Polîtîkayeke aboriyê ya netewa demokratîk a ku hatiye avakirin heye. Pêwîst e aboriyeke çawa hebe, wê ya tê xuyakirin. Polîtîkayekî ya bendavan û çavkaniyên sererd-binerd heye. Ger bac(vergî) were girtin, çawa û bi çi qasî dê were girtin? Bi şaxa aboriyê ew mijar tên diyarkirin. Weke pergala aboriyê, em nikarin kapîtalîzmê qebûl bikin. Dibe ku em bi temamî nikarin kapîtalîzmê ji holê rakin, lê di astekî girîng de pergala aboriyê ya kapîtalîst dikare were guhertin, mehandin û li gorî wê

em dikarin pergala xwe ya aboriyê ava bikin. Ew pergal dibe aboriya gel. Beşek wê jî aboriya taybet ava dike. Ango dibin şîrketên taybet. Divê ew giştî were nîqaşkirin.

**4-Şaxa Çandî:** Şaxa çandî zêdetir ziman, perwerdeya zimanê zikmakî, dîrok û hunerê digire nava xwe. Têkiliya Kurdî dê bi Tirkî re çawa be, perwerdeya zimanê zikmakî çawa dikare pêk were, polîtîkaya ziman a netewa demokratîk dê çawa be, divê ew mijar werin nîqaşkirin. Pêwîst e ku polîtîkayeke perwerdehiyê were avakirin. Kurd, komkujiya çandî bi temamî çawa dikarin derbas bikin? Komkujiya çandî, divê bi nîqaşên ku di wê mijarê de tên kirin were derbaskirin.

**5-Şaxa Xweparastinê:** Em dikarin ji wê ya re şaxa ewlekariyê jî bêjin. Em di wir de komkujiyê digirin dest. Kurd çawa dikarin ji komkujiyê rizgar bibin? Divê wê rewşê şênber bikin.

Komkujiya di wir de, tevahiya cureyên komkujiyan digire nava xwe. Ne tenê komkujiya fîzîkî, ez qala ya çandî û her cure komkujiyan dikim. Divê Kurd bibin xwediyê rewşa xweparastinê. Civak, di wir de xweparastina xwe ava dike. Bi wê ya ez qala tenê xweparastina ku çek di dest de ye nakim. Xweparastin, ne terzê pêkhatina çekdarî ya KCK, PKK'ê, pêkanîna ewlekariya gel bixwe ye. Ez qala civaka demokratîk a ku di her qadê de xwe rêxistin dike, sazîbûna xwe pêk tîne û xwe digihîne pergala xwe ya ewlekariyê dikim. Wê ya zêdetir gel nîqaş dike û dikarin bigihijin encamên cuda. Mînak; dê zarokên xwe dişînin leşkeriyê? Dê di leşkeriyê de cih bigirin, wê ya tê nîqaşkirin. Mesele cerdevanî dê çawa were

rakirin û ev pirsgirêk dê çawa were çareserkirin? Divê ew mijar werin nîqaşkirin. Ew şaxa ewlekariyê, xweparastina gel bi qasî nan-av-hewa girîng e. Wê ya nebe, nayê jiyankirin.

Şaxa ewlekariyê ya xweseriya demokratîk ji hêla hin rewşenbîran ve weke feraseta dewletê ya cuda tê şîrovekirin. Ez di ferqa wê de me jî. Ew mijar xelet tê fêmkirin. Ez hezdikim wê ya bêjim: Di nava pêkhatina leşkerî de Kurd dê cih bigirin an na? Di nava dezgehên polîs-ewlehiyê de Kurd dê cih bigirin an na? Nêrîna wan saziyan dê li hemberî Kurdan çi be? Kurd dê çawa xwe biparêzên, dê ewlehiya xwe çawa bixin garantiyê? Ew mijar gelek girîng in. Di demên pêş de ez ê li ser wan mijaran bisekinim. Wê şaxa ewlekariyê BDP'e, PKK'e jî bi serê xwe nikare pêk bîne, wê ya ez ê bimeşînim, di demên pêş de ez ê wan mijaran bi berfirehtir bînim ziman.

**Şaxa Dîplomasiyê:** Wê ya jî têkiliya Kurdan a bi gel û civakên din re digire dest. Bi welatên cîranderdor û bi Kurdên parçeyê din re têkilî çêdibin. Em bi civakên din re têkiliyeke çawa dixwazin, divê em bi wan re çawa jiyan bikin? Şaxa dîplomasiyê wê ya pêşwazî dike.

Dikare zêdetir were dirêjkirin, lê ew şeş şax têrê dikin. Ew çerçoveyek e, xetên sereke ew in. Ji bo wan şaxan her yekê, komîsyon ava dibin û li ser wan xebat çêdibe.

Xweseriya demokratîk û makezaqona demokratîk tiştên cuda ne. A ku xebatên makezagoneke (makeqanûn) demokratîk di tevahiya Tirkiyê de dike û bi tevahiya rêxistinên sivîl ên civakî re hevdîtinê pêk tîne, BDP(Partiya Aştî û Demokrasiyê) ye. Ew peywira

BDP’ê ye. Divê di derbarê makezagona demokratîk de xebateke xurt a BDP’ê hebe. Di derbarê makezagona demokratîk de bila projeyên wan hebin. KCK, PKK dê di nava pergala xweseriya demokratîk de cihê xwe kifş bikin. Wê ya karê wan e û ew dizanin. Kurd, DTK, BDP jiyaneke çawa dixwazin, dê nîqaş bikin û bîryara wê ya bidin. Wê ya dê şev û roj nîqaş bikin.

Weke çandî, aborî, hiqûqî, ewlehî û dîplomasî saziyên xweseriya demokratîk bi berfireh in. Di her mijarê de nîqaşên kûr dikare were kirin. Di akademiyan de zemînê wan nîqaşan dikare were ava kirin. Gel dikare dahûrandin û tehlîlên xwe di meclîsa bajarî de bixe bin bîryarê. Ji ber ku bibe mînak ez dibêjim; weke nimûne li Amadê bi rêxistinbûnên xurt hin yekîne dikarin werin ava kirin: Weke Yekîtiyaya Esnafên Demokratîk, Yekîtiyaya Hunermendên Demokratîk, Yekîtiya werzîşvanên Demokratîk… Weke wan yekineyan mirov dikare gelek yekîneyên demokratîk ava bike. Ew yekîne, nûnertiya xwe di meclîsa bajarî de dibînin. Xweseriya demokratîk, bi netewa demokratîk re weke ruh û bedenê ye. Ruhê netewa demokratîk jî, bi wî awayî hev du temam dikin, ji hev du qut nabin. Têkiliya ruh-beden jî bi wî awayî ye. Beden nebe ruh, ruh nebe beden nabe. Netewa demokratîk nebe, xweseriya demokratîk nabe, xweseriya demokratîk nebe netewa demokratîk nabe.

Projeya xweseriya demokratîk a ku em tînin ziman, xwe naspêre nîjad û sînorên erdnîgariyê. Di feraseta me ya xweseriya demokratîk de feraseta yek nîjad, yek erdnîgarî nîne. Min di parêznameya xwe ya

‘Sosyolojiya Azadiyê’ de bi berfirehî qala wan mijaran kiriye. Feraseta me ne feraseta Kurdîtiyê ye. Bi me re feraseta Kurdîtiyê ya bi serê xwe nîne. Em bi wê ferasetê tevnagerin. Modela xweseriya demokratîk a ku me derxistiye holê, tena serê xwe, xwe naspêre Kurdîtî, Tirktî û Erebtiyê. Xwe dispêre demokrasiyê. Mînak; li Hatayê, li Edeneyê xweseriya demokratîk dikare were ava kirin. Ereb bi giranehî li wir dikarin xwe îfade bikin. Feraseta me ya xweseriya demokratîk xwe naspêre yek baweriyê jî. Xwe dispêre gelan, heya dibe ku weke gel îfadekirin jî kêm bimîne. Xwe dispêre tebeqeyên civakî yên cuda, çînên civakî û beşên civakî. Xweseriya demokratîk a ku em qal dikin, tenê ne di derbarê Kurdistanê de ye, di derbarê Ege, Behra Reş, Anatoliya Navîn de ye jî. Di wir de ya girîng lêpirsîn û derbaskirina feraseta netew-dewletê ya bi modernîteyê derketiye holê ye. Divê nîqaş li ser wê ya werin pêşxistin. Em lêpirsîna ceribandina netew-dewletê ya çar sed salan a bi modernîteya kapîtalîst derketiye holê, dikin. Em neçar in modela netew-dewletê ya ku ji çînên civakî, tebeqeyên civakî û beşên civakî re teng tê, bibînin. Jixwe Ewropa jî dest bi nîqaş û derbaskirina wan mijaran kiriye. Netew-dewlet neçare ku feraseta kapîtalîst a navendî derbas bike. ‘Teoriya Qefesa Hesin’ a civaknas Weberî ku ez jî tevlî dibim, heye. Li gorî wê teoriyê; netew-dewlet civakê ji stûyê ve digire nava qefesê û bi xwe ve girtî dihêle. Civak, di nava wê qefesa hesin de dîl tê girtin. Texrîbata netew-dewletê ya li ser civakê mirov dikare bi wê teoriyê bîne ziman. Ew qefesa ku netew-dewletê saz kiriye, ji bo civakê teng tê. Ya ku em jî hewl didin pêk bînin, ji holêrakirina wê texrîbata netew-dewletê ye.

Feraseta netew-dewletê ya di Tirkiyê de heye, ne çareseriya pirsgirêkan e, çavkaniya pirsgirêkan bixwe ye. Ew pergal ji dûrî rastiya civaka Rojhilata Navîn û Tirkiyê ye, divê ew were derbas kirin. Tirkiye, bi rewşa xwe ya heyî ji bo tu beşan nabe bersiv û mirov tetmîn nake. Ew feraseta netew-dewletê ya di Tirkiyê de, di her aliyê dest bi dapêşkandinê(dapitîn) kiriye. Di Tirkiyê de pêvajoyeke wisa despêkir. Her beşek ji kuncekî ve hewl dide ji wê netew-dewletê bidapîne. Di wir de ya ku ji ber me Kurdan dikeve, dibe ku pêşengtîkirina wan mijaran be. Em projeya xweseriya demokratîk bi xwe re sînor nagirin. Em bi tenê naspêrin nîjadiya Kurdîtiyê. Kurd, îro dikarin pêşengtiya wê ya bikin, lê ew feraseta xweseriya demokratîk projeyeke ku tevahiya Tirkiyê digire nava xwe. A ku di wir de pêwîst e were dîtin, bi feraseta netew-dewletê Tirkiye nayê rêvebirin e. Xweseriya demokratîk li hemberî netew-dewletê vebijêrkekî herî rast e ku dikare pêk were. Ne tenê ji bo Kurdan, vebijêrkeke ku dikare li her derê, li Tirkiyê, li Rojhilata Navîn pêk were. Di rêveberiya xweseriya demokratîk de a girîng vîna rêveberiya civakê ye. Civak, erkên dewletê yên xuya bi dest dixe û feraseta rêveberiya xwe pêş dixe. Erkên ku di destê dewletê de dimînin, dê hin erkên sînordar bin. Civak, dewleta navendî sînordar dike, bi erkên xwe dê xwe birêve bibe. A girîng, sînordarkirina dewletê ye. Ez ji wê re dewrkirina erkên navendî ya ji bo civakê dibêjim. Ez di wir de tenê qala gel jî nakim, qala civakê dikim.

Wekî ku min aniye ziman Kurd tenê di Tirkiyê de pêşengtiya wê ya nakin. Ew proje bi Tirkiyê re ne sînordar e. Ji bo Iraqê jî, ji bo Rojhilata Navîn jî

derbasdar e. Li wan cihan jî pêk tê, bi pêş diçe. Ew geşedan hev du têr dikin, bi awayekî ku hev du agahdar in pêşve diçe. Ez nabêjim em ê bi demildest netew-dewletê ji holê rakin. Lê netew-dewlet weke rewşa ku di têde ye jî nayê qebûl kirin. Dibe ku netew-dewlet zûbizû neyê derbaskirin, em di hişmendiya wê ya de ne. Lê belê em qîma xwe bi netew-dewletê jî nayînin. Niyeta me nîne ku em netew-dewletê îdare bikin.

A ku di Tirkiyê de tê afirandin, avakirina yek netewê ye. Di dîroka komarê de heya niha ya ku hez dikin weke nasnameya netewê biafirînin, nasnameya Tirkbûnê ye. Beriya niha min weke 'Bîrdoziya Tirkperestiyê ya ne Tirk ' bi nav kiribû. Min bi vî awayî pênase kiribû. Bila di wir de xelet neyê fêmkirin, min berê jî gotibû, ez dijminahiya Yahûdîtiyê, antî-semîtîsbûnê nakim. Lê, weke rastiyeke dîrokî divê ez bidim diyarkirin ku di “Bîrdoziya Tirkperestiyê ya ne Tirk” de Yahûdiyan rol girtiye. Beriya niha min ji bo wê ya “Sîyonîzma Anatoliyayê” gotibû. Yahûdiyan bi pêşxistina wê bîrdoziya Tirkperestiyê, di Tirkiyê de netew-dewlet ava kirin. Di bingehê netew-dewleta Tirkiyê de ew bîrdozî heye.

Em wê feraseta faşîst-Tirkperest dizanin. Derbirandina(îfade) xwe ji Îttîhat Terakiyê digire. Li ser navê avakirina netewê, tevahiya ziman û çand, nasname û bawerî hatine yektîpkirin. Ew faşîzma Îttîhat Terakî, baviktiya fikrê faşîzma Hîtler jî kiriye. Cesaret daye faşîzma Hîtler. Gava ku em xweseriya demokratîk tînin ziman, em balê dikişînin li ser wê

neheqiya dîrokî. Wê ya neheqiya “Em di avakirina komarê de hene, lê di nav de nînin”ne. Xweseriya demokratîk a ku tê îlankirin, divê rexneyekî pêşkêşî dîroka komarê ya Tirkiyê jî bike. Heya li ser navê min ji wan re wê ya ragihînin: Îlankirina xweseriya demokratîk divê rojanekirina salên 1919-1922’an be. Hûn dizanin, di wan salan de Mustafa Kemal li şûna delegeya Bitlîsê ku di Kongreya Erziromê delegetiya wî dikeve, tevlî Kongreya Erziromê dibe ango weke delegeyekî Kurd tevlî wê kongreyê dibe. Belê, di wir de em hez dikin ew dîrok rojane bibe. Çima pêwîst e ku rojane bibe, ez dibêjim. Di navbera wan salan de kokên dîrokî yên xweseriya demokratîk hene. Divê di xerabûna têkiliyan de şikestin-provokasyon-komploya sala 1925’an baş were fêmkirin.

Bi xweseriya demokratîk Kurd mafê xwe yê netewbûnê, mafên xwe yên dîrokî, nasnameyên din jî mafên xwe yên demokratîk, her wiha hindikayî jî mafên xwe bi dest dixin. Kurd, bi girêdayî rewşa xwe ya civakî, siyasî, çandî herî zêde nêzîkî xweseriya demokratîk in. Kurd, bi wê taybetmendiya xwe, dikarin pêşengtiya xweseriya demokratîk û demokrasiya Tirkiyê bikin. Xweseriya demokratîk a Kurdan, dê pêl bi pêl li her derê Tirkiyê belav bibe. Ne projeyeke ku xwediyê wê tenê Kurd in. Di rastiyê de ya Başbug(Berpiryarê giştî ya artêşa Tirkiyê) jê ditirse, weke xeterî dibîne, ew xisûs e.

Di rewşekî ku çareserî pêşnekeve de, dê di Kurdistanê de desthilatdariya du alî derkeve holê. Aliyekî deshilatdariya KCK’ê, aliyê din deshilatdariya dewletê pêk tê. Dê bi wî awayî bimeşe. Weke Kosava, Qibrisa Bakur dê serxwebûna xwe ragihîne. Bi dewletê re têkiliya xwe bi giştî qut dike û nakeve di

nava bendevariyekî de. Di xweseriya demokratîk de dîjbertiya dewletê nîne. Kurd, ji ewlekariyê heya sporê, di hemû qadan de bê ku pêwîstiya xwe di dewletê de bibîne, divê rêxistinbûna xwe ya civakî pêş bixin. Kurd divê ewlekariya hundirîn a navxweyî pêk bînin. Ji bo qebûlkirina dewletê ya wan xisûsan, divê neyê sekinîn.

## NETEWA DEMOKRATÎK

Xweseriya demokratîk a gelê Kurd di wan deman de gelek hat nîqaş kirin û Rêber Apo bi gotina; “**ger netewa demokratîk ruh be, xweseriya demokratîk beden e. Xweseriya demokratîk weke goşt û hestî bedenbûna rewşa avabûna netewa demokratîk e, rewşa şênberbûn, bedenbûna wê ye”** bi awayeke gelek zelal ji hêla xweseriya demokratîk ve xebatên netewa demokratîk tên çi wateyê, tîne ziman. Di esas de wê ya dide diyarkirin; heya netewa demokratîk neyê ava kirin, dê xweseriya demokratîk bê ruh û beden be û wê ti wateyekê wê nebe.

Rêbertî di parêznameya xwe ya Şaristaniya Kapîtalîst de têgeha netewê, weke têgehek *“muphem”(ne diyar)* nirxandiye. Ji ber ku mirov bi awayeke guman nêzî wateya têgeha netewê ya ku modernîteya kapîtalîst lê bar kiriye bibe, wê ya ji bo mirov dibe nirxandinek girîng. Bi taybet di dema xebatên avakirina modernîteya demokratîk de, netewa ku kapîtalîzmê bi nîjadperestiya bîrdoziyî ya netew-dewletê pêşxistiye û ji xwe re weke vesaziyeke bingeh a dewletê esas digire û rast neyê nirxandin û weke feraset çihê ku heq dike nebîne, mirov nikare di rêxistinbûna netewa demokratîk de biserkeve. Ji ber wê, di qada rêxistinbûna civakî de şertên avabûna forma netewê ya di dîrokê de pêkhatiye, di tewereya(eksen) nirxên komunal de bidestgirtin, bi qasî rast nirxandina rista wê ya pêşketina civakî, di nava modernîteya demokratîk de jî netew rast bicihkirin, xebateke sereke ya erkên entelektueliyê ye.

Li cem wê ya di wateya erkên pratîk ên rojane de, xebatên netewa demokratîk ên ku xwe dispêrên sazîbûna yekeyên civaka exlaqî û polîtîk jî, erkên herî bingehîn ên ku li pêşiya têkoşîna me disekinin.

## Şertên Avabûna Netewê

Netew, her çi qasî heya roja îro weke hilberîneke modernîteya kapîtalîst û zêdetir weke afirandina wê bi dest hatibe girtin jî, di rastiya xwe de formeke civakî ya ji derveyî kapîtalîzmê ye. Geşedana netewê ya ku li rastî merheleya kapîtalîzmê tê, ji bo netewê bêşansiyek e. Dîroka mirovahiyê bi civakbûnê re, bi awayî formên gelek cuda hebûna xwe domandiye. Ew teşebûnên civakî, weke nasnameyekê bûne amûrên xwenaskirin û pênasekirinê. Weke tê zanîn teşeya civakî ya yekem klan e. Klana teşeya civakî ya ku mirovahiyê bi demê herî dirêj jiyan kiriye, weke hewldana avakirina nasnameya civakê jî tê pênasekirin. Bi klan re civak xwe bi wate û pênase dike, çi di têkiliyên navxweyî de, çi jî di têkilyên bi klanên din re statuya têkiliyan diyar dike. Ew jî dibe sedem ku cudahiya xwe û ya di navbera yên din de kifş bike. Tevahiya formên civakî yên piştre pêk hatine, weke hilberîna wê hewldanê derketine holê. Her berfirehbûnek teşebûna civakî ya nû, her çi qasî di aliyê tevlihevbûnê de taybetmendiyan nîşan bide jî, di esas de pêşketinek ku xwe pênase dike û dide nasîn, tê xuya kirin. Ew lêgerînên nasnameya civakî ku di civakê de her tim hebûna xwe berdevam dikin, bi girêdayî hêmanên weke terz û teknîkên hilberandinê yên diguherin, pêkhateyên ferasetê, gelhe(nifûs), şertên ednîgariyê hwd. heya roja me ya îro hatine. Ji ber wan sedeman jî çawa ku her civateke mirovan tevahiya teşeyên civakî di heman astê de

jiyan nake, mirov nikare angaşt bike ku di tevahiya civatan de her teşeyeke civakî tê jiyan kirin. Teşeyên klan, qebîle, eşîret, qewm û netew, ku heya roja îro di civatên mirovan de hatine jiyan kirin, mirov nikare bêje ku di her civakê de heman ast û heman pêşketin hatiye jiyan kirin. Di nava şertên ku civak xweseriyên xwe jiyan dike de, her civatekê ew formên civakî di pêvajo û astên cuda de jiyan kirine.

Şertên derketina holê ya netewê ku di roja îro de teşeya dawî ya wan civakan e, gelek pêşiya pêvajoya kapîtalîzmê derketine holê. Bi hilweşîna Romayê re gelên li Ewropayê otoriteya xwe ya siyasî ya ku xwe dispêre pêkhateyên konfederal, ava kirine. Gelên Ewropayî ji serî heya dawiyê xwe bi awayî pêkhateyên konfederal ên xweser birêxistin kiribûn. Di nava wan pêkhateyên konfederal de her çi qasî pêwendiyeke sist hebe jî, di esas de her ji wan yek rêveberiyên gel ên serbixweyî rave dikirin. Ew pêkhateyên li Ewropayê, dezgehên herî bingehîn ên pêvajoya netewbûnê ne. Astên têkiliyên civakî yên ku di nava wan pêkhateyan de pêşdiketin, hêdî hêdî rê li ber pereseniyek ber bi netewbûnê vekir. Wan jî vîna xwe ya siyasî bi pêkhateyên konfederal ên ku ji komunan pêk tên, îfade dikirin. Ji sed sala 12. pê de li Ewropayê şerên ku di navbera dewletokan de pêk dihatin, dibû sedem ku prenstî(mîrnişîn) li beranberî hev du raseriyê pêk bînin, lewma li ser wan pêkhateyan ketin nava lêgerînên ku civakbûyîneke hin berfirehtir derxin holê. Ew pêkhateyên ku hêj tam neketine teşeyek netewê, xwe bi dewletê re girêdan û ketin nava hewldana ku serweriya xwe ya siyasî berfireh bikin. Kesên ku yekem bilêvkirina netewê kirine; Prensê Îngilîz Henryê yekemîn û Prensê Fransî

Philippe Augustus in û bi armanca ku xwe ji dewleta netewe girêdin, gelek sazîbûnên cuda derxistine holê. Di wan deman de vesaziyên netewê yên navend dewlet ku hez dikirin ava bikin, bi emrê qral an jî prensî ve sînordar dima. Bes, dezgehên civakî yên ku weke netew dest bi teşebûnê dikir, wê bi demên dirêj bi awayî komunan rêxistinbûna xwe berdevam bikirana. Di demên qraltiyên ku demdirêjî ajotine de jî, forma netewê ya ku di nava seyra geşedana xweser de pêşde diçû, mirov nikare bêje ku weke otoriteyek siyasî bi temamî ji dewletê girêdayî bûye. Heya pêvajoya netew-dewletê ya ku modela dewletê ya modernîteya kapîtalîst e jî, weke tê zanîn di nava pêkhateyên netewan ên konfederal de, xwediyê teşeyek jiyanê ya xweser bûn. Lê, piştî ku çînên kapîtalîst deshilatdarî bi dest xistin, netew-dewleta ku ji civakê dihat ferzkirin, bû sedem ku netew ji jiyana siyasî qut bibin.

Dîsa hişmendiya qewm a ku çavkaniya xwe ji olê digire, ku bîrdoziya bingehîn a serdema navîn e, bi awayeke bandor dihat bikaranîn. Di gelek qadan de pêkhateyên ku xwe dispêrin hişmendiya qebîle an jî eşîretê ya ku di nava nasnameya qewm de ji hêla olê ve hatibûn avakirin, weke ku cudahiyên xwe didin çespandin(îspat kirin) rê li ber avakirina pêkhateyên olî jî vedikirin. Rêolên(mezheb) ku di nava Xiristiyaniyê de şax vedane, geşedanên ji wê serdemê ne. Wergerandina Încîlê ya zimanên din, dibû gaveke girîng a riya ku ber bi feraseta netewê ve diçû. Pêvajoya netewbûnê ya li Îspanya, Fransa, Îngiltere, Elmanya hatiye jiyan kirin, ji nêz ve ji wan geşedanan ve girêdayî ye. Li Elmanyayê Martîn Luther, li

Fransayê Calvîntiyî pêşengtiya wan geşedanan kiribûn. Bi taybetî wergerandina Încîlê ya bi zimanî Elmanî û Fransî, dîsa li Îngiltere û Holandayê avakirina dêra Anglîkanê, di aliyê pêşketina hişmendiya netewê de bûn gavên girîng. Bi wan vesaziyên olî yên ku cihêreng dibin, hişmendiya qebîle-eşîretê bi vesazîbûnên hêj pêşketîtir ber bi netewê teşe digirt.

Tevahiya ew nêzikîhevbûn û bihevrebûn, di avabûna netewê de bi serê xwe têrê nakin. Di wê mijarê de hêmanên herî bingehîn, guherîn û geşedanên ku di bazarê de tên jiyan kirinin. Bi otorîteya siyasî ya hevpar a di qada civakî de pêşdikeve, hişmendiya qebîle-eşîretê ya xweser a xwe dispêre olê, di qada aborî de jî rê li ber hevparbûn(di wateya beşên hin berfirehtir ên ku civakê digire nava xwe de) û belavbûnê vekiriye. Aboriya bi parçeyî ya bi perjanên(çît) feodalî hatine sînordarkirin, hedî hedî jevdikeve. Danûstandina xwe dispêre herikbariyek mal a xurta ya di navbera qadên xwecihî yên cuda de pêk tê, her ku diçe berfireh dibe û bazara hevpar dest bi xuyabûnê dike. Berfirehbûna bazarê di têkiliyên civakî de bûye sedemê guherînên bingehîn. Bi qasî di aboriyê de, di têkiliyên civakî de jî perjanên(çît) ku xwe dispêrên olê û feodaliyê dest bi şikestinê kirine. Civakê, xwe gihandiye tewna têkiliyan a hin firehtir û belavtir. Di wê merheleyê de her ku diçe girîngiya bajaran zêde dibe û li ser gundan raseriyek xuya bi dest dixin. Jiyana ku xwe dispêre gundan, girîngiya xwe hêdî hedî winda dike. Wê rewşê ji nêz ve girêdaniya xwe bi guherînên ku di bazarê de tên jiyan kirin, heye.

Di wir de mijara ku bi baldarî lê were nêrîn; bazar ne dahêneke burjûvayê ye. Bazarê weke dahên an jî hilberîna burjûvayê angaşt kirin, tê wateya înkara hilberîna civakî û bazara ku encameke wê ye. Berovajiya wê nêzîkbûneke hin rastir e. Ango bi girêdayî têkiliyên civakî yên pêş dikevin di nava bazara ku belav dibe de, beşa bazirgan(ticar) a çîna navîn a ku xwe vedişart, her ku çû bazar xiste bin serweriya xwe û weke yekedestiyekî bazar talan kir. Bazar, di nava tevahiya pêkhateyên civakî yên beriya kapîtalîzmê de, weke pêwîstiyek bingehîn heye. Weke encamek herî xwezayî ya hilberandina civakî ava dibe.

Weke tê zanîn di civaka ku asta klanan de jiyan dikir, hilberîna zêde weke diyarî û xelat ji hev du dihat belav kirin û wê ya weke şahiyekê pêk tînan. Piştre di nava grubên civakî de hebûna qadên mal û hilberînên ku ji hev du tên belav kirin ku ew nirxên bikaranînê ne, serdemên dîrokê yên herî kevn ronî dikin û ew di vekolandinan de jî tê fêmkirin. Ew qad, ji bo bazarê weke prototîpekê ye. Di nav de mirov zêde li rastî şopa hêmanên ku xwe dispêrên yekdestî û mêtîngeriyê nayê. Bazar, weke ji qadek yekdestî û mêtîngeriyê vêdetir, hin zêdetir rista qada ku xebatên aborî yên civakê hevpar dibin, dilîze. Geşedana civakê ya di forma netewê de jî, xwe dispêre wê taybetmendiya bazarê.

Di encama tevahiya wan danehev û geşedana de netew; weke nasnameyeke civakî ya li dorhêla hişmendiya qebîle+baweriya olî+vîna siyasî ya hevpar+bazara hevpar teşe digire, derdikeve holê. Eger lêkolîn li tevahiya pêkhateyên ku rê li ber pêşketina netewê vekirine were kirin, bi awayeke aşkere tê dîtin ku ne dewlet, ne jî kapîtalîzm(ango her

çi pergalek dewletperest be) tiştên pêwîst nînin. Berovajiya wê netew, herî zêde di nava vesazî û qadên ji derveyî dewletê de digihije şertên avabûneke azad.

## Dewlet, Çîn û Netew

Mixabin heya roja îro netew weke afirîneriya çîna burjûva hatiye pênase kirin. Bi wê ya re hewl hat dayîn ku netew di asta îlahî de îbadetê ji 'afirînerên' xwe bike. Hema bêje nasnameyek civakî ya bê burjûva nehat fêrkirin. Heya burjûvazî weke pêşengê nasnameya civakî ya di forma netewê de hat nasîn. Nasnameya netewê ya ku pêwîst bû nûnertî û pênaseta tevahiya civakê bike, ji wê ristê hat dûrxistin û ket rewşa nasnameya yek çînê. Tevahiya pêkhateyên ku di paşde mane jî, li ser wê çînê hatin pênasekirin. Dîsa nûnertiya civakê di destê burjûvaziyê de hat hiştin û bi wê ya re mafeke mêtîngeriyê ya bêsînor ji wê çînê re hat naskirin. Burjûvazî bi wê rista ku lêhatiye barkirin, li ser netewê her cure teserûf ji xwe re rewa dît.

Netew dewleta ku çînên kapîtalîst weke amûreke bidestxistina desthilatdariyê bikar tîna, tenê bi girêdana forma netewê ya bi dewletê re karibû pêk bîne. Her netewek mecbûrê dewletekê kirine û li ser netew-delweta ku teşeya dewletê ya bingehîn a modernîteya kapîtalîst e, netew di nava cendereya nîjadperestiyê de bi mêtîngerî, pêkûtî û komkujiyên herî giran re rû bi rû hiştin. Nasnameya netewê, bi ola nîjadperestiya netew-dewletê di nava hişkperestiyeke herî dijwar de kirine nasnameyek ku ji herkesekê re dijminahiyê dike. Di esas de, bi bergiriyek li ser bingehê yekitiya cudahiyan a teşeyî nasnameyek raser, pêvajoya netewbûnê ya ku civakbûnê derdixîne

holê, di destê çîna burjûva de ji dewletê hat girêdan û weke çeka herî bingeh a yektîpkirinê di komkujiya gelan de hat bikaranîn. Di dîrokê de heya roja îro ti formeke civakî nêzîkbûneke ew qasî bi bêmusahama nîşanî cudahiyên ku di nava wan de jiyan dikin, nedaye û li hemberî civatên ji derveyî xwe dijminahiyek ew qasî mezin nîşan nedane. Lê, piştî ku nasnameya netewê ji nasnameya civakê derket û bû nasnameya çînekê tenê, êdî civak ne ji bo xwe, neçar ma ku ji bo berjewendiyên wê çînê jiyan bike. Ew jî bû sedema komkujiyên mezin ên ku mirovahiyê heznedikir ku di dîrokê de nas bike. Ew pergala komkujî û mêtîngeriyê ku bi navê civakê li hemberî civakê hatiye pêşxistin, mirov nikare weke teşeyek civakê pênase bike. Rêbertî wê rewşê weke ***"tevkujiya civakê"*** pênase dike. Mirov dikare bêje ku; bidestxistina nasnameya civakî, bi destê civakê, li hemberî civakê tevkujiya civakê tê pêkanîn. Ne tenê li dijî derve, li hemberî netewên ku di nava netewê de jiyan dikin jî xelaskirin, ji cewher valakirin û ji tevahiya dînamîkan qutkirin, hat pêşxistin.

Sedema herî girîng a lîstokên ku heya niha li ser netewê hatine lîstin û heya roja îro netew rû bi rûyê spekulasyonan hatiye hiştin ew e ku; kesên tacir û bazirganên çîna navîn ku ji aliyê civakê ve tim bi çaveke guman li wan tê nêrîn û ji dîrokê heya niha xwe nespêrane civakê, bi spekulasyonên ku li ser bazarê dikin, hewl didin ku di deshilatdariyê de cihekê ji xwe re çêkên.

Tevahiya pergalên dewletî yên ku ji aliyê dîroka civakan ve hatine naskirin, ketine nava lêgerîna afirandina civakbûyîna xwe û wê ya her çi qasî pêkanî bin jî, ew qasî pergala xwe li ser civakê bandor kirine.

A ku bi wê ya hatiye armanc kirin, bi awayeke giştî civak ji dewletê girêdane. Her civakbûnekî ku ji derveyî dewletê maye, weke gefek herî mezin hatiye dîtin. Lê di ti serdemeke dîrokê de qala serkeftina nîhayî ya dewletê ya li ser civakê nayê kirin. Ne xwedê-qral, ne jî qralên siya xwedê, hêj negihiştine qudreta ku bikaribin civakê bi awayekî giştî bixin rewşa dewletî. Berxwedana nirxên komunal ên di civakê de , her tim serweriya teqez a dewletê ya li dijî civakê asteng kiriye. Weke qralên bêrûpoş(bê maske) çînên kapîtalîst jî ku nûnerên roja îro ya şaristaniya dewletî ne, bi pêvajoya deshilatdarbûnê re li ser civakê ketine şereke wisa. Armanc ew ku tevahiya civakê bikin a dewletê. Di vê nuqtê de weke teşeya hebûna herî xwezayî ya ku civakê ji netew dewletê re girê dide, ji bo şaristaniya dewletî ya qralên bêrûpoş nûbûneke ku pêk tê. Bi wê ya re tevahiya civakê ber bi nava deshilatdariyê ve tê kişandin û temamiyek civak-deshilatdariyê ya ferazî(sanal) hatiye ava kirin. Civak, deshilatdariyê ji ya xwe dihesibîne û dawetî xwedîderketina wê hatiye kirin. Lê, heman des-hilatdarî bi destê civakê li ser civakê komkujiyên herî kûr pêk tîne. Aşkere ye ku ew çînên bednîjad(bêesil) ku di civakê de ti palpişteke wan nîne, ji xeynî hewldana wan a ku xwe di nava netewê de reva nîşan didin û vedişêrin vêdetir, ti wateyekê wan nîne.

Ew xapandina bîrdozîk a ku di nava civakê de hatiye pêkanîn, xwe li ser nirxên civakî yên ku bi navê felsefe, îdeolojî û siyasetê têkoşîn dikin, weke paradîgmayek serwer ferz kiriye û daye pejirandin. Heya merheleya kapîtalîst di têkoşînên civaka xwezayî ya ji derveyî dewletê de, qala ti perspektîfeke dewletê nayê kirin. Berdîla(alternatîf) azadbûna

civakê her tim ji derveyê dewletê hatiye dîtin. Di serî de nîjadên ku li dijî şaristaniya dewletî dest bi berxwedanê kirine, pêhesiyane ku çi qasî ji dewletê dûr bimînin, dê ew qasî azad jiyan bikin. Pişt re jî pêkhate, beş û çînên civakî yên ku bi dewletê re nabin yek, hem di ferasetê de, hem jî di aliyê erdnîgarî de bi sekna ku her tim ji dewletê dûr dimînin, kevneşopiya civaka xwezayî heya roja me ya îro anîne. Eger em îro bikaribin qala alternatîfeke ji derveyî dewletê û şaristaniya komunal a demokratîk bikin, divê were zanîn ku em wê ya deyndarê pêkhateyên ku ji derveyî dewletê mane û berxwedanên teşeyên civakî ne.

Lê hegemoniya paradîgmayî ya ku çînên kapîtalîst li ser civakê pêk tînin, beş û çînên ku bi navê civaka xwezayî têkoşîna azadiyê dimeşînin, ji zincîra dewletê ve tên girêdan û bi wê ya tê armanc kirin ku alternatîfa azadiyê ya civakê ji holê were rakirin. Kesên ku bi navê wan beş û çînan pêşengtiyê dikin jî, ew feraset rast nedahûrandine û di wê nuqtê de li hemberî dewletê têk çûne.

Vebijêrka têkoşîna sosyalîst a ku bi taybet di pêşengtiya Marks û Engels de derketiye holê, di mijara netewê de ketine şaşiyeke wisa. Netew, weke afirîneriya çîna burjûva nirxandine. Operasyonên bidestxistina deshilatdariyê yên ku çîna burjûva pêkanîne, weke şoreşa demokratîk hatine pênasekirin û di encama wê ya de jî azadbnûna netewan weke ku xisleteke demokratîk pêk hatiye, parastine. Weke ku me di despêkê de daye kifşkirin; bi wî awayî destgirtina netewê, tê wateya ku mirov netewê radestî wan bike û ji wijdana wan re bihêle. Têkoşînên netewê spartine rêgeza ***‘ mafê tayînkirina çarenûsa xwe ya netewan’*** û bi awayeke neçarî mehkûmê

vesaziya netew-dewletê hatiye kirin. Lenîn, ku şopdarê pêşewan ê Marksîzmê ye, di berhema xwe ya bi navê '***mafê tayînkirina çarenûsa xwe ya netewan***' de; ***" meyla her tevgereke netewî, meyleke ku ber bi avabûna dewletên netewî ve bi awayeke herî baş pêdiviyên kapîtalîzma nûjen pêşwazî dike ye. Karîgerên(faktor) aboriyî yên herî kûr ên ku me ber bi vê armancê ve diherikînin û ji ber wê, ji bo tevahiya Ewropaya rojava, ji bo tevahiya dinyaya şaristanî, dewleta normal a tîpîk a serdema kapîtalîst, netew dewlet e"*** dibêje. Weke ku di vê gotinê de tê fêmkirin jî, hem pêşengên sosyalîzmê, hem jî şopdarên vê yên herî bingeh, netew ji derveyî dewletê negirtine dest, heya bi nirxandinên xwe, netew-dewleta ku kapîtalîzm weke amûra biran-doxiya(mezaxtin) civakê bikartîne, weke amûreke jêveneger a têkoşîna netewan dîtine. Netewê weke formeke civakî ya esasî ya kapîtalîzma ku bi ti awayî ne teşeyeke civakê ye bidestgirtin, bûye sedem ku kapîtalîzm ji aliyê çêpê ve rewa were dîtin û di vê alî de sûdeke herî mezin ji kapîtalîzmê re çêbûye. Rêbertî ew pozîsyona wan weke ***" mezhebê çep a kapîtalîzmê"*** pênase kir. Ango kapîtalîzma ku herî zêde li dijî derdiketin, weke mezhebekî wê, jê re xizmet kirin.

## Weke Nasnameya Demokratîk a Civakê Netew

Di çerçoveya tevahiya wan pênaseyan de pêwîst e ku netew ji nû de were desgirtin. Riya yekane ya valaderxistina komployên ku li ser netewê li dijî gelan pêk tê, netewê li ser nirxên komunal û yekeyên civakî yên exlaqî- polîtîk ji nû ve avakirin, ruheke nû ji

civakê danqezenckirin, dibe erkekî herî mezin ê şoreşgeriyê.

Di wir de ya ku despêkê were kirin; netewê weke nasnameyekê pênasekirin e. Weke her hebûnekê di xwezayê de, divê teqez hebûna civakî jî xwe pênase bike. Heya roja îro tevahiya civakan xwe di derdora nasnameyekê de pênase kirine. Nasname; terîfkirina takekesî, manewiyat, hest û ramanên civakê û di derdora wan de avakirina takekesên(ferd) xwe û diyarkirina terzê jiyana xwe ye. Mirov nikare nasnameyê ji însafa çînekê, aliyekê an jî civatekê re bihêle. Riya yekane ya nasnameyek civakî ku demokratîk bibe, divê ji civakê re bibe mal, nûnertiya tevahiya beşên civakê bike û tevahiya hêmanên ku civakê pêk tînin pêwîst e ku xwe di nava wê nasnameyê de bibînin. Her kesek bi wê nasnameyê wateyekê dide jiyana xwe û li gorî pêdiviyên wê nasnameyê bereyekê dide jiyana xwe. Civak, bi tevahiya pêkhateyên xwe ve, bi qasî ku xwe di nava wê nasnameyê de îfade dike, ew qasî dikare demokratîk bibe.

Weke ku di şertên rê li ber geşedanên netewî vedikeken de jî tê fêmkirin, nasnameya civakî çi qasî berfireh bibe, wergiriya wê zêde bibe û zêdetir derfetê bide hevparbûnê, ew qasî forma netewê pêşdikeve. Bi gotineke din; yekitiya cudahiyan a li ser bingehê azadiyê, dibe şerteke pêşîn a îfadeya ruhê civakî yê netewa demokratîk. Ew, pêvajoyek li dijî netewbûnê ya xwe dispêre nîjadperestiyê ku kapîtalîzm wê ya li ser yek grubek nîjadî pêk tîne, îfade dike. Ne yektîpkirin, netewbûnek ku xwe dispêre dewlemendiya cihêwaziyan, bingehê avaker a netewbûna demokratîk e. Di wê mijarê de Rêbertî di

parêznameya xwe Sosyolojiya Azadiyê de wisa dibêje; ***“netewbûn riya duyemîn(demokratîk); di bergeha civaka exlaqî û polîtîk de grupên çand û ziman ên heman an jî dişibin hev du, di bingehê siyaseta demokratîk de bi veguherîna civaka demokratîk pêk tê. Di netewbûnê de tevahiya qebîle, eşîret, qewm heya malbat, weke yekeyên civaka exlaqî û polîtîk cih digirin. Dewlemendiyên xwe yên ziman, zarava û çandê ji netewa nû re radigihînin. Di netewa nû de bi teqezî tenê cihê serweriya grubek nîjadî, mezheb, bawerî û bîrdoziyekê nîne. Senteza herî dewlemend a ku bi dilxwazî pêk tê ye. Heya gelek grubên çand û ziman ên cuda jî, bi riya siyaseta demokratîk a heman weke civakên demokratîk bi hevparî dikarin di asta yekeya jor a netewan de, bi nasnameya netew a netewan jiyan bikin. Jixwe ya ku kêrî xwezaya civakî tê, ew rê ye.”*** Rêbertî bi wan ramanên xwe, modeleke netewa demokratîk a ku li gorî xwezaya civakî dê çawa teşe bigire, dide diyarkirin.

Bêguman ew rewş, şoreşeke zîhniyetê dide pêwîst kirin. Heya roja îro ew hiyerarşiya ku şaristaniyên bi dewletî di civakê de ava kiriye, bi hilweşandina pêkhateyên ku xwe dispêrin dewlet û deshilatdariyê û feraseta baviksalariyê, her wiha li şûna paradîgmaya hegemon a ku li gorî wan tê pêşxistin, divê paradîgmaya ekolojîk, azadixwaziya zayendê were serwer kirin. Şoreşa zîhniyetê dibe mijara herî bingeh a hewldanên avakirina netewa demokratîk. Heya ji pêkhateyên zîhniyeta deshilat-perest a dewletî rizgarbûn nebe û li şûna wê zîhniyeta komunal a demokratîk neyê ava kirin, ne civakbûnek dikare were ava kirin, ne jî sazîbûna wê pêk tê.

Şoreşên zîhniyetê xwe bixwe pêk nayên, ger mirov di bendewariyeke wisa de be, xwe dixapîne. Ti zîhniyetek heya sazîbûna perwerdeyiya xwe pêk-neyîne, nikare xwe serwer bike. Lewma xebatên ji bo avakirina paradîgmaya nû, di nava erkên herî bingehîn ên netewbûna demokratîk de cihê xwe digirin. Perwerde, xebata herî bingeh a xwe avakirina civakê ye. Paradîgmaya nû ya ku bi perwerdeyê tê ava kirin, wê di nava civakê de rê li ber avabûna vesaziyek ku bi xweza, pêkhate û takekesên civakê re di nava aştiyê de jiyan dike, veke. Civak, hewldana xwe ya sazîbûn û avakirina pêkhatina zîhniyetê ya ji ziman heya baweriyê, ji çand heya siyasetê û ji zanistî heya werzîşê(spor) di esas de tenê bi perwerdeyê dikare pêk bîne. Ew saziyên ku bi perwerdeyê re ji nû de tên vesazkirin, di heman demê de ji bo zanekirina civakê weke qadên bingeh ên perwerdeyê erkiyek dumend(du libî) bi dest dixin. Ew rewş, ji bo avakirina netewa demokratîk hin zêdetir derbasdar û pêwîst e.

Civakbûnek ku xwe dispêre paradîgmaya nû, gava xwe bi awayî netewa demokratîk ava dike, hin parametreyên ku esas werin girtin hene. Em dikarin wan bi hin sernivîsan wisa rêz bikin:

1- Divê civak ji tevahiya pêkhateyên ku çavkaniya xwe dispêrin deshilatdariyê were rizgar kirin û di biryargitin û rêvebirinê de her kesek xwedî gotin û erk be. Pêwîst e terzê jiyanek komunal, kolektîf û beşdarî di tevahiya civakê de were serwer kirin û pêkanînan beşdariya dildarî ya tevahiya yekeyên exlaqî – polîtîk ên ku xwe dispêrin teşeya civakî pêşbikeve.

2- Hewce ye ku hemû pêkhateyên zayendperest û baviksalar ên ku bi giranehî bi zekaya analîtîk pêşdikevin, bên hilweşandin û di jiyana civakî de feraseteke li gorî hevsengiya zekaya analîtîk û hestî ku li ser taybetmendiyên jinê yên çêker, hilberîner û hestiyarî pêşdikevin, ava bibe. Bi heman awayî divê di asta pêşengtiyê de beşdarbûna jinê ya jiyana civakî teqez bibe.

3- Divê dawî li feraseten pêkûtîner ên ku di encama feraseta ku xwezayê weke bireserekê dibîne de derketiye holê, were anîn. Pêwîst e ku di tevahiya civakê de hişmendiya ku bi xwezayê re di nava hev de jiyan dike û pê re lihevhayiye, her wiha terzê jiyana ekolojîk a ku li hemberî xwezayê di zanebûna berpirsyariya xwe de ye, were serwer kirin.

4- Tevahiya cudahiyên ku xwe dispêrin ziman, çand, bawerî û nîjadê divê weke hêmanên xeter û gefxur neyên dîtin û divê weke pêdiviyên herî bingeh ên azadiyê werin nirxandin. Şûna ku ew cudahî ji holê tên rakirin, divê xebatên ku wan pêş dixin û derdixin holê, weke xebatên demokratîk ên herî bingeh bên nirxandin.

5- Di nava civakê de, kategorîzekirina her cure çîn, tebeqe, zûmre hwd ên ku di encama deshilatdariyê de çêbûne, tên redkirin û karbeşiya civakî ya xwe dispêre behre(qabiliyet) û pêdiviyê, esas tê girtin. Di vê çerçoveyê de her kesayeteke ku civakê pêk tîne, ji bo ku tevlî jiyana civakî, hilberandin û rêxistinbûnê bibe, tê teşwîqkirin.

## Exlaq, Polîtîka û Netew

Çawa ku mirov dikare wan sernivîsan zêde bike, her sernivîs jî dikare di nava xwe de bi gelek şaxan berfireh bibe. Lê, pêkanîna tevahiya wan şertan jî, bi avakirina yekeya civakê ya exlaqî û polîtîk a netewê re girêdayiye. Di asta çawanî û çendaniyê de gava ku tevahiya pêkhateyên civakî ên mezin an jî biçûk, li gorî yekeya civaka exlaqî û polîtîk neyê vesazkirin, mirov nikare bi awayeke giştî qala pêkhatina netewbûna demokratîk bike. Netewbûna ku xwe nespêre civaka exlaqî û polîtîk a ku Rêber Apo weke "***rewşa xwezayî ya civakê"*** pênase kiriye, yan wê nikaribe li hemberî modernîteya kapîtalîst li berxwe bide û dê tune bibe, yan jî wê rû bi rûyê xizmetkirina vê re bimîne, ku ew jî ya herî xerab e. Civaka exlaqî û polîtîk a rêgezên xwe bixwe diyar dike û wan rêgezan bixwe pêk tîne, ku wêya weke civakbûn tê îfadekirin, ji bo netewê riya yekane ya hem xwepêkanînê ye, hem jî serwerkirina şaristaniya demokratîk e. Li gorî civaka exlaqî û polîtîk avakirina civakê, bi vesaziya ku li ser erkên polîtîk, exlaqî û entelektûelî yên ku tevahiya yekeyên netewê ava dikin, pêkan e.

Di serê hewldanên ku şaristaniya demokratîk serwer dikin de, erkên entelektûelî tên ku ew jî li beranberî tevahiya xebatên ku di çerçoveya şoreşa zîhniyetê ya me li jor daye diyar kirin de, tê. Tevahiya xebatên sosyolojîk, dîrokî, bîrdozî, siyasî, aborî yên ku ji bo pêkhatina xwezayî ya civakê derkeve holê tê meşandin, di çerçoveya wan erkan de tên nirxandin. Akademiyên ku weke qada ew xebat lê tên meşandin, ji ber wê sedemê girîngiyeke mezin digirin ser xwe. Akademî, bi hişmendiya avakirina netewa demokratîk a ji civakê dide qezenckirin, mekanên ku ruhê civakî

pêktê ne. Sedemê ku Rêbertiya me bi israrî li ser akademiyan disekine, ew e.

Şaxa exlaqî û polîtîk, tevahiya xebatên weke ku civakê dê çawa karên xwe bimeşîne û karê xwe çawa bi cih bîne, rave dike. Her yekeyeke civakî ya ku netewê pêk tîne, dê xebatên xwe çawa û li ser kîjan bingehê bimeşîne, dê çi, çawa û çi qasî hilberîne, dê bi xwezayê re têkiliyeke çawa bimeşîne, pêwendiyên xwe yên navxweyî dê li ser kîjan bingehê bidomîne, xuya dike û ew jî bi temamî mijarên ku şaxa exlaqî û polîtîk eleqedar dike ne. Rêbertî exlaqî wisa pênase dike: ***“ Xwezaya civakî bi jîratiya nerm weke xwezaya herî barkirî pênasekirin, dikare mijarê ronî bike. Qesta me ya jîratiya nerm, hin zêdetir bi hizirandinê karkirinê. Têkiliya di navbera hizir û kar de, weke pêwîstî rêgezên xwe hene. Ji ber ku pêwîstiya kar a dê çawa were kirin, jixwe rêgez e. Mirov dikare ji bo kar wê çalakiya ewil, weke rêgeza exlaq jî bide diyarkirin. Gava em dibêjin kar; qesta me her cure çalakiyên civakî ne. Ji xwarinê heya razanê, ji meşînê heya peydakirina xwarinê, dostanî an jî pevçûna bi lawiran re, bi eleqebûna riwekan heya girtina masiyan, her çalakî kar e. Ew kar jî, bê rêgez sernakeve.”*** Çaxê ku Rêbertî wê pênaseyê dike; bi zelalî qala xebatên ku bi awayeke giştî rêgezên jiyanê yên civakê tîne ziman, dike. Rêberî ji bo polîtîkayê jî wan tiştan tîne ziman: ***“Civak, weke exlaq kirûyek(diyarok) an jî xwezayek polîtîk e. Weke ku tê hizirîn; ne di wateya xebatên dewletê yên fermî de, weke xwezaya civakî polîtîk e. Ger erka exlaq bi awayeke herî baş pêkanîna karê jiyanî be, erka polîtîkayê jî peydakirina karên herî baş e. Bi baldarî lê were nêrîn; polîtîka hem buûta***

***exlaqî digire ser xwe, hem jî hin zêdetir. Peydakirina karên baş ne hêsan e.”***

A ku weke karên baş hatine pênasekirin; mijarên jiyanî yên ku tevahiya civakê eleqedar dikin û pêwîstiyên herî bingeh ên civakê ne. Ji ber wê polîtîka, di mijarên herî jiyanî yên weke azadî, wekhevî û demokrasiyê de, meşandina tevahiya xebatan e. Ya herî girîng jî; di wan mijaran de civak pîvanên xwe bixwe diyar dike. A ku ji bo civakê pêwîst çi ye? Di nava pêwîstiyen de ya herî baş kîjan e? Polîtîka, qada ku wê ya diyar dike, îfade dike. Ew, nîqaşa civakê ya ku tim di nava xwe dike, weke pêwîstiyekê dibîne. Çêbûna aqilê hevpar, di encama wê pêvajoyê de pêktê. Di wateya civakî de, qadên ku aqil û ruhê hevpar afirandine, exlaq û polîtîka bixwe ne.

Polîtîk û exlaqbûna netewa demokratîk; di derbarê jiyana xwe de bi hemû yekeyên xwe ve, di her bûutê de xwediyarkirina “çi û çawa’yan” û weke bicihanîna wan, dikare were rave kirin. Di pergalên dewletî de rêgezên ku weke rêveberiya îdarî û hiqûqî tên pênasekirin û rêgezên ku ji derveyî civakê hatine ava kirin û ji civakê tên ferzkirin, şûna ku bi darê zorê li ser civakê tê meşandin, divê civak bixwe xebatên xwe yên civakî, siyasî, aboriyî, çandî, perwerdeyî, werzîşî diyar bike û li ser esasê tevlibûna dilxwazî ew xebat werin meşandin û vesazkirina civakê ya li ser bingeha demokratîk esas were girtin. Netewa demokratîk li ser wan esasan di wateya netewa civatên polîtîk û exlaqî yên ku wê ava dikin de, dikare bigihije îfadeyekê. Her yekeyek, xweseriya xwe û cudahiya xwe ya çandê tevlî netewa nû dike û bi wî awayî dewlemendiya netewê tê pêkanîn. Di nava netewa nû de serweriya ku xwe naspêre tenê yek çîn,

nîjad, çand an jî baweriyê, destûrê nade ku nêzîkbûna yektîpkirinê xwe li ser civakê ferz bike. Tenê neteweke wisa dikare xwe bigihine xisleteke demokratîk û rê li ber ruheke civakî ya ku her kesek dikare xwe di nav de îfade bike, veke.

Modela rêxistinbûnê ya yekeyên ku di nava netewa demokratîk de cih digirin û dikarin xwe bi erkî bikin, komun e. Ji tax û gundan heya bajaran, ji çînan heya grubên pîşeyî, ji jin û ciwan bigire heya beşên civakê yên din, her kesek û her beşeke civakê, bi awayî komunên ku xwe dispêrên espriya civaka exlaqî û polîtîk birêxistin dibin. Weke tevdahiya torek ku ji komunên netewê pêk tê, teşe digire. Rêxistinbûna komunan, dibin yekeyên herî demokratîk ên ku civak karê xwe bixwe dike. Komunên ku bixwe têra xwe dikin û xweser in, dibin modela rêxistinbûna yekeyên ku netewê ava dikin. Modela rêxistinbûnê ya herî bingeh jî, ku xwe ji dewletê rizgar dike û dawî li îskana mecbûrî ya ku dewlet li ser netewê ferz dike tîne, xwesertî ye. Di roja me ya îro de qada ku înşaya netewa demokratîk li hemberî dewletê xwe bi cih dike û qada ku herî zêde ber bi azadiyê vekiriye, weke qadên xweser ên demokratîk xuya dibin. Xweseriya demokratîk, ruhê netewa demokratîk; di serdema modernîteya ku dewlet xwe li ser tevahiya civakan ew qas serwer dike de, li hemberî dewletê dibe navê statûya ku bidest dixe. Netew, bi ruhê demokratîk ê ku di bunya xwe de diafirîne, li dijî dewletê jî bi awayî xweseriya demokratîk digihije îfadeyekê û hebûna xwe dixe bin ewlehiyê.

Di roja me ya îro de weke ku di gelek qadên dinyayê de tê dîtin, modela herî bingeh a ku dewletê ber bi demokrasiyê ve hestiyar dike, xweseriya demokratîk e. Ji bo erdnîgariya Kurdistan û Rojhilata Navîn jî ku vesaziya netew-dewletê herî zêde zerar dayê wan û rê li ber seqetbûnê bastûrî(bunyevî) vekiriye, ew hin zêdetir derbasdar dibe. Di wê erdnîgariya ku Kurd û nîjadên cuda bi hezaran salan di nava hev de û bi hev re jiyan kirine de, modela herî rastîn a ku pêşiya xeniqandina netew-dewletê digire, modela xweseriya demokratîk e ku her çandek dikare li kêleka hev jiyan bike û li beranberî hev rêzdar bin. Netewa demokratîk; bi hev re û di nava hev de avakirina jiyana hevpar a gelan, çandan û baweriyan e, xweseriya demokratîk jî; jiyana ku weke goşt û hestî bi hev re dicebire ye, xwe avakirin û parastina li dijî dewletê ye.

## ŞAXA SIYASÎ YA XWESERIYA DEMOKRATÎK

### "Kêm Dewlet Pir Civak, Kêm Qedexe Pir Azadî"

Xweseriya Demokratîk, ji bo gelê Kurd tevgera avakirina demokrasî û organîzekirina pergala xwe ya civakî ye. Di hundir de netewa demokratîk, ji derve jî vesaziya ser netewê îfade dike. Organîzasyona rêvebirina xwe bixwe ya ku xwe dispêre azadiya siyasî, civakî, aborî, çandî, bawerî û rêolî(mezhebî), nîjadî û zayendiya civakê, yekitiya xwerêxistinkirina qada ekolojîk, komun û rêxistîbûna civakê ye.

Di çerçoveya demokratîkbûna Tirkiyê de em ji teşebûna siyasî ya ku derfetê dide meşandina azad a xebatên jiyana civakî û çandî û ya ku bi awayeke azad derfetê dide xweîfadekirin û rêxistinkirina nasnameyên cuda, xweseriya demokratîk dibêjin. Azadiya ku di wir de qala wê tê kirin, ne tenê ji bo herêmekî yan jî beşekî ye, ji bo tevahiya beşên civakî û nîjadî yên ku di Tirkiyê de jiyan dikin, derbasdar e. Ji ber ku azadî bi sînorên erdnîgariyî nayê çerçovekirin.

Gava ku pirsgirêka Kurd dibe mijar, qebûlkirina makeqanûnî ya nasnameya Kurd, perwerdeya zimanê zikmakî, azadiya çanda Kurd û piştgiriya ku ji çandên din re tê dayîn ji çanda Kurd re jî were dayîn; bi nasnameya Kurd re bikaranîna azadiya raman, rêxistîbûn û pêkanîna siyaseta serbest û bi girêdayî wê ya li ser bingehê ku gelê Kurd vîna xwe derxîne holê, di mehelî de nîqaşkirina pirsgirêkên xwe û bixwe çareserkirina wan pirsgirêkan, di mijara hin pirsgirêkan de xwestekên xwe ji hikûmeta navendî re ragihandin, bi qebûlkirina meclîsên herêmî pêkan e. Jixwe mirov dikare xweseriya demokratîk bi wî awayî

pênase bike. Xweseriya demokratîk; di serî de gelê kurd di nav de li ser bingehê rêxistîbûneke nû, ji nû ve rashatina siyasetê ya civakê ye. Xweseriya demokratîk, di rastiya Tirkiye û Rojhilata Navîn de weke modelekê tê wateya ku siyaset cih û nirxê ku heq dike bi dest bixe ye. Ji ber wê sedemê siyaseta xweseriya demokratîk bi hîmê bingehîn nîqaşkirin, bi qasî naveroka siyaseta ku di bin siya xweseriya demokratîk de pêk tê, derxistina holê ya teşe û şixulîna wê jî gelek girîng e.

Xweseriya demokratîk, pêvajoya îmha û înkarê, pevçûn û neçareseriyê ya ku bi netew-dewletê re jiyan dike, gihiştiye asteke wisa ku êdî nema dikare rake. Lewma xweseriya demokratîk modeleke çareseriyê ya ku deshilatdarî û parvekirina erkî esas nagire ye û bi bandorkirin û jiyanîkirina nirxên civaka demokratîk dibe rojev. Li ser wê bingehê vesazîbûna siyasî ya xweseriya demokratîk jî divê bi hinceta derketina holê ya xweseriya demokratîk re rasterast bi dest were girtin. Beriya her tiştî xweseriya demokratîk raber dike ku; çand û gelên ku tune hatine hesibandin, derkevin li ser dika siyasetê. Xweseriya demokratîk, gel û beşên civakê yên ku bi rêbazên cur bi cur ên zordarî û pêkutiyê ji siyasetê hatine dûrxistin, tevlibûna wan a siyasetê derpêş dike. Hem weke pêwîstiya demokrasiyê, hem jî ji bo çareseriya pirsgirêkên cuda yên xwe didin der, pêwîst e ku siyaset bûrokratîkbûn û navendbûna xwe biguherîne û wê ya weke vebijêrkekî ji bo tevahiya dinyayê xwe dide hiskirin. Hem ji bo çareseriya pirsgirêkên Rojhilata Navîn ên li ser hev kom bûne, hem jî ji bo veguherîneke rast a ku Tirkiye rû bi rû dimîne li ser bingeheke rast were derbaskirin, divê xweseriya

demokratîk weke vebijêrkekî herî guncav were rojevkirin. A ku di wir de xuyaker jî naveroka xweseriya demokratîk e.

Xweseriya Demokratîk tê wateya redkirina nîjadperestiya ku rê li ber mekanîzmeya dewletê ya navend, burokratîk û yekperest vekiriye û tê wateya derbaskirina pirsgirêkên ku bi wê ya derketine holê. Di siyasetê de feraseteke piranîparêz, demokratîk, wekhevîparêz û hevgirî dike armanc. Guhertina dewletê ya piranîparêz a ku ber bi reng û dengên cuda ve diguhere û pêkhatiya dewletê ya yekperest ku ber bi piranîparêziyê ve diguhere, dike armanc. Her wiha derbaskirina mekanîzmeya giran, burokratîk û erkdariya ku di navendê de kom dike û rêgeza danjiyankirina rêveberiya xwecihî dike armanc.

Xweseriya Demokratîk; erka ku dewletê di xwe de kiriye navend bi gel re parvekirin e, kişandina gel a siyasetê ye û siyasetê weke hêza çareserî û dilniwaziyê pêşxistin e. Wekî tê zanîn, çar salan carekî çûna li ser sindoqê, ne demokrasî ye û wê ya demeke dirêj e tê ziman. Di serî de qadên jiyanê û pirsgirêkên wê jî di nav de bidestxistin, pêkanîn û weke hêza çareseriyê bikaranîna mafê gotinê yê tevahiya hemwelatiyan û mekanîzmeyek siyasî ku di asteke herî jêr de girêdanbûna dewletê dike armanc, weke erkekî ava dike.

Ji bo derbaskirina feraseta ku civakê ji derveyî siyasetê dihêle û siyasetê dixe bin parastina statukoyê û ji bo derbaskirina vesaziya yekperest û antî demokratîk, pêkutîner û înkarok, ji bo herêm û Tirkiyê pêwîstiyek e. Xweserî, bi serê xwe bi demokrasiyê re ne jihev e. Xweserî bi naveroka xwe her çi qas ne

demokratîk be jî, gava ku di Rojhilata Navîn de li hemberî yekparêziyê, siyaseta înkar û tunekirinê û siyaseta netew-dewletê ya ku civakê ji derveyî siyasetê dihêle, weke vebijêrkekî bi awayeke demokratîk derdikeve holê, esasgirtina siyaseta demokratîk jî weke pêwîstiyekî ji xwezabûna wê tê.

Di wir de pirsên weke; çawaniya siyaseta ku di bin xweseriya demokratîk de dê were meşandin, wê çawa be, wê çawa were meşandin, sazîbûna siyasetê li gorî kîjan rêgezan wê tevbigere, dîsa armanc, amûr, kesayetî û feraseta siyaseta heyî girîngiyeke xwe ya cuda heye. Rêgezên siyasetê yên xweseriya demokratîk weke dezgeheke îdarî, siyasî-hiqûqî, teşebûn û şixulîna wê ya siyasî û hiqûqa wê, nîqaşên girîng ên akademîk, felsefî û siyasî dide pêwîst kirin. Lê, mirov dikare tenê li gorî cihê ku lê ye û di demê ku di nav de derbas dibe, hin tiştan bîne ziman.

## Siyaseta Demokratîk, Siyaseta Rast a Gel e.

"Divê erka kadroyên gihaştî, medya, rêxistîbûnên partî û rêxistinên civaka sivîl ên siyaseta demokratîk a ku her tim civakê perwerde dikin û propangandayê pêş dixin, bi tu awayî neyê piştguhkirin. Taybetmendiyên siyaseta demokratîk wisa dikare were rêzkirin; nêzîkbûna rêzdar a ji tevahiya cudahiyên civakê re, li ser bingehê cudahiyan li ser esasê wekhevî û lihevhatinê bi qasî naveroka şêwazê wêrektiya siyasetê, pêşîkê exlaq, 'hakimiyeta' mijaran, hişmendiya dîrok û rojaneyî, nêzîkbûna tevdeyîzanistî, encamgirtin û serkeftin." (**Rêber Apo)**

Di dîroka şaristaniya dewletperest de heya roja îro, li ser navê gelan û gelek beşên civakê, kesên din siyaset kirine. Siyasetên nûnertî derketine holê. Bes,

her çi nûnertiya ku derketiye holê angaşteke wê ya cuda hebe jî, ne li gorî eslê xwe bûye. Êdî diyar bûye ku ew siyaseta bi destê dewletê tê kirin ango cureyên siyasetê yên ku ber bi dewletbûnê ve diçin, nûnertiya gel nakin. Ji ber wê ya di siyaseta me ya roja îro de, tevlibûna rasterast a gel û rejîmên li gorî wê ya, tên nîqaşkirin.

Tevahiya arasteyên ku em weke qirkirina civak û xwezayê digirin dest, bi destê saziyên siyaseta nûner a ku berjewendiya grupan esas digire û bi destê pergalê ango ji aliyê siyaseta dewletperest ve, tê meşandin. Her weke berê di roja îro de jî tevahiya pêkanên ku civak û xwezaya me xera dike, bi spartina reza û rewabûna ku pergala dewletperest pêk tîne, hatiye meşandin û tê meşandin. Qeyranên civakî û aborî yên ku ji her serdemên dîrokî zêdetir kûr dibin, bi riya demokrasiya nûner(temsîlî) ku weke siyaseta demokratîk a herî pêşketî tê pênasekirin, di bin wê siyaseta serwer a ku tu eleqeya xwe bi berjewendî û pêşeroja civakî nîne, tê jiyan kirin. Di wê hêlê de pênase, cudahî û erka siyaseta demokratîk derdikeve pêş. Tam di hêlê de pêwîst e ku siyaseta demokratîk careke din were pênasekirin. Li hemberî qirkirina civak û xwezayê ya ku tê meşandin, ku civakê ji nû de vedigerîne çawaniya wê û ji xebatên siyasetê yên ku qad û hûnandina ferasetê ya hişmendî, rêxistinbûn û asta nîqaşan dikare bidest bixe re, mirov dikarin weke siyaseta demokratîk bi nav bike. Siyaseta demokratîk; xwedîderketin civaka ku rastî hilweşandin û destwerdana mezin hatiye, xweparastin û li ser esasê azadiyê bidestxistina hêza xwe ya cewherî ye.

## Heya Xebatên Zîhniyetê Nebin, Siyaseta Demokratîk Nayê Meşandin.

Civaka ku dikare li ser pêwîstî, pirsgirêk û karê xwe bifikire, nîqaş bike û biçe biryarê û di wê hêlê de bikaribe bikeve tevgerê; dikare qirkirina civakî û xwezayî bide sekinandin û bibe hêza yekane ya çareseriyê. Tenê bi wî awayî dikare pêşî li qirkirina siyasî û çandî ya ku tê meşandin bê girtin û bergiriya yekteşeyî, tunekirina cudahiyan, biyanîkirin, perestina sermayedarî û deshilatdari û qutbûna ji rêgezên exlaqî were girtin. Pêkhatina civakî ya azad û wekhev a ku em bîriya wê dikin, tenê dikare li ser bingehê siyaseteke wisa pêşbikeve.  Ji xeynî wê ya riyeke din nîne. Heya xebatên siyaseta demokratîk a ku bi hezaran sal e civakbûna me afirandiye, pêşxistiye û xistiye bin ewlehiyê ku weke formekî nû taybetmendiyên exlaqî û polîtîk rojaneyî dibe neyê meşandin, civak li ser wê bingehê rewşa xwe ya felçbûyî derbas nekin; civaka wekhev û azad dê her weke utopyayekî bimîne. Feraseta şoreş û şoreşgeriyê ya ku xwe li ser rizgariya civakê pênase dike û ji bo pêkanîna wê ya jî bidestxistina pergala dewletê ku ya di pêkanîna şoreşê de difikire, di pratîka sosyalîzma reel de û di welatên ku piştî  têkoşîna rizgariya netewî derketine holê de, îflas kiriye. Kesên ku dîrokê bi çavê pêşveçûyîner û rast-xêzikiyî dixwînin(kesen ku dîrokê li ser xeteke rast a ku her pêşde diçe û weke xwe dimîne dinirxînin.), tebeqebûnê weke pêşketin dibînin û kesên ji wê hêla xwe ve dewletê weke amûreke azadiyê digirin dest, di hişmendiya wan de şopeke kûr a jakobenizma Fransayê heye.

Heya xebateke xurt a ferasetek demokratîk nebe, xebatê siyaseta demokratîk nayê meşandin. Ji ber wê ya bi kadro û saziyên ku aliyekî siyaseta demokratîk a ku pêşketina hişmendiyeke xwebûnê dike armanc, pêş dixe. Di wan saziyên ku em weke akademiyên siyaseta demokratîk û navendên zanist a civakî bi nav dikin de, derxistina holê ya hêz û behreya(qabiliyet) siyaseta civakê û afirandina kadroyên wê, gelek girîng in. Siyaseta demokratîk, weke ku xwe bispêre vesaziyên zîhniyeta siyaseta serwer, nayê meşandin. Dibistan, saziyên lêkolînê, zanîngeh û medyaya roja îro weke cihên ku hilberîna siyaseta demokratîk a gel û weke cihên ku xebatên zîhniyetê tên meşandin, nayên nirxandin. Ew sazî bi têkiliyeke xurt ji siyaseta serwer re girêdayî ne û weke saziyên ku ji wê re rewabûnê diafirîne, ji siyaseta demokratîk re girtî ne.

Dîsa, heya ku siyaseta demokratîk ji pêvajoya nîqaşê ya gel re neyê spartin, heya ji venêrîn û tevlibûna rasterast re venebe, meşandina wê ne gengaz e. Di wê wateyê de partiyên siyasî, komun, meclîs, konsey, saziyên civaka sivîl, komele, sendîka, rêxistinên pîşeyî yên weke ode-baro, saziyên çandî û civakî yên gel, cîhwarên olî yên ku weke rêxistinên wan pêvajoyan dikarin werin jiyankirin, dikare were fikirîn. Rêxistinbûneke berfireh a ku di nava xwe de koordîneyî ku ji xeynî yekdestên sermayedar û deshilatdaran tevahiya beşên civakê digire nava xwe, ji bo xebatên siyaseta demokratîk mijareke herî jiyanî ava dike. Ew cureya rêxistinbûnan a ku xwe ji dewletbûnê re girtine û xwe dispêrin tevlibûna rasterast, nîqaş û biryabûna gel, çi qasî berfireh bibin, çawaniya polîtîk a civakê ew qasî bi ser dikeve.

**“Heya Hêza Biryarê Bi Hêza Xweparastinê Xurt Nebe, Bi Hêsanî Nakeve Meriyetê.”**

Pêşxistina siyaseta demokratîk a xwe dispêre gel, tevlibûna rasterast û biryarbûna civakê, di serî de dewlet di nav de wê gelek hêzên sermaye û deshilatdar bixe tevgerê. Rastiya civak û kes jî ya ku xwe dispêre kar û deshilatdariya pergala serwer, bi serê xwe weke gefek û xeteriyekî li holê ye. Ji ber wê divê perspektîf û birêkûpêkirina xweparastinê ya siyaseta demokratîk hebe û bikaribe hêza xwe ya parastinê ava bike. Divê siyaseta demokratîk bi wê hêla xwe ve jî were fikirîn û fêmkirin. Pêwîst e ku hişmendî, rêxistinbûn û birêkûpêkirina wê, were afirandin. Ne pêkane ku li beranberî tevahiya şaneyên dewlet û amûrên wê yên deshilatdariyê, xebateke siyaseta vekirî bikaribe encam bigire. Bi wê hêla xwe ve xebatên siyaseta demokratîk li gel hişmendî û çanda berxwedaneke cidî, pêwîst e bi sazî û amûrên xwepastinê yên wê ya didin derbirandin jî xwe birêkûpêk bike.

Gava ku qala siyaseta demokratîk tê kirin, xisûseke din a ku weke hewcedariyekî tê rojevê çalakbûna gel e. Her vesazîbûneke siyaseta demokratîk a ku nîqaş dike, biryaran digire û wê ya derbasî pêkanînê dike, pêwîst e ku bi çalakbûna gel xwe têr bike. Wê ya ji bo siyaseta demokratîk tiştekê jêveneger e. Cihê ku çalakbûna gel nebe, demokrasî pêşnakeve, civakek ku nîqaş dike û biryaran digire, lê nikaribe wê ya bi çalakbûna demokratîk bixe jiyanê, nikare bigihije taybetmendiyên civaka exlaqî-polîtîk. Nikare xwe weke vînekî bide qebûlkirin û li hemberî

çînên serwer rewabûnê pêk bîne. Di wê hêlê de pêşxistina hêza çalakiya demokratîk a gel, lingekî din a girîng a siyaseta demokratîk ava dike.

## Kadroyê Siyaseta Demokratîk Wê Bi Kevneşopiya Berxwedanê Ya Rojhilata Navîn Xweyî Bibe.

Li hemberî êrîşkariya mezin a ku civakbûn û xwezaya me rû bi rû ye, xeta berxwedanê ya ku rizgariya me bi ser dixe, xebatê siyaseta demokratîk e. Xebatê siyaseta demokratîk a ku çerçoveya wê bi wî teşeyê tê xêzkirin, bêguman hîn zêdetir bi kûrahî û berfirehî pêwîstiya lêkolîn û mînakdanan nîşan dide. Weke vebijêrka yekane diyardeya siyaseta demokratîk a ku ji pêwîstiya aştî, demokrasî û azadiya gelên Rojhilata Navîn re dibe bersiv, hîn zêdetir dê were nîqaş kirin û dê li ser weke mirûdekî bi israrî, inyadî û girêdanî were pêşxistin. Rastiya zanatî, ozanî, ewliyatî û pêxemberiyê ku di dîrokê de gelek mînakên wan peyda dibin, ji me re di derbarê 'kesayetiya siyaseta demokratîk' de ya pêwîst e ku çawa be, mînakên pir hêja pêşkêş dike. Dîsa, ji ber ku kevneşopiya gelê me ya berxwedanê gelek tiştên ku pêdiviya pê heye di nava xwe de dihewîne, pêwîst e ku ji nû de were xwendin û fêmkirin. Eger di wê hêlê de bi dest were girtin û meşandin; siyaseta demokratîk tenê bi lûtkekirina vîna zîhnî, rêxistinî û çalaker a gelê me ve sînordar namîne, wê bikaribe xwe bigihîne hêza ku rewşa qeyranê ya ber bi kaosê ve tê paldan jî derbas bike.

Di wê hêlê de pêwîst e ku xweserî li ser bingehê siyaseta demokratîk weke nebe nabe were bidest-girtin û bi xetên xuya xwe ji rastiya siyaseta dewlet-

perest a klasîk cuda bike. Lewma pêwîst e ku li ser meclîsên hemwelatiyê, meclîsên bajêr, meclîsên tax, herêm, kolanan, komun, rêxistinbûnên jin û ciwanan, saziyên pîşeyî, rêxistinbûnê olî û nîjadî pêvajoyeke nîqaş û biryarbûnê ya berfireh derkeve holê. Bi wî awayî meclîsa xweser a herêmê dikare xwe bigihîne naverokekî demokratîk û nûnertiya vîna demokratîk a gel dike.

Xweseriya demokratîk bi têkoşîneke siyasî hatiye rojevê. Siyaseta ku mohra xwe li wê pêvajoya têkoşînê daye, bi serhildana gelê Kurd a herî demdirêj, herî nûjen û herî rêxistinî, derketiye holê. Di wê wateyê de siyaseta cewherî ya gelê Kurd bi xwe ye. Bi qasî ku zanist û nûjen e, xwe dispêre hêza cewherî ya gelê Kurd û besîbûna xwe bixwe esas digire. Armanca wê siyaseta ku xwe weke mîrateya şaristaniya demokratîk digire dest, serxistina civaka exlaqî-polîtîk e. Di wê wateyê de pirparêz, piştevan, komunal û demokratîk e. Azadperestiya zayendê dike û xwe jî weke parçeyekî xwezayê dibîne. Ji ber wê ya; pêkhatin û şixulîna wê jî divê bi wê naveroka xwe re di nava hevsengiyekî de be. Demokrasiya nûnerî ne modeleke ku bikaribe wê  cewherê pêk bînê. Pêwîst e ku li gorî rêgezên demokrasiya beşdarî tevbigere û demokrasiya rasterast bike armanc.

Armanca siyaseta demokratîk civakê ji biyanîbûna siyasetê derxistine û taybetmendiyên wê yên polîtîk ên ku hatine qelskirin, ji nû ve di civakê de zindîkirine. Heya wê ya neyê armanckirin vekişîna civakê ya siyasetê, bê ku di siyasetê de bibe xwedî gotin û biryar şixulbariya demokrasiyê, ne gengaz e ku ji bo pirsgirêka Rojhilata Navîn û gelê Kurd a ku li ser hev kom bûye bibe çareseriyek. Derbaskirina

pirsgirêkên civakê yên li ser hev kom bûne, êdî bi siyaseta nûnertî ne pêkan e. Divê avakirina pêvajoyên gotin û biryarê yên civakê, sazîbûnkirina wan û bi hêzkirina çawaniya polîtîk re roj û pêşeroja xwe bi dest bixe. Çawaniya demokratîk a xweseriyê tam di wê nuqtê de watedar dibe. Gava ku li ser rêxistinbûneke gel a gelek berfireh û li ser vesaziyeke civaka sivîl a gelek berfireh bilind bibe û tevahiya dengên cuda yên civakê bigire nava xwe, vesaziya siyasetê dikare demokratîk bibe.

Me beriya niha pêwîstiya siyaseta demokratîk a zîhnî ku qalibên zîhniyeta kevneşopiyî û cuda derbas dike, anîbû ziman. Ji bo wê jî bi qasî xuliqandina saziyên perwerdehiyê yên gel; divê nîqaşa demokratîk, pêkanîna azadiya raman û îfadeyê, kişandina civakê ya ber bi pêvajoyeke nîqaşê ya demokratîk û rakirina astengiyên pêşiya wê, pêk were. Ji ber ku feraseta dewletperest, nêzîkbûna dewletperest hem di asta dewletê de hem jî di şexsê civakê de were derbaskirin, pêwîstî bi xuliqandina pêvajoyeke wisa ya nîqaşê heye. Ji xeynî kanala ragihandin û agahdarkirina serwer a gel heya derfetên xwe perwerdekirin, agahdarkirin û nîqaşê neyên afirandin, ne çanda nîqaşa demokratîk tê pêşxistin û ne jî mekanîzmayên siyaseta demokratîk çalak dibin. Ji ber wê çendê yek ji armanca sereke ya siyaseta demokratîk divê gel bigihîne asta ku dikare siyasetê bike ye, li ser wê bingehê divê xwe bigihîne saziyên perwerdeyê yên belavbûyî û hûnandî. Di wê wateyê de akademîbûyîn girîngiyeke mezin digire li ser xwe . Perspektîfa dîrokî ya ku siyaseta rojaneyî li ser bilind dibe, danfêmkirin û derxistina holê ya bingehê felsefîk û bîrdoziyî ya demokrasiyê, şixulîn û vesaziya rêxistinî, peywirên

siyaseta demokratîk in. Ji ber wê ya perspektîf û vesaziya siyasî ya xweseriya demokratîk, divê li ser wê bingehê jî bi dest were girtin.

## Baweriya Ji Hişmendî û Çanda Demokratîk a Gel Esas e

Di nava têkoşîna sih û şeş salan de ji gelê Kurd re asteke xuya ya siyasî, zanebûneke bîrdozî û polîtîk derketiye holê û ezmûneke rêxistinî ya girîng pêş ketiye. Di wê wateyê de ji sifrê nayê despêkirin. Eger danehev û nirxên heyî rast werin nirxandin, dê geşedanên mezin û dîrokî derkevin holê. Di wê hêlê de pêbaweriya daneheviya ku hatiye afirandin û ji tecrûbeya ku hatiye jiyankirin, esas e. Berovajiya wê bi nêzîkbûneke bêbawerî tevgerîn, li şûna gel biryar girtin, li şûna gel fikirîn wê li şûna demokrasiya rasterast û beşdarî demokrasiya nûnertî derxîne holê. Di pêvajoya pêşiya me de xisûsa ku herî zêde li ser were sekinandin wê ya ye. Serketina xweseriya demokratîk bi teqezî bi tevlibûna gel a polîtîkayê û ji aliyê gel ve xwe bi xwe şixulandina mekanîzmayên siyasî ve girêdayî ye. Heya wê ya pêk neyê, wê xweseriya demokratîk ber bi mekanîzmayeke nû ya bûrokratîk, vesaziya siyasetê ya ku ji gelê xwe dûr dikeve, biçe û dê veguhere deriyê rantê ku hêza xwe winda dike û diçilvire.

Armancgirtina terzê siyasetê ya ku civak xwe bi xwe bi rêve dibe û nayê birêvebirin, ji îro pê de gav bi gav hûnandina terzê siyaseta demokratîk û di civakê de serwerkirina wê, her wiha ji bo ku bawerî ji siyaseta ku bi navê xweseriya demokratîk tê kirin çêbibe, divê gel esas were girtin, gel tevlî pêvajoya biryarê bibe û xwe di nava mekanîzmayên biryaran de

bibîne. Ji ber ku di wê mijarê de gel di her qadê de vîna xwe derxîne holê, di serî pirsgirêkên xwecihî di nav de tevahiya qadên ku gel eleqedar dike bibe hêza biryarê û pêşî li pêkanên ku vîna gel nasnake û nûnertiya gel weke sembolîk dide diyarkirin were girtin, pêwîstî bi sekneke rêgezî heye.

Xweseriya demokratîk ne pergaleke dewletê ye, pergala gel a demokratîk a bê dewlet e. Pergaleke ku di serî de jin û ciwan di nav de tevahiya beşên civakê rêxistinbûna xwe ya demokratîk ava dikin û pergaleke ku polîtîkayê li ser esasê hemwelatiya azad-wekhev û rasterast di nava meclîsên xwe de pêk tîne ye. Lewma xwe dispêre rêgeza besbûna xwe bixwe û heza xwe ya cewherî. Hêza xwe ji gel digire û di her qadê de besbûna xwe bixwe dike armanc. Di rastiya netew-dewlet de esasê siyasetê; yekperest, pêkûtîner, redker û bişaftîner e. Yek çand, yek ziman, yek nîjad, yek dîrok, yek milet armancê siyasetê ye. Wê ya pirsyarîkirin, wê ya rexnekirin û ji wê ya re berdîl pêşxistin, nabe mijara nîqaşê jî. Di wê mijarê de nîqaşa siyasî, riyên siyasî xelas dibin û zora dewletê ya çors a berbiçav dikeve dewrê. Lewma di rastiya netew-dewletê de siyaset ji despêkê pê de weke xisleteke(karakter) yekperest û pêkûtîner, antî demokratîk û di asteke jor de teng derdikeve holê. Qada ku jê hatiye veqetandin, tenê bi qasî ku ji pêdivî û armancên netew-dewletê re bibe bersiv e. Lêgerîneke wê ya ku wê ya jê bipirse, darizîne û berdîla wê pêş bixîne, nîne.

## Siyaset, Ne Hunera Parastina Statûkoyê Ye

Li Tirkiyê û Rojhilata Navîn vesazî û feraseta siyaseteke ku parastina statûkoyê esas digire serwer e. Ji ber wê ya di civakê de nêzîkbûneke ku siyasetê weke karekî bi sûd dibîne û weke mekanîzmayekî ku pirsgirêkan çareser dike fêmkirin nîne. Ji bo wê ya jî siyaset ji civakê biyanî(xerîb )ye û civak ji wê dûr disekine. Siyaseta ku armancên wê di çerçoveyeke wisa ya teng û dewletperest, antî demokratîk de tê xêzkirin, karê siyasetmedarên wê jî, li ser navê gel dijîtiya gel e. Xisletê siyasetmedarê ku derdikeve pêş xapînokî, derewker û hevkarî ye. Ne berjewendiya civakê, ya dewletê esas digire. Ji bo dewletê bendebûnê(koletî) rewa dike. Di civakê de çi qasî wê rewabûnê pêş bixe, li cem dewletê ew qasî biserkeftî dibe û tê xelatkirin. Gava rewş wisa be; li cem civakê siyaset dibe hunera derew, xapandin, durûtî, sîxurtiya dewletê û sextekariyê. Ji ber wê ya di rastiya Rojhilata Navîn de siyaset û siyasetmedar, rastiya ku jê dûr tê sekinîn û ji ber tê revîn vedibêje.

Feraseta netew-dewletê ya vesaziya burokratîk a navendî û siyaseta tekparêz, di Tirkiyê de bûye sedem ku siyaset weke riya çareseriyê neyê dîtin. Jixwe siyaset jî ne di nava hewldanekî bûye ku bibe navenda çareseriya pirsgirêkan. Bi giştî di Rojhilata Navîn de, bi taybet jî di Tirkiyê de siyaset, weke domandin û parastina şixulîn û vesaziya heyî vêdetir wateyeke xwe a din nîne. Siyasetmedar jî li hemberî wê guhertinê berxwedan û karê parastina statukoyê bi awayeke herî baş dike û weke kesayeta ku tişta heyî wirde û vêde dixemilîne û difiroşe civakê, derdi-

keve pêş. Partiyên ku ne armanc, ne xebat, ne jî mekanîzmaya bingeh a siyasetê ne, ber bi demokrasiyê ve ne vekirî û hestyar in. Armancê siyasetê, parastina statukoyê ye. Di wê wateyê de siyaseta ku xwe dispêre dewletê, ji despêkê pêde paşverû, kevneperest, dogmatîk û derveyî civakê ye. Ji ber wê ya bi armanc, amûr, gotin û çalakiyên siyaseta serwerparêz ne ku civakê bi hêz dibe, berovajiya wê civakê ji taqet û hêzê dikeve. Derketina ji derveyî siyaseta heyî jî bi qedexeyên tund, bi pêkan û amûrên zorê tê astengkirin. Di wê xalê de xetên sor ên dewletê û polîtîkayên ku nayên pirsyarkirin derdikevin pêşberî me. Rêgezên dewletê yên ku nîqaşkirina wan jî ne mewzûbehs e, siyasetê ji qadeke teng hesp dike û siyasetmedarî dixe asteke hêsan a karmendiyê. Gava ku siyaseta demokratîk tê pêkanîn, divê wê ya bi giştî li ber çavan were girtin.

## Kêm Dewlet Gelek Civak e, Kêm Qedexe Gelek Azadî Ye

Yek ji pîvana herî bingeh a demokrasiyê, derfetdayîna xwe îfadekirin û jiyankirina cudahiyan e. Ger ku di nava demokrasiyê de cudahî werin pejirandin (qebûl), xweseriya demokratîk a nasnameyên cuda jî dê were pejirandin. Di esasê xwe de wê ya ji daxwaz û têkoşîna nasnameyekî cuda vêdetir, dilxwaziya demokratîkbûna jiyana civakî û siyasî ye. Pêkanîna "Xweseriya Demokratîk" a pêwîst e ku bi rêxistinbûna sivîl û bi cewherê xwe yê civakê were destgirtin, di rastiya xwe de modela ku bi feraseta "kêm dewlet" "gelek civak", bi gotineke din "kêm qedexe" "gelek azadî" tê pergalkirin. Ji bo wê ya ye ku çareserkirina pirsgirêkên civakê ji dewletê nayê hêvîkirin, bi riya saziyên sivîl û serbixwe civak bixwe çareseriyên pirs-

girêkên xwe pêş dixe, lewma wê ya pergalek zêdetir pratîk, demokratîk û beşdariyî ye. Divê ji aborî heya pirsgirêkên hawirdorî, ji tenduristî heya perwerdeyê, ji çand û hunerê heya azadiya jinê di her qada jiyanê de yekîneyên xweser ên ku xwe bixwe têra xwe dikin, werin ava kirin. Wê ya tê wateya ku civaka bi vîna xwe, pergala xwe ya xweseriya demokratîk ava bike.

Xweseriya demokratîk teşeyeke xweseriyê ya ku hebûna demokrasiyê weke şerteke pêşîn qebûl dike ye. Wê ya jî tenê bi şixulandina siyaseta demokratîk dikare pêk were. Ji bo ku gel tevlî çareseriya pirsgirêkan bibe, divê herêm werin bihêzkirin û gel bibe xwediyê gotin û biryarê, wê ya jî ji bo jiyanîkirina xweseriya demokratîk tişteke jêveneger e. Lewma bi taybetî di pêkhatina siyasî û îdarî ya Tirkiyê de divê reformeke bingehîn a demokratîk pêk were.

Di derbarê rêgez û esasên şixulîn vesaziya siyaseta xweseriya demokratîk a ku di hundirê xwe de esas digire, mirov dikare wê ya bîne ziman. Ji derveyî wê ya xweseriya demokratîk di despêkê dewlet jî di nav de, divê nêzîkbûneke xwe ya siyasî ku qadên derveyî xwe dide meşandin hebe. Rasterast hebûna dewletê red nake, lê armanc dike ku dewletê ber bi demokrsiyê ve hesas bike, wê ya jî bi feraseteke siyasetê ya ku hêzkirina rehendên polîtîk ên civakê pêş dixe û di aliyê hestiyariyê de bi tengkirina dewletê ve girêdayiye. Li gel wê ya rêgeza dewlet+demokrasî dê çawa were pêkanîn, her wiha li gorî wê rêgezê pêkhatina siyasî dê çawa teşe bigire, xisûseke girîng e. Dê çi qasî esasên siyaset û mekanîzmayên siyasî yên dewletê, çi qasî esasên siyaseta demokratîk û mekanîzmayên siyaseta demokratîk derbasdar bin, wê ya mijarên ku divê bi şênberî werin nîqaşkirin û ji

biryarê werin girêdan. Di wê mijarê de asta amade-karî, asta rêxistinbûn û asta bandorbûna hêzên ku xweseriya demoktîk tînin rojeve û ji raya giştî re radigihînin, dîsa helwesta dewletê ya ku di wê mijarê de raber dike, xuyaker e. Pergalên cîhanê yên xwe dispêrên xweseriyê di bergeheke siyasî ya gelek berfireh de ne û nêzî sed welatan tê pêkanîn. Ji wan hinek demokratîk in û xwe dispêrin esasên rêveberiya xwecihî, hin ji wan li gorî rêgezên siyaseta demokratîk li ser esasên demokrasiya nûnertî, di bin saziyên siyasetê yên dewletperest de tên pêkanîn. Di tevahiya welatên ku xweserî pêk tê de, bi qasî tercîha siyasî ya herêmên xweser, înîsyatîfa siyasî curbicuriyê  derpêş dike û xwesertî, di bin şêwazeke yek teşeyî de nayê jiyankirin. Hema bêje bi qasî hejmara herêmên xweser, curbicuriya xweseriyan jî heye. Pêkanîna xweseriyê ya ku dê di taybetmendiya Kurdistanê de pêk were, wê bi beraftin(müzakere) û têkoşîna her du aliyan teşe bigire û bi aliyên xwe yên xweser karakterîze bibe.

## ŞAXA HIQÛQÊ YA XWESERIYA DEMOKRATÎK

Gelê Kurd bi têkoşîna ku çil salên dawiyê meşandiye û berdêlên daye, hebûna xwe ji tevahiya cîhanê re daye îspatkirin. Gelê Kurd ku nifûsa xwe ji çil mîlyon zêdetir, eger hîn jî neçar mabe ku di sed sala 21. de têkoşîna îspatkirina hebûna xwe bide û di wê oxirê de berdêlên gelek giran bide; bi qasî ku ji bo tevahiya mirovahiyê şermeke mezin be, ji Kurdan re ji bo jiyanek bi rûmet tişteke ku nebe nabe ye. Ziman û nasnameya heywanan jî nayê înkarkirin û qedexe-kirin, lê ziman û nasnameya wî gelî hat înkarkirin û qedexekirin. Kurdan bi saya wê têkoşîna ku dane, bi hemû bûutan ve nasnameya xwe ji nû ve afirandin û bi dest xistin. Ji bo Kurdan tişta ku ji niha pê de were kirin; di her qada jiyanê de ew nasnameya ku hatiye afirandin, birêxistinkirin û weke şênber di qada hiqûqî, siyasî, aborî, çandî, xweparastin û dîplomasiyê de jiyanî kirine.

Ji bo Kurdan  dewra çaremîn a têkoşînê jî tê wateya pêkanîna wê jiyanîkirinê. Projeya bingeh a dewra çaremîn a têkoşînê ku weke dewra **'hebûna xwe parastin û azadiya xwe bidestxistinê'** tê binavkirin, xweseriya demokratîk bixwe ye. Şaxa hiqûqî ya xweseriya demokratîk ku çerçoveya bingeh a nivîsa me ye, têkilya gelê Kurd a bi dewletê re dê çawa were pêşxistin, digire dest. Em dikarin wê ya bi wî awayî jî bînin ziman: Gava em qala xweseriyê dikin, bi cewherî pirsa were pirsîn ew e; di navbera hêzên dewlet û demokrasiyê de têkiliyek hiqûqî ya çawa?

Hiqûq, ji despêka şaristaniyê pê de jiyana civakî beralî kiriye, weke rêgezên bingehîn ên rêkûpêkirinê ketiye şûna exlaqê civakî û bi esasî weke amûrekî ku pêkûtî û mêtîngeriya dewletê li ser civakê ferz dike, hebûna xwe domandiye. Hêza xwe ya danekirinê ji hebûna xwe ya ku xwe dispêre zorê digire. Wê ya jî dibe sedem ku di dîroka zorî û serweriyê de heman kategoriyê de bin. Ji ber ku bi dîroka serweriyê re despêkiriye, sûdeke gelek kêm daye civakê. Zêdetir rista rewakirina dewletê lîstiye. Lewma divê wê ya neyê bîrkirin; hiqûq û dewlet weke goşt û nênûkê ketine di nava hev de. Ango yek nebe, ya din jî nabe. Ji ber wê ya çawaniya yekî, çawaniya ya din jî dide xuyakirin. Di wê hêlê de dewleta ku ber bi demokrasiyê hestiyar dibe, di rastiya xwe de demokratîkbûna hiqûqa wê dewletê rave dike. Ew jî tê wateya guherîna belge û rêgezên hiqûqî yên ku ew dewlet ji xwe dikin bingeh. Di dîroka şaristaniya navendî de di encama têkoşîna ku li hemberî pergala serwerperestiyê hatiye meşandin de, di vesazibûnên dewletê de ku bandora xwe li ser hiqûqê jî kiriye, neçar bûne ku guhertinan bikin. Civakbûna ji derveyî dewletê, di encama têkoşîna ku li hemberî pergala dewletperestiyê daye meşandin de, pergala parlementeriyê ya ku xwe dispêre cudahiya hêzan derxistiye holê. Piştî şoreşa Îngilîz, Amerîka û Fransa ku em weke şoreşên gel bi nav dikin, êdî dewlet neçar man ku çavkaniya serweriya xwe bispêrên gel û li gorî guncavbûna wê tevbigerin. Li şûna feraseta 'kral xwedê' an jî 'kralê nûner ê xwedayê li ser rûyê erdî',rejîmên komar ên ku gel rêveberên xwe yên dewletê hildibijêre, pêşketiye. Hêza dewletê ji sê erkan(qanûnsazî, rêvebirî, darazî) hatiye belavkirin. Bi wî awayî, ya berê bixwe dawî li pergalên monarşîk

aniye, ber bi rejîma ku dewletê bi hiqûqê ve sînordar dike ve diçe.

Pêvajoya geşedana hiqûqî ya ku di encama têkoşîna gelan û civak de hatiye meşandin, di merheleya heyî de di çeçoveya mafê mirovan a sê nifşan de gihiştiye asteke gerdûnî. Ji 'maf û azadiya kes' ku di lîteratûriyê de weke 'mafê mirovan a nifşê yekemîn' ku di bin siya lîberalîzmê de hatiye bi dest xistin, ji 'mafên aborî, civakî û çandî' ku di lîteratûrê de weke ' mafê mirovan a nifşê duyemîn' ku zêdetir ji aliyê pergala reel sosyalîst tê pejirandin, ji wir jî heya 'mafê piştevanî' ku di lîteratûrê de weke 'mafên mirovan a nifşê sêyemîn' ku bi nêrîneke gerdûnî hatiye bi dest xistin, hatiye. Bêguman ew rewş li gorî berjewendiya gel e û dewletê sînordar dike. Bes, bi dewletan re xwe bi wê ya rûpoş(maske) dike û dibe sedem ku emrê dewletan dirêj bibe. Ji ber wê jî, bê ku civak bi rêgezên hiqûqî pêwendiyên xwe yên bi dewletê re rêkûpêk dike, sînordar bike, divê rêxistin-bûnên xwe yên cewherî ku di rastiyê de xwe dispêre exlaq û ji derveyî dewletê ye, pêş bixe. Wê ya ji bo azadî, wekhevî û rizgariya rast nebe nabe ye.

Ger mirov bi baldarî li jiyana wê ya civakî binêre, di tevahiya civakan de kar û jiyana civakî ne bi hiqûqê, zêdetir bi exlaqê tê meşandin û birêxistin-kirin. Exlaq, ji bo jiyana civakî di rista xercê de ye. Hêmana sereke ya ku civakê dike civak ne hiqûq e, exlaq e. Exlaq, bi polîtîkayê re dumendiyên ku xwezaya civakî ava dikin in. Ji ber wê ya jî cihê ku civak lê heye; çi bi qasî ku weke pergalekê jiyan bike bi hêz be, çi jî weke di şert û mercên modernîteya kapîtalîst de ku xwe kişandine asta herî jêr, exlaq û polîtîka hene. Ji ber ku exlaq û polîtîka heqîqeta

civakê ne. Civakek bê exlaq û polîtîka nayê fikirîn. Rewşeke wisa tenê ji bo şertên tunebûnê dikare pêkan be.

Ji ber ku pergala şaristaniya navendî qutbûna ji polîtîka û exlaq a ku xwezaya civakî ne rave dike; civakên wê demê, berovajiya civaka xwezayî neçar tê hiştin ku hem bi exlaq, hem jî bi hiqûqê re jiyan bikin. Civak, di nava xwe de karên xwe bi exlaq dimeşîne û jiyana xwe bi exlaq birêkûpêk dike, karên xwe yên bi dewletê re jî bi hiqûqê re birêkûpêk dike. Ew dîroka şaristaniya navendî çavkaniya hebûna xwe ji aliyekî ve dewlet, ji aliyê din ve jî ji civakê digire.

Di vê çerçovê de ji ber ku hiqûq li gorî formûlasyona dewlet+demokrasî bi temamî ji holê nayê rakirin, ji bo ku edalet pêk were, tenê riyek dimîne; ew jî demokratîkirina hiqûqê ya ku dewlet li gorî berjewendiya xwe dişixulîne ye. Ew jî tê wateya çêkirina zagon û makezagonên demokratîk. Jixwe armanca şênber a meşandina wan nîqaşan; pêkanîna çêkirina makezagonekî demokratîk û di vê makezagonê de temînatkirina maf û nasnameya gelê Kurd e. Lewma hiqûqa ku xwe li ser wê rastiyê di zagon û makezagonan de dide der, digihije çawaniyeke demokratîk. Di wê hêlê de nîqaşa şênber a ku em di nav de ne, ew e: Ji bo ‘Tirkiyek (ji bo Sûriye, Îran, Iraqê jî derbasdar e)Demokratîk û Kurdistanek Xweser’ makezagonek çawa?

Feraseta me ya xweseriya demokratîk, ji ber xwe naspêre bingeheke herêmî û erdnîgariyî, ango xwe naspêre hebûna nasnameyên civakî û weke mînakên ku hene xwe tenê naspêre karên hiqûqî. Mînak;

xweseriyek ku bi makezagonên herêmî yên weke Fransayê hatine birêxistinkirin nîne. Feraseta beşên civakê yên ku xweseriya xwe rêxistin dikin û hez dikin xwe birêxistin bikin, hevparîbûna xweseriyek ku " Peymana Civakî" esas digire ye. Çawa ku ew peymana civakî dikare bibe ya grupek nîjadî, dikare bibe ya grupek olî jî. Ango weke kategoriyek civakî ya jin û ciwanan, dikare rêxistîbûna xwe ya xweser û peymanên xwe yên civakî jî çêbike.

Lewma makezagonek demokratîk, li ser esasê liberçavgirtina tevahiya wan rastiyan divê were vesazkirin.

## Bi Makezagonek Nû û Demokratîk Xweseriya Demokratîk:

Weke tê zanîn a ku çawaniya(wesif) makezagonan dide diyarkirin, felsefe û ruhê wê ye. A ku çawaniya xalên di makezagonê de dide diyarkirin jî ew ruh e. Di hin rewşan de ew ruh; di beşa despêkê de derdikeve holê, di hin rewşan de jî, ji xalên despêkê ya yekê, an jî di hin xalên din ên makezagonê de derdikeve holê. Di welatekî de lihevhatîbûna makezagonê ya bi krîterên demokratîk re, di wî welatî de demokratîkbûna ferasetê an jî feraseta ku tê armanckirin çi ye, nîşan dide. Çareseriya pirsgirêka Kurd, girêdayî demokratîkbûna ferasetê ye. Kurd, di wê mijarê de civakek e ku bûye xwedî ezmûn.

Li Tirkiyê ya ku ruh daye makezagona 1982'an hem beşa despêkê, hem jî naveroka xalên wê yên ewil in. Wekî tê zanîn makezagona heyî ya Tirkiyê, makezagoneke ku li ser yekayan hatiye ava kirin û bi wê taybetmendiya xwe, xwediyê ruhekî qirker û faşîst e. Beşa despêkê ya makezagonê li ser redkirina

tevahiya civatên qewmî û li ser redkirina nasnameyên din ên xweser saz bûye û bi gotineke faşîzan têgeha "Tirk" ketiye nava ruhê makezagonê. Dîsa her çar xalên despêkê yên makezagonê wî ruhê faşîst, dixe bin ewlehiyê. Ji ber wê ya makezagona ku tê çêkirin, divê bi teqez xwediyê felsefeyek ku li gorî mozaîka gelên dewlemend ên li Tirkiyê be. Balkişandina nasnameyek qewmî, demokratîkbûna makezagonê asteng dike. Lewma makezagona nû, divê li ser 'hemwelatiya makezagonî' were sazkirin. Ji ber wê ya makezagonek nû divê li hemberî hebûna tevahiya nasnameyên qewmî, olî û zimanî, an jî li hemberî hebûna tevahiya hêmanên piraniyan di mesafeyek wekhev de be. Eger mafên Kurdan û nasnameyên din ên olî û qewmî di makezagonê de bikeve bin ewlehiyê û ew rewş, ji aliyê tevahiya beşên civakî ve were pejirandin, wê di nava tevahiya gelan de xwişk û biratiyeke rastîn pêk were. Ji ber ku makezagon metnên ku bi qasî têkiliya civakan a di navbera xwe û têkiliya civakê ya bi dewletê re birêkûpêk dike, têkiliya kesan a bi dewlet an jî civakê re jî birêkûpêk dike. Di wê hêlê de ewlehiya makezagonî, di mayîndekirina yekitiya di navbera gelan û civakan de risteke girîng dilîze.

Beriya her tiştî divê makezagon, peymana civakî ya Kurdan nas bike û pê re di nava hevsengiyekî de be. Eger makezagonek xwediyê felsefe û ruhekî wisa be, dikare demokratîk be û di avakirina Tirkiyek demokratîk de rista xwe bilîze. Xweseriya demokratîk weke îfadeya şênberbûna hiqûqê "makezagona demokratîk" kîjan qadan digire nava xwe? Divê wê ya weke şênber derxîne holê.

Di serî de çareseriya ziman ku di navenda tevahiya nîqaşan de ye, divê bikeve bin ewlahiya (garantiya) makezagonî. Ziman, rewşeke ku bi kokê ve girêdayî ye. Tevahiya zindî li ser kokekî hebûna xwe watedar dikin. Lewma nêzîkbûnek bi qasî nêzîkbûna ku dibêje; “ez hebûna te qebûl dikin, lê ne koka(ziman) te” bê wate nîne. Di wê hêlê de ziman, bîra(hafize) civakê ji nifşên pêşerojê re gihandin e û bi wî awayî civak hebûna xwe berdevam kirine. Tenê ew rastî bi serê xwe çima zimanê gelekê nayê redkirin û divê bikeve bin ewlahiya makezagonê, ji me re rave dike. Di wê nuqtê de wateya têkoşîna Kurdan a xwedîderketina zimanê xwe, careke din derdikeve holê.

Weke mînakên heyî de jî tê dîtin, di dewletekê de di qadên gelemperî de zimanên cuda tên bikaranîn. Mînak; li Fransayê ji xeynî zimanî Fransî bi şeş zimanên herêmî perwerde û hîndekarî tê kirin. Eger em bi wê nêzîkbûnê bigirin dest, li Kurdistanê divê di tevahiya qadên gelemperî de Kurdî bibe zimanê bingehîn. Ji navên bajaran bigire heya yên gundan, ji navên kuçe-kolanan bigire heya navên nîşanên ku tên bikaranîn di tevahiya qadên gelemperî de bikaranîna zimanê Kurdî, ji bo pêşxistin û temînatkirina zimanê Kurdî tiştek ku nebe nabe ye. Di tevahiya qadên gelemperî de Kurdî û Tirkî bi hev re tên bikaranîn. Li gorî xweseriya Kurdan di saziyên hiqûqî yên civakî yên ku ava dikin de, divê Kurdî were bikaranîn. Mînak; divê di dadgehên xwecihî de zimanê Kurdî bingeh were girtin. Di aliyê bikaranîna azadiyên olî de jî divê zimanê zikmakî were bikaranîn û têkeve bin ewlahiyê.

Heman rewş ji bo ku zimanê Kurdî bibe zimanê perwerdehiyî jî derbasdar e. Di Kurdistanê de divê zimanê bingehîn ê perwerdehiyê bibe zimanê Kurdî. Tenê bi wî awayî Kurd dikarin bîra xwe ya civakî ji nifşên pêşerojê re bigihînin. Ji ber wê, perwerdeya zimanê zikmakî tenê ne perwerde ye. Rewşa ji wê ya gelek wêdetir îfade dike. Ew jî, weke mirov wate dibîne. Weke civak wate dîtine. Weke zindî wate dîtine. Ji ber wê ya bi awayeke devkî-nivîskî di her qada jiyanê de bikaranîna zimanê zikmakî, weke her gelekî, mafê herî xwezayî yê gelê Kurd e jî.

Xisûseke din a duyemîn û herî girîng ku pêwîst e bibe mijara makezanê, ewlakirina makezagonî ya mafê Kurdan ê xwe bixwe birêvebirinê ye. Weke pêwîstiya demokrasiyê, Kurdên ku xwediyê nasnameyeke cuda ne, mafê wan ê xwe birêvebirinê heye. Di wê mijarê de avakirina meclîsên xwecihî yên ku nûnertiya xwe di tê de dibînin û pirsgirêkên xwe çareser dikin, mafê herî esasî yê gelê Kurd e. Çawa ku ew meclîsên xwecihî ne dijberê meclîsên giştî ne , berdîlbûna(alternatîf) wê jî nake armanc. Îro, di welatên ku demokrasî zêdetir pêşketiye de rêxistin-bûna xwecihî  û meclîs, saziyên herî girîng ên xwedî erk in. Bê ku hikûmeta navendî pê re eleqedar bibe, meclîsên xwecihî di tevahiya mijaran de weke mekanîzmayên biryargirtinê rista saziyên siyasî yên bingehîn ên civakê dilîzin. Bi wî awayî civak pirsgirêkên xwe bixwe çareser dike û xwe ji rewşa hewcedariya dewletê derdixîne û ew jî dibe sedem ku zemînê mêtîngeriya dewletê ji holê rabe.

Encameke herî girîng a wê rewşê jî; paşdevegerîna civakê ya rastiya xwe ya polîtîk û zêdebûna eleqeya wê ya polîtîkayê ye. Ew jî wê bibe sedema zêdebûna dînamîzma civakî û esasgirtina kesan a beşdarbûneke civakî ya hîn bi tenduristir. Bi wî awayî pergala jiyana demokratîk a ku hevparîbûna berjewendiyên tevahiya civakê ye, wê awayeke hîn bi hêztir bigihije derfetên sazîbûnê. Di makezagona nû de, bi azadiya rêxistinbûn û ramanî vîna gel wê xwe bigihîne derbirandineke(îfade) rast. Êdî tenê meclîsên giştî dê weke saziyên ku vîna gel derdixînin pêş neyîn dîtin. Rêxistinbûnên ku ji kolan, tax, gundan despê dike û heya digihije bajarok û tevahiya bajar, di wateyeke rast de nûnertiya gel pêk tînin. Eger bi rêxistinbûnên wisa yên meclîsên giştî an jî yên xwecihî ku ji gel despê dike binê wan neyê dagirtin, vîna gel bi awayeke tam nagihije asta nûnertiyê. Di navbera gel û meclîsan de biyanîbûn wê dîsa bidome. Makezagon divê tevahiya wan xisûsan bixe bin ewlahiyê.

Di du sed salên dawiyê de bi bişaftinê hewl hat dayîn ku çanda Kurdan ji holê rakin. Bi wî awayî her cure pêwendiyên Kurdan ên rasterast ango nerasterast ku bi dîroka xwe ya borî ve girêdayiye, hez kirin ku qut bikin. Ji ber wê ya; di makezagonê de divê vesaziyên ku polîtîkayên qirker ên ku li ser çanda Kurdan tên kirin werin redkirin û rûxandina ku li ser çanda Kurdan pêk hatiye were telafîkirin, hewce ye ku makezagon, mafê Kurdan ê wê derbarê de bixe bi ewlahiyê. Di wê hêlê de çanda Kurd, divê xwe bigihine şertên ku di tevahiya qadên jiyanê de dikare bi awayeke azad xwe îfade bike.

Di pergala heyî de dewlet, di pozîsyona yekdestîkirina herî mezin de ye. Hêmanên kapîtalîst ên ku ji aliyê makezagona nû tên parastin, li ser civakê pergaleke mêtîngeriyê ava dike. Ji ber wê ya jî civak weke aborî di nava jiyana sefalet de hatiye mehkûm kirin. Pergaleke aboryê ya ku mafê keda xwe ya civakî peyda nake, di tevahiya çavikên civakê de cihê xwe girtiye. Di nava wan rastiyan de peywirên herî girîng ên makezagoneke demokratîk, li gorî pîvanên edaletê birêkûpêkirina jiyana aboriyê ya civakê ye. Hebûna vesazîbûnên aboriyî ku xwe dispêre hêza cewherî ya civakê, ji ber ku berjewendiyên civakê di plana pêş de bigire, xisûseke ku nebe nabe ye. Parvekirina adilane ya çavkaniyan, tişta jêveneger a demokrasiyê ye. Ji ber wê ya di heman demê de vesazîbûnên aboriya xweser a yekayên xweser, divê di makezagonê de bikeve bin ewlahiyê. Tenê bi wî awayî mirov dikare pêşiya yekdestîkirinê bigire.

Civakek bê parastin be, di dawiyê de bi tunebûnê re rû bi bû dimîne û Kurdan di ezmûna xwe ya jiyanê de ew rewş baş naskirine. Ji ber wê ya, ji bo Kurdan jiyana civakî li ser esasê xweparastinê parastin, yek jî pîvana herî bingehîn a demokratîkbûnê ye.

Bi wan rewşa re; hem bi gelên cîran re, hem bi gelên cuda re, hem jî bi Kurdên parçeyên din re şertên pêwendiyeke rasterast pêkanîn û ji bo wê ya bi zagon û makezagonan ewlakirina sazîbûnan jî, pîvanên bingehîn ên demokrasiyê ne.

## Konfederalîzma Demokratîk - Xweseriya Demokratîk

Têgeha Konfederalîz û Xweseriya Demokratîk gelek caran ji hev nayên derxistin û weke berdîlên hev du tên nirxandin, lê her ji wan yek rastiyeke cuda îfade dike. Xweserî, weke ku me li jêr jî daye diyar kirin hiqûqa têkiliya bi dewletê re îfade dike, konfederalîzm jî teşeya jiyan û rêxistinbûna civaka demokratîk îfade dike. Konfederalîzma demokratîk, weke civakbûna ji derveyî dewletê çavkaniya xwe ji xwezaya civakî ya modernîteya demokratîk digire û ji ber ku tê wateya bipergalkirina nirxên demokratîk-komunal, organîzasyoneke siyasî ya gerdûnî ye. Di dîrokê de heya roja me ya îro,ya ku di beşên civakê yên ku li hemberî pergala dewletperest têkoşîn daye meşandin de kêmas maye, bersiva avabûna dezgeha poilîtîk a ku li gorî guncaviya armancê ye. Civak, bi konfederalîzma demokratîk derfetên ku dikarin xwe ji pergala dewletperest rizgar bikin, peyda dikin. Aliyeke xwe wisa ya dîrokî heye. Bi wê ya re konfederalîzma demokratîk, bi taybetî jî li Rojhilata Navîn ku hevsengiyên cîhanê li saz dibin û di têkoşîna teşedayîna ku di çerçoveya Projeya Rojhilata Navîn a Mezin(PRM) a Rojava ku DYE(Dewleta Yekitiya Emerîka) serkêşiya wê dike de, pêwîstiyeke rojane jî pêşwazî dike. Gelên Rojhilata Navîn bi konfederalîzma demokratîk ne mecbûr in ku tercîhekî di navbera statûkoparzên ku nûnertiya paşverûtiya herêmî dikin û nûnertiya mêtîngeriya kûrewî dikin de bikin. Konfederalîzma demokratîk li ser esasê dijîtiya wan her du yan, xwegihandina derfetên avakirina pergalek bê dewlet e.

Gava ku konfederalîzma demokratîk wê ya dike jî, xwe dispêre hêza xwezaya civakî û nirxên wê yên komûnal ên demokratîk, bingeha kevneşopiya cudahiyên çandên Rojhilata Navîn ên bi hev re jiyan dikin û xwe dispêre hêza têkoşîna azadî û demokrasiyê ya çil salên ku PKK'e dimeşîne. Konfederalîzma demokratîk ji wê hêla xwe ve ne tercîheke ku wisa li ser maseyê tê avakirin e, pergalek herî guncav a xwezaya civakî ye. Ji ber ku dîroka wê jî xwe dispêre nirxên komunal ên demokratîk, li gorî dewletê gelek bi bingeh û kevn e. Ji ber wê rastiyê ye bê ku li hebûn an jî tunebûna xweseriya demokratîk were nêrîn, di wateyeke rast de xebata konfederalîzma demokratîk ji bo azadbûnê şert e û divê hebe. Di rewşek ku dewlet xweseriya civakê qebûl dike an jî qebûl nake de ya ku pêwîst e pêk were; pêşxistina konfederalîzma demokratîk e ku tê wateya rêxistinbûna ji derveyî dewletê.

Di formûlasyona dewlet+demokrasiyê de, 'dewlet' vesaziya serdestiya heyî temsîl dike, 'demokrasî' jî di wateya pergala civakî ya ji derveyî dewletê de ku li beranberî wateya 'konfederalîzma demokratîk' tê, temsîl dike. Şertên bi hev re jiyankirinê jî xweseriya demokratîk a ku rista (+) dilîze, pêk tîne. Lê belê ji ber ku Komara Tirkiyê di navbera xwe û civaka demokratîk de '+' qebûl nake, li gorî nêzîkbûna faşîst a netew-dewletperstî ku yekperestiyê dide ferzkirin û civakê weke hebûnekî napejirîne, xweseriya demokratîk jî wê bi temamî derbasî jiyana ku li gorî pêwîstiya taybetmendiya têkoşîna heyama 4.(çaremîn) a ku ji derveyî dewletê ye bibe. Îro pozîsyonek ku dişibe wê rewşê, li herêma Chîpasê ya ku di pêşengtiya Zapatîstên Meksîkayî de

ye tê jiyankirin. Dewlet, tenê bi operasyonên berfireh dikeve wê herêmê. Ji wê ya wêdetir ti pêwendiyekî cuda ya herêmê bi dewletê re nîne. Ji ber wê ya jî, di roja îro de ji bo Kurdan xweseriya demokratîk û konfederalîzma demokratîk ne tiştên ku gelek ji hev du cuda ne. Ji ber ku ti mafeke Kurdan ê Kurdbûyînê ji aliyê dewletê ve nayê naskirin û ji ber ku Kurd neçar dibin ku wê ya bixwe bixin pratîkê; gava ku xweseriya demokratîk tê gotin, di cewherê xwe de konfederalîzma demokratîk tê fêmkirin.

Wê ya di serî de Kurd di nav de li hemberî nasnameyên hemû beş û civatên nîjadî, zimanî, olî, zayendî û civakî rêzdar e û tevahiya wan nasnameyan dixe bin ewlahiyê. Ew xweseriya demokratîk, ne parçeyeke feraseta deshilatdariya çînên(tebeqe) serdest e. Ango ne dewletê, ne jî feraseta dewletperestiyê digire nava xwe. Di nava demokrasiyê de bi awayeke azad navê jiyanîkirina nasname, ziman û mafên çandî yên gelê Kurd e û tevahiya gelên bindest e. Ew, di welateke demokratîk de ji ber civakbûna xwe ya cuda bikaranîna mafan e. Ji bo bikaranîna wan mafan weke taybet li teşeyeke îdarî nayê gerîn. Weke ku me li jor jî daye diyar kirin; teşe li gorî wê ya dikare pêk were. Çi weke pêkhatina ûnîter ya roja îro be, çi pergala eyaletê be ew maf dikarin werin bikaranîn. Bi cewherî; ji bo pêkhatina vê xweseriyê, ne şert e ku filan an jî biyan pergala îdarî hebe.

**Di Encam de:**

Di sed sala 21. de sazûmaniya dewletan a ku xwe dispêre navendperestiya hişk, xeterî, bişaftîn, pêkutî, ceberûtî û şoveniyê, yek bi yek dihilweşin û wê ya weke rastiyekê li ber çavan e. Di berê de israr kirin

çawa ku nikare pêşiya hilweşandinê bigire, wê bi xwe re zêdetir zerarê bîne. Feraseta netew-dewletê ya ku roja îro li pêşiya azadî û mafên bingehîn asteng e û pergalên siyasî yên ku girêdayî wê ya ne, ji xeynî derxistina qeyranê wê bi xwe re tişteke din dernaxîne holê. Di çavkaniya pirsgirêkên civakî yên ku encamên wan her roj giran dibin de, ew rastiya netew-dewletê heye.

Geşedana dewletê ya ber bi demokrasiyê ve, di çareserkirina pirsgirêkên civakî de şerteke sereke ye. Wê ya jî di dewletekê de tê wateya demokratîkbûna normên hiqûqî. Ango weke derbirandina şênber a hiqûqê tê wateya demokratîkirina makezagon û zagonan û adilbûna wan. Eger piranîparêziya di qadên nîjadî, olî, siyasî, zayendî, zimanî û hwd. yên civakê de li ber çav were girtin, li şûna makezagona ku xwe dispêre tenê beşekê, wê makezagonek adilane ya ku dikare hêviya tevahiya wan beşan pêk bîne derkeve holê. Bêguman wê ruhê wê jî demokratîk be.

Dîsa makezagonek demokratîk-adilane divê ji aliyekê ve nirxên gerdûnî yên nûjen bihewîne, ji aliyê din ve jî divê xwe digihîne nirxên erdnîgariyî, dîrokî û çandî yên gel û nasnameyên civakî yên cuda ku xîtaba wan dike û divê wan hembêz bike.

Di nava rastiya makezagoneke wisa de civak, dikare gelek karên ku dewletê nekirine ango nekariye bike û di heman demê karên de jê re bûne bar, bigire li ser xwe û bi cih bîne. Civak, berpirsyariya xwe bixwe digire ser xwe. Ti gumanek nîne ku sînorên demokrasiyê yên ku civakê bixwe diyarkirine û sînorên deshilatdariyê yên dewletê, her tim nakokî û pevçûnan jiyan nekin. Ji ber ku yek hewl dide ku qada

ya din teng bike û bi sînordar bihêle. Bes, ew weke hewcedariya diyalektîka dîrokî wisa ye. Ew rewşa pevçûn û nakokiyan nayê wê wateyê ku ew her du hêman hev du nasnekin.

Gava ku mirov wan rastiyan di şênberiya Kurd de digire dest, ên ku herî zêde pêdiviya wan bi xweseriya demokratîk heye û di heman demê de yên ku herî zedê xwediyê potansiyela pêkanîna wê ya ne, rastiya gel a Kurd e. Îro di tevahiya dinyayê de gelê yekane yê ku ti mafeke xwe yê siyasî, hiqûqî, civakî, aborî, leşkerî û dîplomatîk nîne, gelê Kurd e. Di roja îro de mînakek weke wê ya nayê dîtin. Bêguman di berê de pêkanên ku dişibin wê ya ketine rojeva welatên cuda. Lê, ruxmî ku em ketina sed sala 21. hêj jî ew qirkeriya pir alî li ser Kurdan tê pêkanîn.

Ger mirov li ser wê bingehê binirxîne; meşandina têkoşîna demokrasiyê ya Kurdan û ji bo wê ya pêşxistina projeyek weke xweseriyê, gelek watedar e.

## ŞAXA ABORÎ YA XWESERIYA DEMOKRATÎK

Nêzîkbûneke girîng a ku demeke dirêj e rastiya wê dibe mijara nîqaşê; bi têkiliyên xwe yên aboriyê, pergalên civakî nirxandin û binavkirine. Tevahiya şîrovekerên dîrok û civakê yên bi mantiq pozîtîvîst (nêzîkbûna dîrokê ya materyalîsta çors(qeba) jî daxilê wê ya ye) bi xwespartina wê ferasetê, dîrok û civakê bi dabeşkirina beşan bi nav dikin. Li gorî wê nêzîkbûnê dîrok û civak, bi riya têkiliyên aboriyê weke civaka komunal a hoveber(seretayî), koledar, feodal, kapîtalîst û sosyalîst a li gorî serdeman hatiye rêz kirin. Li gorî wê ya; pêşdeçûna civakan, di çerçoveya wê vegotinê de pêkhatiye an jî di bereka wê ravekirinê de pêşdeçûna civaka dîrokî hatiye hizirîn.

Ew nêzîkbûn bi feraseta dîroka pêşdeçûyî tevdigere. A ku pêk hatiye weke hewcedariyeke jênerevîn dinirxîne. Weke ku ji xeynî dîrokê ti vebijêrk nîne tevdigere. Lê, bi ya ku pêk hatiye; nedîtina vebijêrkên din ên dîrokê ye û ew jî li pêşiya rastşîrovekirina dîrokê asteng e. Civaka dîrokî, bi riya têkiliyên dîrokî nirxandin, wê hin rastir be. Rêbertî sê teşeyên civakî yên dîrokê tîne ziman: Civaka xwezayî, civaka dewletperest û hiyerarşîk û civaka demokratîk. Taybetmendiyên civaka xwezayî di nava pergalên aboriyê de her çi qasî zêde xuya neke jî, di asteke girîng de bi şaristaniya navendî re her hebû ne. Jixwe bi dîroka şaristaniyê re herikîna du çemên li rex hev ên ku weke şaristaniya demokratîk û dewletperest tên binavkirin jî, wê ya nîşan dide. Lewma di tevahiya pergalên ku bi saya têkiliyên aboriyê hatine ava kirin de, karibûne bi hebûna wê civaka xwezayî jiyan bikin.

Dabeşkirina dîrokê ya ku bi têkiliyên aboriyê hatiye kirin, bi saya hêzên hilberîner û têkiliyên hilberî pêşketiye. Li gorî wê ya kole amûreke hilberandinê ye. Lewma gava ku têkiliya di navbera kole û xwediyê kole de ji aliyê têkiliyên hilberandinê ve bi dest tê girtin, pênaseya pergala koledar zêdetir dikeve serê mirov. Di tevahiya dabeşbûnên civakên hiyerarşîk ên dewletî de jî, di çerçoveya heman mantiqê de pêkhatiye. Kapîtalîzma ku daneheva dîrokî ya şaristaniyê daye pişt xwe, ku ew jî xwe dispêre sêlibiya bajar-çîn(tebeqe)-dewletê, weke têkilî û terzê hilberandinek li ser wê bingehê hatiye terîfkirin.

Tevahiya vesaziyên ku xwe dispêrin terzê hilberandin û têkiliyên hilberandinê, xwe spartine bingeheke hiyerarşîk û çînî. Kapîtalîzm, her çi qasî bi angaşta azadkirina kedê tevdigere jî, ew proleterên tê angaşkirin ku di bin wê pergalê de azad bûne, weke ku Rêbertiyê nirxandiye; “ koleyên ji nû ve hatiye fethkirin” vêdetir tiştеke din nîne. Angaşka ku dibêje ked hatiye azadkirin; bi terzeke hin çalaktir û veşartî meşandina pergala mêtînger û serdest dike armanc.

Di wateyeke rast de azadbûna kedê, tenê bi sosyalîzmê dikare pêkan be. Keda ku nirxa wê ya rastî hatiye veşartin, di kapîtalîzmê de vediguhere tiştеyê(meta) û di asteke herî jor de ji xwe hatiye biyanîkirin. Tenê sosyalîzm dikare pêşiya wê tiştekirin û biyanîkirinê bigire. Tenê wê demê kêda ku berdêla wê hatiye veşartin, dikare bigihije nirxa xwe ya rast û xwe ji biyanîbûnê rizgar bike. Bêguman ew rizgarbûn wê bi sosyalîzma reel a ku muştaqek(türev) şaristaniya dewletperest e, ne pêkan be. Ji ber ku ya di bin wê pergalê de tê jiyan kirin jî, kapîtalîzmek

dewletê ya ku li şûna kapîtalîzma taybet xwe dispêre çîneke serdest a bûrokratîk e. Ji ber wê jî sosyalîzma demokratîk, biyanîbûna kedê ya ku sosyalîzma reel hin zêdetir nepenî kiriye, dê di wateyeke rast de derbas bike.

Bi hilweşîna sosyalîzma reel, pergala kapîtalîst-mêtînger a ku piştgiriya çepgiriyê winda kiriye, ji ber ku hilweşîna xwe ya teqez veşêre û bi bizaveke nû emrê xwe dirêj bike, hewl daye ku bêdawîbûna serdestiyê ragihîne. Ketiya pêşbirka îspatkirina ku windahiya xwe vedişêre û weke ku gel winda dikin, dide diyar kirin. Jixwe pozîtîvîzm, bi hilweşîna sosyalîzma reel xistine nava pêvajoyek lêpirsînê ya bi bingeh. Bêguman bi wê lêpirsînê, şaristaniya kapîtalîst û lîberalîzma ku bîrdoziya wê ye jî, ketine nava lêpirsîneke bingehîn. Bi wê lêpirsînê re, êdî deriyên piştgiriya çep a ji mêtîngeriyê re ku aliyê eniya gel ve dihat dayîn, hatin girtin. Ruxmî wê ya pergala mêtînger, geşedanên ku hatine jiyan kirin weke îfadeya bêdawiyê û pênekarîna wê nirxandiye. Hem feraseta ku hez dikir dawiya dîrok û bîrdoziyan bîne ziman, hem jî çavkaniya ku gotegota ku dawîlêhatina serdema civak û bîrdoziyan diparast, ji wê bingehê tên.

Paradîgmaya ku Rêbertiya me ji despêka salên 1990'an de girtiye dest, li hemberî wan êrîşên modernîteya kapîtalîst di eniya sosyalîzmê de dibe bersivek. Ango li hemberî qêrînên serkeftinê yên mêtîngeriyê, tê wateya ragihandina dema gelan. Ew ragihandin tê wateya ji nû ve şîrovekirina sosyalîzma demokratîk a ku xwe ji aliyên qels, nebes-xelet ên sosyalîzma reel xelas dike û tê wateya xwe ji paradîgmaya dewletperest-deshilatperestiyê rizgarki-

rinê. Bi wî awayî, bi lêgerîna paradîgmaya nû re weke ku yên lîberal angaşt dikin; bi hilweşîna sosyalîzma reel dawiya dîrokê nehatiye, demê bîrdoziyan derbas nebûye, tê raber kirin. Xwezaya sosyalîzmê ya wekhevperest û azadîxwaz tenê bi sosyalîzma demokratîk pêk tê; gumana li ser sosyalîzmê, weke gumana li ser mirovan û pêşeroja wan e û wê ya careke din hat îspat kirin. Di aliyê din de pêvîstiya ku dîrokê weke herikîna çemeke navendî bi dest digire û xwegihandina nirxandina ku çem bi şaxên xwe yên cuda wê ya dewlemend dike jî, tê wateya derbaskirina feraseta ku dîrok bi têkoşîna xwe ya çînê(tebeqe) re hatiye nivîsandinê. Pêkhatinek ku di vedorek dîrokê de despêkiriye, piştî vedoreke din a dîrokê jî nirxandinek li gorî guncaviya xwezaya madeyê ye û teza F. Focuyama ya 'Dawiya dîrokê û mirovê dawiyê' jî çavkaniya xwe ji wê nirxandina dîrokê digire. Paradîgmaya civakî ya demokratîk, ekolojîk azadipa-rêziya zayendî ya Rêbertî, li hemberî feraseta modernîteya kapîtalîst a ku dîrokê-mirovî diqedîne û xwe weke serdesteke bê dawî radigihîne, weke projeyek pergalê teşe girtiye.

Paradîgmaya Rêbertî ya ku li ser wê bingehê pêşketiye, li dijî paradîgmaya dewletperest a hiyera-rşîk e. Bi qasî ku li dijî hiqûq, siyaset, çand, exlaq û feraseta parastinê ya kapîtalîzma ku nûnerê dawî yê paradîgmaya dewletperest e, ew qasî jî li dijî feraseta wê ya aboriyê ye. Rêbertî vesaziya wê ya ya rêxistinî jî di xweseriya demokratîk de bi pergalî kiriye, xweseriya demokratîk di nava têkiliya netewa demokratîk de girtiye dest û Xweseriya Demokratîk wiha pênase kiriye: " **Em dikarin Xweseriya Demokratîk wisa rave bikin; eger Netewa**

**Demokratîk ruhek be, Xweseriya Demokratîk jî beden e. Xweseriya Demokratîk di avakirina Netewa Demokratîk de rista goşt û nênûk dilîze, şênberbûn û bedenbûna wê ye.**” Rêber Apo hevdîtina ku di 18’ê Tîrmeha 2010’an de bi parêzerên xwe re kiriye de, taybetmendiyên vesazîbûna Xweseriya Demokratîk nirxandiye û daye diyarkirin ku şeş şaxên wê vesaziyê hene. Ew şax wisa ne: Şaxa siyasî, şaxa hiqûqî, şaxa aborî, şaxa çandî, şaxa xweparastinê û şaxa dîplomasiyê.

Em ê di vê nivîsa xwe de hewl bidin ku şaxa aboriyê ya xweseriya demokratîk rave bikin. Xweseriya Demokratîk ji pergala mêtînger a kapîtalîst re pergalek înşayê ya alternatîf e. Lewma di şaxa aboriyê ya Xweseriya Demokratîk de, em ê hêmanên esasî yên pergalê bigirin dest. Em ê hewl bidin ku bi xetên bingehîn be jî mantiqa pergalê, aliyên wê yên ku ji modernîteya kapîtalîst cuda dibin û esasên pêkanîna wê binirxînin.

## Di Xweseriya Demokratîk De Milkiyeta Taybet

Milkiyeta taybet ne tenê li ser modernîteya kapîtalîst, di dîrokê de heya roja me ya îro li ser civaka çînî-dewletperestî teşe girtiye û rista xwe ya xîmê esasî listî ye. Taybetmendiya bingeh a civaka xwezayî, ji avabûnek giştî ya kolektîfiya wê tê. Hilberîna zêde ya ku hatiye bidestxistin jî, tenê li ser bingehê bikaranîna hevpar a civakê hatiye birandox-kirin(tüketme). Di wê bikaranînê de têkiliyek milkiyet û tebeqebûnek ku xwe dispêrin serdestiyê, nîne.

Eger di civaka xwezayî de qala milkiyeta taybet were kirin, tenê milkiyeta civatê dikare hebe. Di serî

de şertên xwezayî di nav de, hilberîna zêde ya ku li hemberî rewşên ji derveyî vînê pêşdikevin, bi tu awayî ji ber teserûfa kesan vekirî nebûye. Ew rewşa ku îktîsada modern weke 'fon' an jî 'stok' dinirxîne, nêzîkbûna milkiyetê ya civaka xwezayî nîşanî me dide. Weke tê zanîn di wê serdemê de, di jiyana civakî de exlaq hêza dankirinê ya esasî ye û ya ku civakê li ser lingan digire jî wê ya ye. Wijdana ku di nava sînorên exlaq de teşe digire, destûr nade ku milkiyeta civakî bikeve bin teserûfa kesayetî. Piştî rewşa dewletbûn, tebeqebûn, bidestxistin û bikaranîna milkiyetê ya kesayetî, milkiyetê çawaniya xwe ya gelemperî winda kir, xisletek(karakter) taybet bidest xist û bi hiqûqê hat parastin.

Di nava vesaziya hiqûqî de tê gotin ku zagonên herî kevin Hamûrabî,(qralê yekem ê Babîlê BZ.1793-1750) an jî hin pêştir zagonên Urnamu(qanûnên herî kevn ên Sûmeran BZ. 2100-2050) ne. Aşkere ye ku di nava zagonên nivîskî yên herî kevn de ku heya roja me ya îro hatine, ew zagon in. Nêzîkbûnên bingehîn ên wan zagonan ku dîroka xwe heya çar-pênc hezar sal beriya niha diçe, milkiyetê diparêzin. Gava mirov li zagonên Hamûrabî dinêre ku bi awayeke herî saxlem heya roja me ya îro hatine, wê were dîtin ku esasê zagonan parastina milkiyetê ye. Di tevahiya zagonên ku piştî wê ya hatine çêkirin de jî, bi heman nêzîkbûnê tevgeriyane. Di tebeqebûn û dewletbûnê de milkiyet pîroz e. Her tişt dikare were kirin, lê bi tu awayî dest li milkiyetê nayê dayîn. Di wan zagonan de pirsên weke milkiyet çi ye, çawa hatiye avakirin, xwediyên wê danehevê kî ye an jî kî ne, bi tu awayî nayên pirsîn û bersiva wan nayê dayîn.

Karl Marks dibêje; polîtîka aboriyê bi kirûya(diyarok) milkiyeta taybet derdikeve rê, lê milkiyeta taybet çi ye, ji me re venekiriye. Polîtîkaya aboriyê, bi rastî jî pêvajoya ku milkiyeta taybet dişopîne tîne ziman û di wê ya de jî, ji xwe re formûlên razber û giştî yên ku di nirxê zagonan de ne, ava dike. Ew formûl bi qasî avabûna milkiyeta taybet, mezinkirin û parastinê wê jî digire nava xwe. Ew formûlên ku polîtîkaya aboriyê di nirxê zagon de ava kiriye, lêkolîna pêvajoya avabûna kedê û çawaniya civakî ya kedê nake û mafê bikaranîna wê ya di destê kî de ye, nade xuya kirin. Milkiyeta taybet her çi qasî keda civakî û dîrokî bigire nava xwe jî, mijara esasî ya polîtîka aborî li ser disekine, çawaniya takekesî ya bidestxistina milk e. Çawa ku nêzîkbûna aborînasên herî kevn ew e, di nêzîkbûna hevpar a kesên polîtîka aborî ya modernîteya kapîtalîst dikin de jî ew çerçove heye.

Milkiyeta taybet a ku destjênedana wê bi zagonan tê parastin, pîroziya wê îfade nake. Her çi qasî pirtûka pîroz ‘ diziyê nekin’ emr bike jî, ew emir îfadeya xwedîderketina giştî ya bêkediyê nake. Qesta ku dibêje diziyê nekin, ji xeynî pêkhatina destjênedana milkiyeta taybet vêdetir tişteke din nîne. Eger tişka ku divê dest jê neyê dayîn weke emrê xwedê hatibe ziman,  tişta herî qirêj ji qirêja xwe paqij dibe, tişta herî xerab tê jî pîroz kirin. Bi wê nêzîkbûna ku çi di pirtûkên pîroz de cih digire, çi bi danekirinên hiqûqî yên di zagonên Hamûrabî de cih digire bikeve bin parastinê jî, di esasê xwe de çawaniyek taybet a milkiyetê ku‘çavkaniya tevahiya xerabiyan’ rave dike ye.  Milkiyeta taybet ne pîroz e, dizî ye.

Pêşketina madî ya milkiyeta taybet bûye sedemê despêkirina pêvajoyek ku zilam xwe xwediyê jinê dibîne û kes jî xwe xwediyî ked û erdî dibîne. Serdestiya zilam a li ser jinê, xwe xwedîdîtina mirovekî ya zêdeka keda mirovekî din û wê ya ji wî/wê sitandin, bi heman awayî xwedîderketina li erdî, bi tu awayî di nava têkiliyên komunal ên demokratîk de rewa nayê dîtin. Civaka xwezayî, bidestxistina milk a ku me weke taybetmendiyên li jor dane diyarkirin nasnake. Ji ber wê ya milkiyeta taybet bi pêkhatina xwe ya ku serdestî û hiyerarşiyê derdixîne holê, diziyê rave dike. Tu rûpoşeke olî jî nikare wê diziyê ji holê rake. *Jean Baptîste Sayî*(di serdema şoreşa Fransa de aborînasek e) tiştên ku ji bo milkiyeta taybet a erd gotine, ji bo tevahiya cureyên din ên milkiyetên taybet jî derbasdar in. Say, bi nirxandina xwe ya ku dibêje; ***"Mafê xwediyê erd, koka xwe ji şelandinê digire"*** nîşanî me dide ku milkiyeta taybet a li ser amûrên hilberandinê(di serî de mirov û erd di nav de) dizî ye.

Hem têkoşîna çînî ya ku Marksî li ser pênaseya dîrokê daye rûnişkandin, hem jî şer çavkaniya xwe ji milkiyeta taybet a ku ji cewherê xwe yê civaka xwezayî dûr ketiye digire. Li gorî wê jî milkiyeta takekesî ya amûrên hilberandinê; dibe sedemê bingehîn ê ku civakê dabeşî çînên cuda dike û jinê jî weke zayendî bixe bin serweriyê. Bêguman kolekirina mirovan îfadeya herî şênber a cudabûnê ye ku di civakê de bûye sedemê çawaniyek taybet a bidesxistina milk. Di aliyê din de milkbûneke wisa bûye hinceteke herî sereke ya lêgerîna mirovan a civaka xwezayî û di wê hêlê de têkoşînkirinê. Ji bo wê jî lêgerînên azadiyê yên di dîrokê de pêşketine, her

tim bi hinceta ku milkiyeta taybet li ser amûrên hilberîna rakin, tevgeriyane. Di têkoşîna çînan a di du sed salên dawî hatine jiyan kirin de jî, li hemberî wê rewşa milkiyeta taybet pêşketiye.

Modernîteya kapîtalîst, weke encama vesaziyên ku xwe dispêre sêlibiya dewlet-bajar-çîn, bûye pergalek ku wê çawaniya milkiyetê herî zêde diparêze û pêş bixe ye. Tebeqe an jî çînên bingehîn ên wê pergalê, ku bixwe bi tu awayî di nava aboriyê de nînin, rêgez û qanûnên aborî yên ku berjewediya wan îfade dike, li ser civakê ferz dikin. Li beranberî wê ji ber ku civak mehkûmê jiyankirina wan rêgezan bibe, tevahiya mekanîzmayên dewletê di asta herî jor de tên bikaranîn. Mirovahî ne mecbûrê pergalek wisa ya ku bi hiyerarşiya mîrateya zilamê kone(qurnaz)-nêçîrvan hatiye avakirin. Pergalek wisa heya roja me hatiye û her tiştê wê xwe dispêre serdestî, kolekirin, pêkûtî û zordariya ku her tiştî weke tişyetê(meta) dike mijara kirîn-firotinê.

Ji ber ku civak ne mecbûrê wê ya ye jî, pêwîst e ku bi Xweseriya Demokratîk pergala xwe ya aboriyê ava bike. Lewma nêzîkbûna Xweseriya Demokratîk a di derbarê milkiyeta taybet de girîng e. Xweseriya Demokratîk, weke kapîtalîzma ku milkiyeta taybet weke dilê pergalê dibîne, nagire dest. Ji ber ku pergalek aboriyê ya ku derfetê li ber her cure yekdestîkirinê vedike û milkiyeta taybet dike xwedê, tu çawaniyeke xwe ya mirovahî nîne. Di aliyê din de jî weke ku di mînaka sosyalîzma reel de hatiye dîtin, nêzîkbûnên dewletperest ên ku li ber çavan her cure milkiyeta taybet red dikin jî, rê li ber dîrokê venekirine. Her çi qasî weke çare bi milkiyeta taybet a amûrên hilberandinê, milkiyeta taybet a amûrên

birandoxiyê(tüketim) ji hev du hatibin cudakirin jî, nekarîne pêşiyê li pêşketina nakokî û pevçûnên civakî bigirin. Çawa ku weke tevdayî redkirin nebûye çareserî, bi xwedîderketinê jî çareserî pêşneketiye. A ku hatiye ceribandin nûkirin e û ew jî ji xeynî windakirina dem û kedê vêdetir tişteke din nîne. Wê gavê ya ku were kirin; sazkirina formûlasyoneke rast e. Di nêzîkbûna Xweseriya Demokratîk a di derbarê milkiyeta taybet de naskirina hebûna milkiyeta taybet hebe jî, xwe ji pêkanên teşwîqkirin û heweskirinê wê parastin esas e, her wiha milkiyeta taybet a ku yekdestîkirinê digire nava xwe red kirin û li dijî wê ya sekinîn esas e.

Ne rast e ku mirov milkiyeta taybet bi temamî red bike. Ew di dîrokê de jî hatiye peytandin. Ne gengaz e wê ya di şert û mercên dîrokî yên heyî de bê rakirin. Lê, li hemberî vesaziya yekdestiya milkiyeta taybet a kara berztirîn(ezamî) an jî feraseta ku li ser wê ya teşe digire sekinîn, hem rast e hem jî pêkan e. Bêguman wê ya tenê bi riya zagonên antî-yekdest pêkanîn ne gengaz e. Li ser sihaya hilberîn û mezaxiyê(tüketim) ku du qadên bingehîn ên aboriyê ne, divê destûr ji vesaziyek ku li ser kara yekdestiyê pêş dikeve neyê dayîn. Li gel milkiyeta taybet di rewşeke ku aboriya gel(civat an jî grup) serwer be de, yekdestîbûn şansê ku zêde jiyan bike nîne. Li cihên ku aboriyên yekdestîperest pêşketiye de, bûne cihên ku aboriya gel nikare lê hebe, lewma bûne cihên ku piyasa(bazar) bi tevahî bikeve bin kontrola yekdestan. Li ser wê bingehê be jî, êdî kifş dibe ku milkiyeta taybet ti girêdanbûneke xwe bi aboriyê re nîne. Milkiyeta grup an jî milkiyeta civakî, dikare bibe

nêzîkbûneke bingeh a çareseriya pirsgirêkên ku ji ber milkiyetê derketine holê.

Qesta me ya aborî an jî milkiyeta grup û civatê; aborî an jî milkiyetek e ku yekdestiyê nake armanc, kara ezamî esas nagire, kontrolê di destê xwe de digire, bi hilberînê re di nava pêwendiyê de ye, têrîbûna xwe esas digire, ji ber ku li ser pêwîstiyên civakî pêk tê, nirxê bikaranînê esas digire. Jixwe vesaziyeke wisa ya milkiyetê ti taybetmendiyeke xwe ya zêde namîne. Bi wî awayî aboriyên taybet ku li cem aboriyên gel hebûna xwe hene, di şirketên taybet de, pêkanên ku pergala aboriyê ya kapîtalîst pêk tînan wê pêk neyîne, ger bixwaze jî wê nikaribe karê yekdestiyê pêk bîne û rê li ber yekdestîbûnê veke. Feraseta Xweseriya Demokratîk a di wir de; amûr a kesên ku wan bikartîne ye, lewma hilberîna ku derdikeve holê jî ya xuliqkeran e, ya xwediyê kedê ye. Milkiyeta ku di bin serweriya hevpar a grup an jî civatê de ye, amûrên hilberînê wê rê li ber serweriya beşeke ji civakê veneke û wê ber bi kara yekdest beralî nebe. Sazî û vesaziyên din ên şaxa aboriyê yên pergala demokratîk jî, wê li hemberî xwesteka yekdestîbûnê ya milkiyeta taybet rista subaba ewlehiyê bilîzin. Pergala yekdestîperest a modernîteya kapîtalîst, tenê bi nêzîkbûnên aboriyî yên ku xwe dispêrên aboriya gel dikarin bên sînorkirin. Tiştên ku Rêbertiyê di derbarê aboriyê de dane diyarkirin, sînordarkirina kapîtalîzmê jî rave dike: ***“Em nikarin weke pergala aboriyê kapîtalîzmê qebûl bikin. Dibe ku em tam nikaribin kapîtalîzmê ji holê rakin, lê em dikarin di asteke girîng de pergala kapîtalîzm biguherin, wê bimehînin û dikarin pergala xwe ya aboriyê ava bikin. Di wê***

***pergalê de aboriya gel heye, beşek wê jî aboriya taybet ava dike. Ango şirket hene."***

Pergala mêtînger a kapîtalîst tenê bi riya milkiyeta taybet li dijî civakê dernakeve. Kara yekdestiyê tişta ku nekiriye armanc û xerab nekiriye nemaye. Pêwîst e ku xweseriya demokratîk di mijarên weke xerabûna hevsengiya ekolojîk, gemarbûna hawirdor, bêkariya ku weke reniyekî(aşût) mezin dibe, hilberîna ku bê armanc zêde dibe, hilberîna çandiniyê ya ku tenduristiya civakê tune dihesibîne, birandoxiya (mezaxî) zêde, ji hilberandina çandiniyê rev û hwd. de, nêzîkbûnên aboriyî yên alternatîf pêş bixe. A ku bi aboriya gel re tê armac kirin jî, di rastiya xwe de ew aborî û hilberandina alternatîf e.

## Parastina Hawirnasiyê(ekolojî) û Teknîka Bi Xwezayê Re Lihevhatî

Yek jî pirsgirêka herî girîng a roja me ya îro, bêguman pirsgirêka ekolojiyê ye. Pergala kapîtalîst, bi taybetmendiya xwe ya kara ezamî ku her tiştî dike tişte(meta), çi qasî zerarê dide xweza û binyata civakê qet hesab nake. A rast bi şixulandina teknîkê ruxmî ku di zanebûna xerabkirina hevsengiya ekolojîk a civakî û xwezayê de ye jî, xwe ji şixulandina wê teknîkê paş naxe. Mînak; nekariye pêşiya qulbûna tebeqeya ozon a ku di dinyayê de bandora xeza(gaz) sera çêdike, bigire. Dewletên ku herî zêde wan xezan dihilberînin, nebûne aliyekî peymanên ku pêşketina wan xezan sînordar û asteng dikin. Wekî tê zanîn bandora wan xezan a sera ji dinyayê re hene. Lewma bi taybetî dewlet û şîrket bihêle astengkirina bikaranîna sotemeniyên karbon ên ku ber bi atmosferê tên berdan û weke baranên asît dîsa vedigerin xwezayê, ji

ber ku zêdetir bikar bînin di nava pêşbirkekî de ne. Di encama bikaranîna teknolojiya nukleer, ceribandina çekên atomî û qezayên santralên nukleerî de tên jiyan kirin, dinyaya me veguheriye sergovekî(çop). Di encama jiberaderketinên radyoaktîf de ku di asta jor de bûne sedemên zêdebûna nexweşiyên peçeşêrê, bi armanca zêde bikaranînê ew teknolojiya bi xeter û gemar hîn jî tê bikaranîn. Dîsa bi armanca bidestxistina hilberînê, xurekên hormonî yên tên hilberandin, ruxmî ku tenduristiya civakê tehdît dikin, pêşî lê nayê girtin û wê ya jî feraseta ku hem di pîşesazî(senayî), hem jî çandiniyê de dibe sedemê xerabûna hevsengiya ekolojîk. Tevahiya wan teknolojiyên ku tên bikaranîn, hevsengiya ekolojîk bi teqezî xerab dikin. Tunebûna sedan, hezaran cureyan, rasterast bi bikaranîna wan teknolojiyan ve girêdayî ye. Li hemberî bikaranîna GDO'yan(Organîzmayên ku genetîka wan hatiye guherîn) feraseta hilberîna zêde karkirinê esas digire û li hemberî teknîkên hilberandinê yên ku pençeşêriyê çêdikin û gefên mezin li ser tenduristiya civakê dikin û bi bastûra mirovî dilîzin, astengiyeke cidî nayê dîtin. Ji ber ku pergal GDO'yan zêdetir hilberînê bi dest dixe. Bi riya hilberînên ku tên bidestxistin, tenduristiya civakê tê xerabkirin. Wekî din; bi armanca ku serweriya li ser fiyatê winda neke û fiyatê kontrol bike, bi berdêl û kedeke zêde bi tonan hilberîn tê tunekirin. Ew, di dinyayekî ku her sal bi milyonan mirov bi birçîbûnê dimirin de tê kirin.

Ji ber ku nêzîkbûn û feraseteke Xweseriya Demokratîk a karê ezamî pêk bîne nîne, ne alîgirê bikaranîna wan cure teknolojiyên ku zerarê didin xweza û civakê ye. Bikaranîna teknolojiyên ku xwezayê diparêzin û li beranberî hevsengiyên ekolojîk

bi baldar in, esas digire. Li hemberî nukleeriya ku hawirdorê gemar dike, dibe sedema tunebûna cureyan û qirêjiya radyoaktîf çêdike, derdikeve û bi heman awayî li dijî bikaranîna sotemeniyên fosîl ên ku qirêjiya hewa çêdikin, disekine û bikaranîna sotemeniyên hîn paqijtir esas digire. Bi armanca zêdetir ber û hilberînê, qirêjkirina hawirdoriyê û xerabkirina xwezayê qebûl nake. Di mercên Xweseriya Demokratîk de ji ber ku derfet û teknîka heyî ji bo berjewendiya civakê were bikaranîn, hem tevahiya pêdiviyên civakê pêk tîne, hem jî zerarê nade xwezayê. Sereraskirina rûxandinên xwezayê yên ku di encama bikaranîna teknîk û hilberîna çewt a ku pergala kapîtalîst bi armanca kara ezamî derketiye holê, esas digire. Herî kêm dizane ku dikare beşek ji wê rûxandinê ji holê rake. Dîsa dikare bi milyonan mirovên ku her sal ji ber ji birçîbûnê dimirin, rizgar bike.

Angaşta ku dibêje; 'xweza nikare pêwîstiyên mirovan pêşwazî bike' ne rast e. Bêguman ji bo têrkirina civaka birandox a ku pergala kapîtalîzmê xuliqandiye ne dinyayek, deh gerstêrk jî têre nakin. Birandoxiya(tüketim) ji derveyî pêwîstiyê, ji nîviyê zêdetir a birandoxiya roja me ya îro derbas dike. Bi heman awayî ji nîvê zêdetir a hilberandinê jî, ber bi tiştên ne pêwîst ve beralî bûye. A ku xwezayê dixe zorê ne hilberandina ku pêwîstiya mirovan pêşwazî dike ye, berovajiya wê hilberandin û mezaxiya ji derveyî pêwîstiyê ye. Ji ber wê ya ye ku di aliyekî de heyberên weke çiyayekî komî ser hev dibin lê nayên birandoxkirin(mezaxkirin), di aliyê din de jî ji ber nepeydakirina xwarinê her sal mirina milyon kesan weke rastiyekî li ber çavan e. Bi esasî ya ku hevsen-

giya xwezayê xerab dike ew nêzîkbûn e û ew jî çavkaniya xwe ji kara kapîtalîst digire.

Di Xweseriya Demokratîk de hilberîna li gorî tenduristiya civakê esas e. Li şûna GDO'yên ku weke adanên(xûrek) bi hormon tên derbirandin, çandiniya bi organîk teşwîq dike û pêş dixe. Di çandiniyê de li şûna bikaranîna kîmyewiyên giran ên ku dibin sedema kuştina erd, polîtîkayek çandiniyê ya ku erdî bi hêz dike, esas digire. Çandiniya organîk hem şêwazeke çandiniyê ya bi xwezayê re dost e û erdî diparêze, hem jî ji bo tenduristiya civakê hilberîna herî guncav e. Bi bikaranîna teknîka ku bi xwezayê re dost e; hem di pîşesaziyê(senayî) de, hem jî di çandiniyê de hilberandineke ku pêdiviyên civakî pêşwazî dike, esas digire. Ji ber ku di feraseta hilberandinê ya Xweseriya Demokratîk de pêkanîna kara ezamî nîne, gumana xerabkirina xwezayê û xerabkirina tenduristiya mirovan nîne.

Weke xwezayî bazar jî dê nirxa bikaranînê esas bigire.

## Girîngdayîna Çandiniyê

Çavkaniya esasî ya ku mirovahiyê têr dike çandinî ye. Bi hezaran salan mirovahiyê bi çandiniyê debara xwe kiriye. Bi erdî re di nava hev de bûye û bi tiştên li ser erdî çêbûne jiyana xwe berdevam kiriye. Danehev û zêdeka civakî ya yekemîn jî di çandiniye de pêk hatiye. Mirov dikare bêje ku; çavkaniya tevahiya dewlemendiyan jî di esasê xwe de çandinî ye ango em bi pênaseyeke hin berfirehtir binirxînin, erd e. Erd û çandinî şertên hebûnê ne. Her çi qasî îro mirovî îmajek weke ku 'dikare bê çandinî û erd were

jiyankirin' pêşxistibe jî, mirov nikare mirovahî û dinyayek bê erd û çandinî bifikire.

Çandinî îro di plana duyemîn a hilberandinê de cihê xwe digire. Hilbrerandina senayî bûye sereke. Beşek pir mezin a gelheyê(nifûs) derbasî navendên hilberandina senayî bûne û deverên gundewar hatine valakirin. Bi taybet di welatên senayî û pêşketî de, tenê rêjeyeke gelheyê ya %8-10 di hilberandina çandiniyê de cihê xwe digire. Lewma jiyana gundewariyê qedr û qîmeta xwe winda kiriye. Qadên ku gelhe lê zêde dibe, bajarên ku hilberandina senayî pêş dikeve ne. Jiyana dilniwaz(cazîb) a ku xwe dispêre reklamê, bûye sedemê ku mirov ji erdî qut bibin û berê xwe bidin bajaran. Kesên ku berê xwe dana bajaran jî, qet nebûne xwediyê jiyana dilniwaz a ku xwe dispêre reklamê. Di malên teng ên weke kolikan de jiyan kirin, bi nexweşiyên bajarî yên li ser hev rû bi rû mayîn, bêkarî û birçîbûn jî bûne para wan kesên ku berê xwe dana bajaran.

Mirov dikare bêje ku çandinî di rewşa mirî de ye. Çandiniya ku heye jî ne organîk e, teşeyeke çandiniyê ya ku xwe dispêre bikaranîna kîmyewiyên zêde û bi zerar e, jixwe ew jî dibe sedema xerabkirina xwezayê. Bêguman ew rewş wê zêdetir zerarê bide xwezayê.

Ji ber wê ya pêşxistin û teşwîqkirina çandiniya organîk, di Xweseriya Demokratîk de nêzîkbûna bingehîn a çandiniyê ye. Kurdistan bi erdên xwe yên pir berfireh ji bo çandiniyê gelek guncav e. Gelek ji wan erdan hîn jî ber bi çandiniyê venebûne, erdên ku li ber çandiniyê vebûne jî, di encama bikaranîna kîmyewiyên bi zerar, mirov dikare bêje ku bi giştî mirin e. Bi armanca hilberandina zêde pêkanîna

çandiniya bi av û wê ya jî bi kîmyewiyên zerar pêkanîn, bûye sedem ku erdên gelek berfireh bejî(bêwec) bibin. Bi wê ya mirov dikare bêje ku qadên çolistan çêbûne û ji ber çandiniya bêzanebûn, hema bêje erd di rewşa mirinê de ne.

Kurdistan xwediyê erdên mezin ên ji bo çandiniyê guncav in. Piraniya wan erdan ber bi çandiniyê venebûne, lewma di Kurdistanê de bêkarî û birçîbûn pirsgirêkek gelek cidî ye. Bêguman wê ya bi yekser ji polîtîkayên dewletê yên valakirina Kurdistanê ve girêdayî ye. Ji ber ku erdên Kurdistanê di asta herî jor de hilberîner in, tenê bi wan polîtîkayên serwext dikarin di Kurdistanê de birçîbûn û bêkariyê pêşbixin. Eger deştên Kurdistanê yên tên zanîn tenê bi polîtîkayek cidî ya çandiniyê werin çandin, bêhêle birçîbûnê; dikare pê re gelheyeke bi mîlyonan têr bike. Di heman demê de ji bo nêxweşiya kapîtalîzmê ya weke bêkarî tê binavkirin jî çare peyda dibe û mîlyonan kesên bêkar dibin xwediyê kar.

Çandiniya organîk tenê xizmetê ji parastina erd, pêşîgirtina qirêjiya hawirdorê, parastina hevsengiya ekolojîk nake, di heman demê de xizmetê parastina tenduristiya civakê jî dike. Adanên(xûrek) bi hormon li ser jiyan û fîzyolojiya mirovan xerabiyeke çi qasî mezin çêdike û çawa rê li ber pêşketina nexweşiyên nû vedike, di encama lêkolînan de derketiye holê. Çandiniya organîk, nexweşiyên ku bi adanên hormon derketine holê derbas dike. Avabûna civakek bi tendurist û adanên paqij, tenê bi wê feraseta cuda ya çandiniyê pêkan e.

Xweseriya Demokratîk li dijî wê pêşketina ku di çandiniyê de pêktê ye. Girîngiyê dide pêşxistina

çandiniyê û teşwîq dike. Piştgiriya pêşxistina çandiniya organîk a ku li dijî bikaranîna kîmyewiyên bi zerar û hilberandina adanên bi hormon e dike. Çandiniya ku di çerçoveya hevsengiya ekolojîk de tê kirin, esas digire. Bi pêşxistina çandiniyê; dê ji beşeke girîng a gelheya bêkar ku encameke pergala kapîtalîst e, çare were dîtin û dê qadên fireh ên derfetên kar ava bibin. Bajar jî dê ji gelheya ku li ser hev kom bûye rizgar bibe û wê bigihije asteke ku dikare lê were jiyan kirin. Xweseriya Demokratîk hewl dide ku di wê çerçovê de hevsengiyekî di navbera çandinî û senayî, gundewarî û bajaran de ava bike.

## Pergaleke Ku Derfetên Kar Zêde Dike û Bêkariyê Ji Holê Radike

Di Kurdistanê beşeke mezin a gelheyê bêkar e. Qadên ku kar lê were kirin hema bêje nemane. Di aliyê senayiyê de xebateke cidî nehatiye pêşxistin, di çandiniyê de jî qadên berfireh ji çandiniyê re nahitine vekirin, an jî ji ber ku erdên mezin di milkiyeta şexşan de ne, piraniya gelheyê di rewşa bêkariyê de ye. Daneyên fermî radigihînin ku li Kurdistanê rêjeya bêkariyê %20 e, lê ew rêje gelek ji rastiyê dûr e. Daneyên fermî li gorî serlêdanên saziya peydakirina kar û karkeran hatine dayîn, jixwe ew jî rastiyê îfade nake. Jinên ku nîva gelheyê pêk tînin ji derveyî wê daneyê ne. Eger daneyên rast werin dayîn, mirov dikare bêje ku li Kurdistanê ji %50 zêdetir gelhe bêkar e.

Bêkarî, gelemperî berhemeke kapîtalîzmê ye. Kesên ku amûrên hilberandinê di milkiyeta xwe ya taybet de digirin, armanca wan ew e ku serdestiyeke tam li ser hêza kar ava bikin, lewma weke rêbaz

artêşa bêkaran pêş dixin. Aliyên sermayedar, artêşa bêkaran a îhtiyed weke amûrekî bikartînin û bi buhayê ku hez dikin karkeran neçarî xebatê dikin. Amûra pêkanîna kara ezamî ya li ser heqdestiyê ye. Rêbazeke sereke ya bi birçîbûnê terbiyekirina civakê ye.

Di pergaleke aborî de mijareke weke bêkarî nîne. Tu giyanewerek bêkar nîne, di xwezayê de rewşeke wisa nayê pejirandin. Rêbertî di wê mijarê de nirxandinên gelek berfireh kirine. Rêbertî dide diyarkirin ku; di xwezayê de tu giyanewer namîne bêkar, moriyek jî ne bêkar e. Civak jî wisa nin. Dîsa Rêbertî dide diyarkirin ku; Fîravunek ne bêkar e û karê her koleyekî jî heye. Weke ku xweza jî mirovê bêkar qebûl nake, mirovê ku heybereke herî pêşketiye çawa dibe bêkar dibmîne? Ew dahêneke(îcad) pergala kapîtalîst e.

Di Kurdistanê de ew çeka bêkariyê gelek bi berfireh tê bikaranîn. Bêkarî, di erdên welat de weke amûreke çokdanînê bi salane tê şixulandin. Ruxmî ku erdên bi bereket ên ku her kesek dikare li ser bibe xwediyê kar-hêz hene, bêkarî ji nîvê zêdetir gelhe xistiye nava pencên xwe. Kesên ku li ser erdên xwe dibin xwediyê kar, xwe weke keseke bi şaş dibînin. Kesên ku kar peyda nakin jî, yan weke karkerên demsalî, yan jî weke pale diçin deverên cuda yên Tirkiyê û şerê têkoşîna jiyanê didin. Beşeke girîng a gelheya Kurd jî bi temamî ji axa ku hatiye dinyayê qut dibe, weke koçberên dildar an li Tirkiyê an jî li Ewropayê bi cih dibin û jiyan dikin. Şewqa li despêka tunelê weke jiyanê pêşkêş dikin û civaka me bi riya bêkariyê ji pariyeke nan ve tê girêdan. Bi wî awayî bi

çeka bêkarî û birçîbûnê Kurd ji her cure komkujiyan re rû bi rû tê hiştin.

Xweseriya Demokratîk weke nêzîkbûneke bingehîn dixweze ku her kesek bibe xwediyê kar. Xweseriya Demokratîk bêkariyê weke ku girêdana xwe bi tunebûna derfetên kar re heye nagire dest, wê ya weke polîtîkayeke bi zanebûn digire dest û di heman demê de weke sedemeke bîrdoziyî ya wê ya dinirxîne. Di serî de çandinî di nav de bi terzeke herî hilberîner bikaranîna derfetên hilberandinê û li ser wê esasê bilindkirina îstihdamê esas digire. Weke ku me li jor daye diyar kirin; ew erdên ku li ber hilberandinê ve venebûne li ber hilberandinê ve vekirin, pêşxistina çandiniya organîk, li ser bingehê ji nû ve sazkirina hevsengiya ekolojîk çandina daran, hwd. dikare pêkanên afirîner ên ku hem hilberandinê zêde dike, hem jî îstihdamê ava dike bên pêşxistin. Çandinî di wê mijarê de derfetên girîng pêşkêş dike. Dîsa pêwîst bike bi sereraskirina ku di saetên xebatê de tên kirin, derfetên îstihdamê dikare werin zêdekirin. Lewma Xweseriya Demokratîk modeleke ku bêkariyê ji holê radike û îstihdamê zêde dike.

## Kooperatîfên Hilberandin-Mezaxtinê

Aboriya gel, an dê aboriya şîrketên taybet teng bike, sînordar bike û rêjeya wan a kar daxîne asta herî jêr, an jî neçar e ku saziyên aboriyî yên ku wan teşwîqê wê ya dike, pêş bixe. Di pergala kapîtalîst de tevahiya mekanîzmayên ji hilberandin heya mezaxtinê li ser feraseta kar hatine sazkirin. Çi di senayiyê de, çi jî di çandiniyê de her tişt gelek li ser buhayê xwe digihije mirovan. Kesên ku rasterast di nava hilberandinê de ne, ti caran heqê keda xwe

nagirin, bi taybetî jî kesên ku di çandiniyê de dixebitin û hilberandinê dikin, tên neçar kirin ku berhemên beranberî keda xwe, bi buhayeke gelek jêr ji destê xwe derxînin. Di aliyên din de saziyên navbeynkar û ticar ku di tu pêvajoyên hilberandinê de cihê xwe nagirin, qezenceke herî bilind bi dest dixin. Ne hilberîner dikarin keda tiştên ku dihilberîne bigirin, ne jî mezaxker dikarin bibin xwediyê buhayek ku beranberî madeyên pêwîst tê. Hilberîner weke beranberî keda xwe ya salakê ji berhemê yek zêde dikare bigire, ticarê ku erka barkirinê daye li ser xwe, beranberî yekê deh qezenc dike. Ew rewş dibe sedem ku hem hilberîner hem jî mezaxker winda bikin, ên ku di esas de qezanc dikin kes û saziyên navbeynkar û ticar in ku ti eleqeyeke wan bi aboriyê re nîne.

Du qadên bingeh ên aboriyê hene. Ew jî qadên hilberîn û mezaxtinê ne. Di rewşa ku serweriyek tam a li ser wan her du qadan de, aborî bi temanî dikeve bin kontrolê. Ya ku yekdest hez dikin bikin jî, avakirina serweriyê ya li ser wan her du qadên aboriyê ye. Li ser wê bingehê xwegihandina kara ezamî ji bo yekdestan dikare pêkan be. Angaşta ku dibêje aboriya lîberal bi riya piyaseya erz-telep hevsengiya xwe saz dike, buhayan di nava wan hevsengiyan de ango di nava hevbandorkirina beranberî hev a erz û telep de ava dike, ne rast e. Buhayê metayan(tişteyan) li gorî xwestekên yekdestên ku wan her du qadên hilberandinê di bin serweriya xwe de digirin pêk tê. Ya ku em hez dikin bêjin; ne heqdestiya karkeran, ne jî buhayên metayan di nava hevsengiya erz û telep de ava dibe. Em baş dizanin ku di erz û telep de her tişt dikare were ava kirin. Yekdestên ku her du qadên aboriyê di destê xwe de digirin, bi qasî erz telepê jî

kontrol dikin, her wiha bi qasî xwestekên metayê derdixin piyasê û bi wî awayî asta telep ango ya buhayan didin xuya kirin. Pêkhatina di heqdestiyê de jî heman rê tê şopandin. Yek ji derewa herî mezin a ku pergala mêtînger a kapîtalîst dixwaze bi civakê bide qebûlkirin; avakirina hevsengiya xwe ya piyaseyê û teşebûna buha(ucret) û heqdestiyê(mize) ya di nava wê hevsengiyê de ye. Wê ya bi armanceke veşartina zivirandin çerxa mêtîngeriyê ye. her wiha rastiyeke din a ku were zanîn çi heqdestî, çi jî buha bi xwestaka yekdestiyê ava dibin ne. Ango xwesteka ticar û gotinên ku ji nava lêvên wî derdikevin, ji hêza piyaseyê zêdetir bandortir e. Bêguman barê wê ya bi esasî kedkarên hilberîner û mezaxker radikin. Divê ew xeleka navber, ticar ji navberê were derxistin. Wê ya jî bi riya kooperatîfên hilberandin û mezaxtinê dikare pêk were.

Rêxistinbûna kooperatîfan çawa ku di qada hilberandinê de dikare pêk bê, di qada mezaxtinê de jî dikare pêk were. Pêkhatinên weke grup, gund, tax û hwd. di asta ku kooperatîfbûna xwe ava dikin de, bi hevparbûnên biçûk be jî dikarin sermayeya ku komî ser hev dibe, ber bi hilberandinê ve bibin. Ne tenê pevgihandina sermayeya diravî(pere), bi pevgihandina amûrên hilberandinê yên di dest de jî dikarin ber bi hilberandinê ve herin, bibin sedemê zêdekirina hilberandinê û kêmkirina lêçûyînan. Bi bikaranîna sermaye û keda ku digihije hev, ew dê bibe cudahiyeke cidî ya bikaranîna cuda cuda ya heman sermaye û kedê. Dîsa tespîtkirina qada hilberandinê ya pêkhateyên kooperatifê, diyarkirina hecma (qeware) hilberandinê gava ku ji piyasê re tê pêşkêşkirin, venêrana ku li ser buhayan tê kirin û

hewldanên ku dixwaze heqê keda xwe bigire, wê sûdeke hin zêdetir a hilberandina ku hilberîner jê hez dikin pêş bixin, pêk bîne û ew sûd wê tevlî berhema hilberandine bibe û wê bibe sedamê qezenceke hin zêdetir.

Kooperatîf çawa ku di dezgehên biçûk û navîn de dikare pêk were, di qada gundewarî, çandinî û sewaldariyê de jî dikare pêk were. Mînak em gundekî bigirin dest. Ger gundek bibe kooperatîf û di mijarên weke dê çandiniyeke çawa were kirin, wê li ser kîjan esasî sûdê ji sewalan were girtin, fêkî wê çawa werin nirxandin de dibin xwedî biryar û wî çaxî bi hev re tevdigerin. Dikarin bi awayeke baştir heqê keda xwe bigirin. Ne buhayek li gorî hezkirina ticar, buhayê ku ew dixwazin ango herî kêm li nêzî buhayê ku dixwazin dikarin nirxên ku hilberandine pêşkêşî piyaseyê bikin. Pêwîst nake ku ji hilberandin heya mezaxtinê her kesek pê re mijûl bibe û wê ya jî dê sûdê bide. Heman tişt li taxan, di dezgehên din de jî bi rehetî dikare pêk were. Di dinyayê de mînakên wê ya gelek in.

Li gel wan kooperatîfbûnên hilberînê, kooperatîfbûnên mezaxtinê jî dikarin pêk werin. Bihevrebûna kooperatîfên wan her du qadan, wê sûda aboriyê her ku biçe zêde bike. Di rewşeke dabînkirina giştî û hevpar a pêwîstiya gund, tax, grup an jî dezgehên biçûk û navîn ên ku dibin kooperatîf, wê xelekên navbeynkar di navberê de derxîne. Bi wî awayî rasterast xwegihandina hilberînê dê pêk were û qezenca neheq a ku ticarên navbeynkar weke kar dixin berîka xwe, wê di destê pêkhateyên ku dibin kooperatîf de bimîne. Wê ya qet ne komperayeke (meblax) ku biçûk were dîtin. Aboriyên gel, bi

aboriyên kolektîf ên bi wî awayî dikare xwe ji ticarê navbeynkar û karê wî rizgar bike. Bi wê ya bi temamî pergala kapîtalîst dikare ji holê were rakirin, herî kêm kar/qezanca neheq a ku ticar bê hilberandin bi dest dixe, wê were bêbandarkirin, qelskirin û derbekirin.

Bi qasî avakirina kooperatîfan, rêvebirina wan jî girîng e. Ji ber ku kooperatîf rista xwe bi bandor bilîzin, nekevin bin bandora pergalê û neşibin pergalê, divê rêvebirina wan bi awayeke demokratîk pêk were. Nexwe tu cudahiyeke wan û ya kooperatîfên ku di pergala kapîtalîst de pêşketine û şibiyane pergalê namîne. Di piraniya kooperatîfên ku di bastûra (bunye) pergalê de ava dibin de rêveberî, derfetên kooperatîfê ji bo berjewendiya xwe ya kesayetî bikar tînin. Ew rewş dibe sedem ku hem pêkhateye bûrokratîk ava bibe, hem beşek kara kooperatîfê derbasî rêveberan bibe, hem jî dibe sedem ku endamên kooperatîfê ji ber para xwe ya kêm, di wê pergala birêxistî de di asta ku dixwaze de sûdê negire. Pêkhatina kooperatîfên wisa ji ber ku ne demokratîk e, nûbûna rêveberiyên wan jî ne hêsan e. Bi xwezayî daneheva sermaye-keda ku kom dibe, bi awayekî dikeve bin serweriya hin kesan û li gorî berjewendiya kesan tê bikaranîn. Ew rewş bi vesaziyên demoratîk dikare ji holê were rakirin.

Divê li ser bingeheke demokratîk avakirin, şixulandin û rêvebirina kooperatîfan pêk were. Divê tevahiya endamên kooperatîfê tevlî pêvajoya biryarê ya kooperatîfê bibin û bi awayeke demokratîk rêveberiyê hilbijêrin. Rêveberî jî divê di bereya biryarên ku tên girtin de kooperatîfê birêve bibe, hesaba wê bide û pêkhateyên kooperatîfê jî dema ku hez dikin divê bikaribin rêveberên xwe paşde

bikişînin û rêveberên nû hilbijêrin. Divê ew jî di nava şêweyên demokratîk de pêk were.

Xweseriya demokratîk aboriya ku bûye lîstokek li ser kaxizê, weke aborî napejirîne. Enstrûmanên (amûrên) fînans-kapîtal ên weke borse, repo, kirîn-firotina senedên hisse, bono, faîz(selef) hwd. bikarnayîne. Li hemberî bikaranîna wan a li ser navê aboriyê têkoşînê dike. Guherîna pergala bankayan esas digire û li hemberî bankayên ku weke lîstikvaneke borseyê li ser aboriyê bandora çêdike disekine û bi heman awayî li hemberî pergala bankayan a ku bi senayiyê re dikeve nav hev ango destê hev digirin (yekdestîbûn) têkoşînê dike. Ji ber ku banka bigihijin pergalek bi teserûf a bankayan tevdigere û di aliyê avakirina çavkaniyên krediyên hilberînê de, rista ji nû ve vesazîbûna digire ser xwe. Faîzên krediyên ku ji çandiniyê re tên dayîn, divê ne di wê aste de bin ku hilberîner nikaribin bidin. Şaxên ku pergala bankayê pêk tînin ên weke repo, bono, kirîn-firotina senedên hisse, borsa û pergala ku ji hilberîna pêwendî re qut e,  bi aboriyên gel re li hev nayê û ji ber ku kara ezamî ya ji derveyî hilberandinê feraseteke bingehîn a pergala kapîtalîst e, weke dijî aboriya gel dinirxîne û red dike. Modela aboriyê ya bingehîn a ku  xweseriya Demokratîk diecibîne û pêk tîne, xwe dispêre hilberandinê û modelek e ku aboriyên gel ên di nava xwe de hilberîn û milkiyeta kolektîf dihewîne ye û amûrên bingehîn ên pêkanîna wê ya jî kooperatîf in.

## Çêkirin û Bikaranîna Bendavan

Ji bo bidestxistina enerjiya elektrîkê, dîsa ji bo pêkanîna çandiniya bi av, çêkirina bendavan dibe mijareke jêveneger. Ji bo çêkirina bendav û çokên avê yên mezin, veqetandina budçeyek zêde pêwîst dike, ku ew budçe ji grupên biçûk an jî kooperatîfan derbas dike û ne kareke ku bikaribin pêk bînin. Hewceye ku budçe û dezgehên wisa yên mezin, di çawaniya gelemper(sehî) de bin. Divê çêkirina dezgehên wisa li ser bingehek gelemper a bi piştgiriya dewletê pêk were. Lewma milkiyeta wan dezgehan jî hewce ye ku bi gelemper bin. Li ser navê şexs û şîrketan çêkirin û şixulandina bendavan, bi aboriyên gel re ne di nava ahengekê de ne. Eger ji bo bikaranînê, bendavên ku li ser bingehê gelemper tên çêkirin ji şîrketên taybet re werin dewrkirin, wê ya jî dibe pêkanek xelet. Divê di belavkirina enerjiyê ya bendavên ku li ser bingehê gelemper hatine çêkirin de, civak esas were girtin û wê ya nêzîkbûna bingehîn a Xweseriya Demokratîk e. Şîrketên taybet ji bo pêwîstiya xwe ya enerjiyê dikarin enerjiyê hilberînin û ew jî tenê bi hilberandina enerjiyê ya ku xwezayê gemar nake dikare pêk were.

Di çêkirina bendavan de divê xweza û mîrateya çandî û dîrokî neyê xerakirin. Tevahiya bendavên ku li Kurdistanê hatine çêkirin li ser tejaneyên(hewze) avê yên cihên dîrokî hatine çêkirin. Di bin bendavên hilberandina enerjiyê yên ku emrê xwe zêde ne dirêjin de, dîrokek tê winda kirin. Polîtîkayek wisa ya çêkirina bendavan, nayê pejiran û sûda xwe jî nîne. Weke madî nirxê dîroka ku di bin wan bendavan de tên winda kirin, nayên pîvandin. Tu Mîqtarek (pîvanek) enerjiyê jî nikare tunekirina wê dîrokê mafdar derxîne. Bendava Heskîfê ya ku îro çêkirina

wê berdevam e, mirov dikare weke mînak bide. Çêkirina bendavên ku li ser ava Zê(Zap) tên çêkirin jî di heman çawaniyê de ne. Dibe ku di demên berê de pêşî li çêkirina bendavên ku li ser çemê Firad û Dijleyê hatine çêkirin ku bûne sedemê komkujiyên çandî û dîrokî yên gelek mezin nehatibe girtin. Lê divê ji niha şûn de destûra çêkirina bendavên ku komkujiya xweza û ya çand-dîrokê dike armanc neyê dayîn.

Xweseriya Demokratîk li dijî polîtîkaya bendavên ku bi navê hilberandina enerjiyê tên çêkirin û dibin sedema komkujiya xweza, çand û dîrokê ye. Xweseriya Demokratîk ne mîqtareke enerjiyê, mîrateya dîrokî û çandî weke gencîneya(xezîne) xwe dibîne. Xweseriya Demokratîk li dijî şixulandina çavkaniyên enerjiyê yên ku weke santralên nûkleer û termîk enerjiyê çêdikin û dibin sedemê rûxandina xwezayê ye. Li şûna wan, pêwîstiya xwe ya enerjiyê ji şixulandina çavkaniyên enerjiyê yên weke roj, ba û hwd. digire ku ew jî hin paqijtir in, bi xwezayê re dost in û nabin sedema rûxandina xweza û dîrokê. Di bikaranîna çavkaniyên avê de jî çêkirina bendavên pîvang biçûk ên ku rê li ber tu rûxandina venakin esas digire.

Kooperatîfên gundan jî dikarin di dabînkirina enerjiya gund de rist bigirin ser xwe. Ji bo bikaranîna enerjiya rojane ya ku ji dewletê hêvîkirin û ji bo wê enerjiyê pere dayîn ne pêwîst e. Mirov dikare li ser çem û robarên diherikin, bendavên biçûk ên ku enerjiya çend sed an jî hezar amperan hildiberînin çêke. Ew bendav, wê rê li ber xerakirina herikîna robaran venekin. Eger gundek li derdorên xwe yên nêzîk robar hebe, dikare bi kooperatîfa xwe enerjiya xwe hilberîne, her wiha çend gund jî dikarin bi

hevbeşî enerjiya xwe hilberînin. Ji ber ku wê ya hilberandina enerjiyeke paqij e, zerarê nade xwezayê û bi wê ya re wê her tim enerjiyeke erzan were bidestxistin. Xweseriya Demokratîk di hilberandina enerjiyê de piştgiriyê dide nêzîkbûnên wisa û teşwîq dike. Piştgiriya terzê hilberandina enerjiyê ya ku zerar nade û xwezayê gemar nake, dike.

## Bikaranîna Çavkaniyên Sererd û Binerd

Gava ku qala çavkaniyên sererd û binerd tê kirin; despêkê av, ax, daristan û maden tên bîra mirov. Avên ku xwediyê debiya bilind in û ji sînoran derbas dikin, çerçoveya bikaranîna wan avan bi zagonên navneteweyî jî hatine xêzkirin. Bi rêzgirtina wan rêgezên ku hatine kifşkirin bikaranîna avên ku çavkaniya xwe ji Kurdistanê digirin, divê di terzeke ku xîtabê tevahiya civakê dike de be. Sûda bikaranîna avên ku debiya wan wisa bilind, divê di terzeke ku xîtabê tevahiya civakê dike de be. Milkiyeta avên(robar) wisa ya gelemperiyê ye, her wiha mafê teserûfê jî ya gelemperiyê ye.

Bikaranîna avên ku debiya(birh) wan biçûk, çawa ku bi hiqûqeke wisa ya navnetewî nehatine sînordarkirin, li ser tesarûfeke cuda jî nayê pêşxistin. Derdorên nêzîk ên av lê diherikin, bi qasî di çandiniyê de, di hilberandina enerjiyê de jî li ser bingehê plansazî û biryarên hevpar bê ku zerarê bidin hev, dikarin wan avan bikarbînin. Cureyên wan avan ne pêwîst e bi hinceta çandiniyê an jî bi armanceke cuda derbasî cihên cuda bê kirin, dewlet jî li ser wan avan ne xwediyê teserûfê ye. Mirovên ku li derdorên wan avan jiyan dikin, mafê wan heye wan avan bikarbînin û bibin xwediyê wan avan.

Di rêjeyek diyar û girîng de dabeşiya erd çêbûye. Ew erdên ku berbendî kadastroyê hatine kirin, erdên ku di mijara milkiyeta taybet de ne. Xweseriya Demokratîk wê dest nede wê milkiyeta erd a ku ji berê de tê. Bêguman wê li hemberî kesên ku deh hezaran donim erd di bin milkiyeta xwe ya sexsî de dihêlin derbikeve. Her wiha wê li hemberî pergala dibe sedem ku beşeke mezin a civakê bê erd bimîne, dîsa li hemberî bêdadiya axayên erd ên ku mirovan weke pale û xulam didin karkirin û li hemberî pêkanên ku li metrepolên Tirkiyê weke karkerên demsalî pêk tên wê bêdeng nemîne. Di rewşeke wisa ya bêhevsengî de dabeşkirinek erd a bi edalet jêvenegeriyek e. Wê ya nayê wateya destwerdanek li ser milkiyetê. Piştî ku rêjeya erd a ku kesek dikare bibe xwediyê wê hat diyarkirin, bi reformeke erd, gundiyên ku bê erd in wê bibin xwediyê erd.

Erdên esasî yê ku bibe mijara reforma erd; erdên herî mezin ên di destê dewletê de ne ku nayên bikaranîn( erdên leşkerî jî daxilê wê ya ye). Erdên ku di bin serweriya dewletê de ne û nayên şixulandin gelek in. Tenê ew erd ji gundiyên bê erd were belav kirin, di Kurdistanê de gundiyek bê erd namîne. Erdên ku dewlet xwediyê wê ye, dikare ji gundên derdor ên herî nêzîk re were belavkirin. Bi taybet jî di gundan de kooperatîf hatibin ava kirin, li şûna ku ew erd rasterast li kesan tê belav kirin, bi navê endaman bikaranîna wan erdan mirov dikare ji kooperatîfê re bihêle. Bi wî awayî hem tu kesek bê erd namîne, hem jî erdên ku nehatine bikaranîn û ji çandiniyê re venebûnê, wê ber bi çandiniyê ve vebin. Hem ji pirsgirêka îstihdamê re çareseriyek girîng peyda dibe,

hem jî zêdebûna berhem pêk tê, dewlemendî zêde dibe û refaha civakê bilind dibe.

Daristan, çavkaniyên dewlemendiya bingehîn a ku civak xwediya wan e. Parastin û mêzekirina wan, erka tevahiya civakê ye. Daristan, di dereceya yekem de ya kesên ku li qadên daristan jiyan dikine. Weke erdan, daristan jî dikare ji kesên ku li qadên daristan jiyan dikin û li wan qadan niştecîhin re were hiştin. Sûdgirtina berhemên daristanan jî divê weke mafê kesên ku li ser wan erdan jiyan dikin bê pejirandin. Her çi sedem dibe bila bibe zerardayîna qadên daristanan, weke zerardayîna dewlemendiyên welat tê nirxandin.

Di serî de petrol di nav de tevahiya çavkaniyên binerd, weke dewlemendiyên civakê tên qebûl kirin. Li ser wan dewlemendiyan destûr ji tesarûfa kesayetî re nîne û nabe mijara milkiyeta takekesî. Di şixulandina wan çavkaniyên dewlemend ên şîrketin xwecihî û biyanî de, sûda tevahiya civakê esas tê girtin. Bikaranîna rê û tevnên veguhestinê yên ku dewlemendiyên gel û welat in jî, di çeçoveya heman prosedûrê de pêk tê.

## Di Backirinê De Pîvanên Ku Esas Werin Girtin

Xweseriya Demokratîk backirina neyekser weke rêbaza şelandin û mêtîngeriya veşartî dinirxîne. Di backirina neyekser de li gorî dahata mirovan, sûda lêçûnên gelemper esas nayê girtin. Berovajiya wê, piraniya bar li pişta kesên feqîr û kesên ku dahatiya wan kêm e tê barkirin. Bi wî awayî mirovên ku di grupa dahata bilind de ne, ji lêçûnên gelemper muaf tên girtin. Bi xwezayî, her ku asta dahatiyê dikeve,

bacên neyekser bi bareke hin girantir li pişta civakê tê barkirin û civak tê şelandin. Her ku asta dahatiyê zêde dibe jî, bacên neyekser nayên xuya kirin. Lewma Xweseriya Demokratîk bi teqez rakirina her cure bacên neyekser diparêze.

Riya pêşwazîkirina lêçûnên gelemper bac in. Lê, her çi qasî bi rêya bacan pêşwazîkirina lêçûnên gelemper pêk were jî, divê pîvanên ku esas tên girtin hebin. Ew pîvan; pêwîstiya rêjeya bacan a di hevsengiya rêjeya dahatan de ye. Ango divê rêjeya bacan û dahatan di nava hevsengiyekê de bin. Baca ku ji mirovên xwediyê mûçeya(heqdestî) herî jêr in û di sînorê birçîbûnê de jiyan dikin tê girtin, bi bacên kesên ku xwediyê budçeya milyar doların in û dahata wan a salane û beyanameyên bacên wan milyar doların derbas dike, di heman rêjeyê de bac didin û di lêçûnên gelemper de hevpar tên dîtin. Wê ya ne nêzîkbûneke adilane ye û nayê qebûl kirin. Kesên ku li ser pişt û keda civakê dewlemendiyên mezin bi dest dixin û pereyan digirin, divê di asteke jor de beşdarî lêçûnên gelemper jî bibin û ew mijareke ku Xweseriya Demokratîk diparêze ye.

Bêguman hewce ye ku lêçûnên gelemper ji aliyê civakê ve were pêşwazîkirin. Wê ya rastiyeke giştî ye û dikare were qebûl kirin. Lê, hinek beşên civakê hene ku qezenca wan tenê têra rewşa ku weke 'mirovahiya tazî' dikare jiyan bikin dike. Li Tirkiyê pîvana asta dahatiya malbateke çar kes a di sînorê feqîrî û birçîbûnê de ne ku wê ya her meh weke agahî tê weşandin, em çima qala mijareke wisa dikin, nîşan dide û ew pîvan di Kurdistanê de gelheyek(nifûs) gelek mezintir îfade dike. Di asta wekhev de mezaxtina(xerckirin) gelemper a ku li ser mirovên ku

nikarin debara xwe bikin û bi firotina keda xwe qezenca bidest dixin, bi heman awayî wê ya li ser mirovên ku di asta mirovê tazî ya herî jêr de jiyana xwe didomînin ferzkirin, dibe pêkanek li dijî wekhevî û edaletê. Jixwe ew mirovên ku dahata wan kêm e, di qadên mezaxtinên gelemper ên heyî de an qet sûdê nabînin, an jî di asteke gelek kêm de dikarin sûd bigirin. Yên ku herî zêde sûd digirin, pêwîst e ku herî zêde tevlî bibin, ew nêzîkbûneke hem exlaqî hem jî adilane ye. Bi wê nêzîkbûnê, divê bi teqez hin beşên civakê ji bacê muaf werin girtin.

Tespîtkirina rêjeya bacan ne mijrara me ya wê nivîsê ye. Lê gava matrahên bacan tê amadekirin; ewil beşên civakê yên ku pêwîstî pê heye ku ji bacê muaf werin girtin tên derxistin, şûnde li gorî dahatiyê mezaxtinên gelemper ji gelheyê tên belav kirin. Tenê bi wî awayî mirov dikare qala beşdarbûneke hevseng, wekhev û adilane ya mezaxtinên gelemper bike.

Weke encam; aborî mijareke ku divê bi hûrgiliyên(tefeûrat) gelek fireh û zirav bidest were girtin. Eger li ser bingeheke demokratîk pergalek nû were ava kirin; pêwîst e ku pergala aboriyê dersan ji tiştên ku hatine jiyan kirin derxîne û xwe ber bi pergaleke nû ve ava bike. Ew pergala nû jî, pêwîst e ku vesazîbûna demokratîk û wekheviyê esas bigire. Di wê wateyê de pergal û nêrîna Xweseriya Demokratîk a aboriyê, bi qasî ku ji pergala mêtînger a kapîtalîst cuda dibe, divê ji pêkanên pergala aboriyê ya sosyalîzma reel ku hilweşiya ye jî cuda be.

Heya li wir me hewl da ku em bi nêrîna Xweseriya Demokratîk aboriyê binirxînin. Weke me li jor daye diyarkirin; mijar mijareke gelek berfireh û

hûrgilî ye. Di pergala aboriyê de em tenê bi çend mijaran ve sînordar man, jixwe me tenê hin mijarên sereke yên ku li ber çavên me ketine anîn ziman. Pêwîstî pê heye ku bi awayeke berfireh li ser mijarê were sekinîn.

## ŞAXA ÇANDÊ YA XWESERIYA DEMOKRATÎK

### 1) Netewa Demokratîk, Xweseriya Demokratîk û Ziman

Heya niha çend caran bi wesîleyên cuda xweseriya demokratîk kete rojeva gel û rêxistina me. Di merheleya stratejîk a çaremîn a têkoşîna me de gava ku pratîka înşaya netewa demokratîk bû rojev, di welat û herêma me de rojevek bi bandor ava kir. Em weke gel û rêxistin li gorî perspektîfa ku Rêbertiya me daye, ketine nava fêmkirin û hewldana pratîkirina xweseriya demokratîk. Li beranberî wê ya dewleta Tirk jî, ji bo û çareseriya pirsgirêka Kurd ew firsenda dîrokî berovajî kir û ji ber ku ji armancê dûr bixe, li pev hev heman "çîrok" rêz kirin. Mirov dikare bêje ku; di wê hêlê de tu nêzîkbûneke wan a erênî pêşneket.

Yek ji rêgezên xweseriya demokratîk ew e ku gel di derbarê pirsgirêk û pêwîstiyên xwe yên civakî û jiyanî de biryaran digire û pêk tîne. Rêbertiya me, ji bo xweseriya demokratîk hem di parêznameya xwe ya Sosyolojiya Azad de, hem jî di hevdîtinên xwe yên demê dawiyê de çerçoveyeke berfireh daniye holê. Weke gel û rêxistin a ku ji me tê xwestin; tiştên ku hatine xuya kirin bi awayeke rast û asteke besî de nîqaş kirine û di avakirina xweseriya demokratîk de li gorî pêwîstiyên me yên civakî û geşedanên rojaneyî bi biryarên şênber wê ya pratîkirin e.

Weke tê zanîn Rêbertiya me li hemberî kompolya navdewletî; bi xwegihandina asteke nû ya diyalektîka geşedana Rêbertiyî bû bersiv. Ew bersiv xwe di paradîgmaya "Demokratîk, Ekolojîk û Azadiya Jin de " îfade dike. Di wê terzê îfadeyê de, di serî de jiyana civakî di nav de qadên jiyana civakî yên weke

şaristanî, çîn, dewlet, jin, bajar, çand, demokrasî, guherîn, pêşketin, azadî û hwd. bandor dike û ji aliyê Rêbertiya me ve gelek têgeh û sazî ji nû ve bi dest hatin girtin. Rêbertî, bi hin têgehên bingehîn û û kirûyan(olgu) pirsgirêkên weke çîn, dewlet, demokrasî û jin gihandin kûrahî û nûbûneke şoreşgerî.

Ji bo biryarên rast beriya her tiştî divê mirov bizane niqaşên rast bike. Ew, ji bo pratîkek rast tê wateya teoriya rast. Heman hesasiyet ji bo niqaşên xweseriya demokratîk jî nîşandan pêkan e. Mijara xweseriya demokratîk ku em di teşeyên cuda de niqaş dikin, weke tevger ne projeyeke ku em jê dûr in. Lê di wateyeke berfireh de tevahiya pêkhateya kadro û rêxistina me ya têkoşînê dimeşîne, di heman kûrahiyê de ne û waqifê wê mijarê ne. Hêzên ku ji derveyî me dimînin, li gel kesên ku xweseriya demokratîk weke modela çareseriyê dibînin, kesên ku weke projeye parçekirina Tirkiyê dinirxînin jî hene. Di pêkhateya me ya kadro û rêxistinê de, bi sedemên ku xweseriya demokratîk zêde nehatiye niqaş kirin û derbasî hişmendiyekê nehatiye kirin, nêzîkbûnên rûxalî derdikevin holê. Ji ber ku kêmasiyên heyî werin derbas kirin, divê perspektîfên di vê mijarê de yên di parêznameyên Rêbertiyê de cih digirin baş werin fêm kirin. Di rojevê de yek jî erka herî girîng ew xisûs e.

Rêbertî, hêmaneke bingehîn a xweseriya demokratîk weke şaxa(bûut) çandî da diyarkirin. Rêbertî di derbarê wê hêmanê de: “Ew şaxa çandî zêdetir ziman, perwerdeya zimanê zikmakî, dîrok û hunerê digire nava xwe” dibêje. Weke mijarên girîng ên wê şaxê ku hez dikir tim were niqaş kirin; “ têkiliya Kurdî bi Tirkî, Erebî û Farisî re çawa be, perwerdeya zimanê zikmakî çawa dikare were dîtin, polîtîkaya ziman a netewa

demokratîk pêwîst e ku çawa be" bûn. Pêwîst e polîtîkaya perwerdê were ava kirin. Kurd, bi temamî çawa dikarin qirkirina çandî derbas bikin? Divê wê ya jî were niqaşkirin û qirkirina çandî bê derbas kirin". Weke hêmanên din ên xweseriya demokratîk şaxa çandê jî qadeke berfireh e ku divê bi hêz were niqaş kirin û ji biryaran were girêdan. Di vê şaxê de ya ku bi dest tê girtin û pêkhateyên ku qala wan tê kirin ango tê ziman; dîrok û huner di nava nirxên nasnameya netewa demokratîk de çi îfade dikin û di vesazîkirina xweseriya demokratîk de cihê wan dê çawa were kifşkirin e, ew kareke sereke ye ku were zelal kirin.

Netewa demokratîk xwe dispêre tespîta Rêber Apo ya di derbarê jiyana civakî de ku weke pêkhateyeke " zîndî, organîk, pir cure û çandên dewlemend" dinirxîne. Gava ku Rêbertî civak û pêşketina civakê digire dest, netewa demokratîk ku weke encama tespîtên xwe bi têgînî kiriye, ji bo roja îro weke forma dewlemendbûna jiyana civakî dide diyar kirin.

Weke dîrok, civakê bi klanan despê kiriye, bi qebîle-eşîr û qewman devam kiriye, îro jî bi netewan jiyan dike û di nava guherîn û veguherînê de ye. Bêguman bi destgirtina forma nû ya civakê her hebûna ku derdikeve holê, nayê wateya hebûna ku ji tunebûnê despê dike. Nûbûna civakê an jî girtina formeke nû ya civakê; tê wateya nirxên formên beriya xwe û bi taybetî nirxên exlaqî-polîtîk digire nava xwe, li gorî pêwîstiyên heyamê(vedorê) xwe ji nû ve bi şîrove û bi wate dike. Lê her heyameke li gorî dem û mekanê, ji jiyanê re tevlibûneke xwe ya dewlemendiya çandî çêbûye. Ew rewş girêdayî rêbaza jiyana civakî ya ku bê navber xwe dihilberîne ye. Jiyana civakî kirûyeke(diyarde) ku bi berdevamî dimeşe ye.

Gava ku Rêbertî dîrokê dişibîne “herikîna robar”, kirpandineke(daxuyandin) ya berdevamiya jiyana civakî ku bi milyon sal e berdevam dike, tîne ziman. Gava jiyana civakî diherike, rastiya “robar-okyanûs” a ku kom dibe, bi kombûna xwe re şaxên nû yên herikîna avê derdixîne. Netewa demokratîk di roja me ya îro de rastiyeke wisa îfade dike.

Gava ku em bi bergeha Rêbertî ya diyalektîka geşedana civakî re civaka me ya îro digirin dest, taybetmendiyên sereke yên derdikevin pêşiya me, nehomojeniya civakê ye. Nehomojenî cudahî, curehî û dewlemendiya jiyana civakî raber dike. Yektîpkirin ku homojeniyê rave dike, di jiyanê de ne pêkan e. Xwestin an jî ferzkirina homojeniyê, tê wateya qirkirina çandî. Di wê wateyê de her çi qasî netewa demokratîk di nava xwe de li gorî dem û mekanê guherî be jî, formeke civakî ya ku tevahiya dewlemendiyên dîroka mirovahiyê di nava xwe dihewîne û bi milyon sal in “weke robarekê diherike” heye. Di derbarê pêşeroj û jiyanê de tevahiya nirxên “baş, rast, azad û bedew” di nava xwe de dihewîne. Li cihê ku netew-dewlet bi nîjadperestiya netewê tê perde kirin û tevahiya cudahiyan red dike, li wir netewa demokratîk derdikeve holê. Netewa demokratîk îfadeya nasnameya gelan, çandan û dewlemendiyan e. Ji ber netewa demokratîk neteweke ku dewlet li ser nayê ava kirin, komunal û demokratîk e. Ji ber wan taybetmendiyan, nirxên komunal ên nasnameya çandî yên ku di dîroka gelekî de heya roja îro hatine, bi qasî ku heq dikin di nava rastiya netewa demokratîk de jiyan dikin.

Netewa demokratîk a ku bi wan taybetmendiyên xwe ve tê pênase kirin. Ji ber ku jiyana civakî di bin

çanda deshilatdariyê de hatiye berovajîkirin, bi pirsgirêkan re rû bi rû maye û pirsgirêka herî bi jehrî jî nîjadperestî ye. Ruxmî pirsgirêkên deshilatdariyê, netewa demokratîk realîteyek e. Bi taybet di wan çar sed salên dawiyê de pergala kapîtalîst civak xistiye bin êrîşa yektîpkirinê û ew jî pêkaneke qirkirina çandî ye. Ruxmî wan pêkanên qirker, di serî de Rojhilata Navîn di nav de li gelek deverên cuda yên dinyayê gelek ziman, ol, çand, eşîret, cemaetên olî û gelek nirxên nasnameyên cuda rastiya forma netewa demokratîk îspat dikin. Weke tê zanîn piştî ku kapîtalîzmê netewe bi nîjadperestiyê zehrî kirin, di nava pêkhateyên netawa demokratîk de nakokiyên ku heya ber bi şer û pevçûnan ve diçin hatin ava kirin. Bi wê ya li şûna netewa demokratîk tenê olek, zimanek, qewmek ango çandek hat serwer kirin û netewa mezbaxane(qesabxane) ya ku xwe dispêre netew-dewletê hat ava kirin. Dewlemendiya civakî ya hezaran salan a ku netewê pêk tîne, li gorî berjewendiya dewlet û deshilatdariyê hat teşe kirin û di navbera wan dewlemendiyan de bi sedema bicihkirina têkiliyên deshilatdariyê yek li ser a din hat serwer kirin û ew jî bû sedem ku nakokî werin jiyan kirin û bi hev re bikevin pevçûnê. Rewşeke wisa ya şer, pevçûn û nakokiyan jiyana civakî ber bi çolkirinê ve biriye.

Sedama bingehîn a pirsgirêkên ku di salên dawiyê de di dinayê de tên jiyan kirin, ji bo korkirina dewlemendiya netewa demokratîk zirxeke ku ji aliyê netew-dewletê ve li civakê hatiye kirin. Ji ber wî zirxî ya ku pêwîst e îro were kirin; derbaskirina netew-dewletê ya ku berovajî dewlemendiya jiyanê ye. Riya

wê ya jî di netewa demokratîk û xweseriya demokratîk de derbas dibe.

Xweseriya demokratîk di heman demê de tê wateya avakirina netewa demokratîk. Ji ber ku ew avakirin veneguhere netew-dewletê, qadên ku hêmanên bingehîn ên xweseriya demokratîk pênase dikin, divê ji yên dewletê bên cuda kirin. Ji ber ku mijara me şaxa çandî ya xweseriya demokratîk a Kurdistanê ye, mijarên weke ziman, dîrok, qirkirina huner û çandî ku pêkhateyên wê şaxê ne, em ê hewl bidin ku wan pêkhateyan li gorî rastiya netewa demokratîk bigirin dest. Di aliyekî de rastiya mêtîngeriyê ya ku nirxên me yên çandî înkar dike û dest ji pêkanên xwe yên tunekirinê bernedaye, hêj jî hebûna xwe diparêze, lewma xweseriya demokratîk a Kurdistanê  pêwîst e ku bibe xwediyê pozîsyoneke ku hem dawî li wê mêtîngeriyê tîne, hem jî bibe xwediyê helwesteke ku dizane li ser kîjan bingehê têkiliya xwe bi dewletê re vesaz bike. Ji bo wê, xweseriya demokratîk a Kurdistanê weke şaxên din di şaxa xwe ya çandî de jî rû bi rûyê du erkan e. Ji wan erkan a yekemîn; Kurd bi riya avakirina netewa demokratîk dikarin karên xwe yên navxweyî vesaz bikin. A duyemîn jî; bi dewletan re di her qadê de dikarin têkêliyên xwe vesaz bikin.

Şoreşa herî bingehîn û mezin a dîroka civakî, şoreşa ziman e. Ziman, yek ji nîşaneya bêhempa ya geşedana civakî ye ku bîra civakî û ezmûnên pratîkî yên ku bi deh hezaran sal e jiyana civakî ava kiriye û bi roja îro re parvekiriye ye. Qada ku herî berfireh jiyana civakî hebûna xwe di tê de peyda dike, ziman e. Di wê qadê de tenê ne serdemek, tevahiya deng, wate, nav, xîtabet û şopên pêvajoyên civakî hene. Ji ber ku

weke jiyanê bi zindî ye, li gorî çerçove û û pêwîstiya jiyana civakî hedî be jî, lê tim di nava pêşdeçûna veguherînê de dewlemend dibe. Ji ber wê ya ziman, tenê di civakbûnê de watedar dibe.

Her çi qasî hin nirxên çandî û gelê ku ew nirx ava kirine ji holê rabin jî, di asta peyvan de be jî ziman dikarin jiyan bikin, mînak; weke ku peyvên latinî bi awayeke berfireh di aborî û zanistiyê de tên bikaranîn. Lê, ji ber ku zimanek hebûna xwe berdevam bike, pêwîst e ku civat an jî civaka ku wî zimanê diaxive hebe. Bes tenê hebûna civaka ku wî zimanî diaxive jî têrê nake, ji ber ku zimanek jiyan bike; divê ji aliyê civaka ku xwediyê wê ye ve her tim were bikaranîn. Gelek dikare zimanê xwe bîr bike(ango ji aliyê hin kesên din ve bidin bîrkirin) û zimaneke din jî bikar bîne. Lê wê ya tê wateya ku ew gel wesfa xwe ya netewa demokratîk di asteke girîng de winda bike. Wê ya jî tê maneya ku mirov bikeve riya tunebûnê. Eger zimanê gelekê bi riyên zordarî û pêkûtî ango bi pêvajoyên cuda yên helandinê ber bi tunebûnê ve hatibe birin, ew dikeve çerçoveya sûçê mirovahiyê. Dikeve sûçê qirkirina çandî. Kesên ku wê ya dikin, sûçê herî mezin ê mirovahiyê pêk tînin. Gelê ku li rastî vî sûçî tê jî; mafê ku bi zimanê xwe her cure xebatan bimeşîne heye û ji ber ku vî mafî bi dest bixe, têkoşîna ku dimeşîne jî rewa ye. Di heman demê de ziman bi cudabûna xwe di navbera civak û çandan de rê li ber dewlemendiyan vedike. Ziman, xuliqkariyeke civakî ye ku di mirovan de nasnameya çandî ava dike. Eger her gelek bi zimanê xwe were binavkirin, wê ya nîşan dide ku ziman û çand çi qasî di nav hev de ne. Her civak û kesayetek raman û fikrên xwe bi awayeke herî baş bi zimanê xwe yê zikmakî tîne ziman.

Di wê hêlê de eger em li Kurdî binêrin, bi qasî dewlemendiya binavkirin û dengkirinê, her zaravayek(lehçe) wê ku bi qasî zimanekî dewlemend in, ruxmî hemû pêkûtî û êrîşên bişavtinê karibûye xwe li ser lingan bigire. Kurdî weke ziman, kok û hêza xwe ji şoreşa gund û çandinê digire. Kurdî zimanê jiyana komunal e. Çawa ku Kurdî bi daneyên arkeolojîk, etîmolojîk û etnolojîk derketiye holê, xwediyê taybetmendiyeke wisa ye ku koka gelek zimanan di nava xwe de dihewîne. Jixwe dewlemendiya zaravayên wê ji ber wê ya ye.

Di rastiya netewa demokratîk de bi awayeke zanatî hilbijartina zaraveyekê û serwerkirina wê û heman zarava di bin navê zimanê netewî de li ser tevahiya civakê ferzkirin, nayê qebûl kirin. Axiftina netewekê ya bi zaravayên cuda, encama avabûna organîk û demokratîk a jiyana civakî ye. Netewa demokratîk, axiftina hemû zaravayên ku di netew de hene jêveneger dibîne û di qadên cuda yên jiyanê de bikaranîn û pêşxistina wan esas digire. Di wê hêlê de zimanê netewa demokratîk ne ku zaravayek tenê ye tê axiftin, zimaneke ku hemû zarava tên axiftin. Di nava herikîna zindî ya jiyanê de dibe ku zaraveyek bi serê xwe serwer bibe. Eger wisa be jî hebûna zaravayên din ji holê nayê rakirin. Di mijara ziman de rêgezeke din jî a zanistî; ji ber ku zimanek bi civaka ku pê re girêdayiye jiyan bike û pêş bikeve, divê hemû astengî li pêşiya ziman werin rakirin da ku bi awayeke azad were axiftin.

Bi riya xweseriya demokratîk a Kurdistanê gava ku netewa demokratîk tê ava kirin, mijarên weke axiftina zimanê Kurdî û weke zimanê perwerdeyê bikaranîna wê, ji ber nêzîkbûna dewletê ya redker û

holêrakirinê bûye pirsgirêk. Beriya her tiştî nîqaşên weke; bi zimanê Kurdî perwerde bibe an jî nebe, di her qada jiyanê de were axiftin an jî neyê axiftin( di wir de bi piranê qadên fermî ango saziyên dewletê mewzûbehs e) ji bo Kurdan û zimanê Kurdî heqaretek e. Ew nêzîkbûneke bingeh a mêtîngeriyê ye. Divê ew xisûs bi zanebûn were destgirtin. Mijara ku Kurdî bibe zimanê perwerdeyê, rêgeza nasnameya netewa demokratîk û xweseriya demokratîk e jî. Nêzîkbûna rast a li hemberî zimanê Kurdî, di her astê de weke zimanê perwerdeyê bi bikaranînê zimanê Kurdî despê dike.

Mijareke girîng a ku were sererastkirin jî rewşa "Zimanê Kurdî ji bo Kurdan were serbestkirin"e. Weke tê zanîn di salên dawiyê de her çi qasî dewleta Tirk bi riya TV, radyo, tekstên nivîskî Kurdî bi kar bîne jî, Kurd bixwe nikarin wan mafan di fermiyetê de bi kar bînin. Ji bo Kurdan weşana radyo û TV bi awayeke giştî qedexe ye. Li ser Kurdî bi awayeke fermî û lebatî qedexeyek heye. Ew qedexe di tîpên Q,W,X de bi feraseteke xerifî(meczûp) xwe dide der. Di xweseriya demokratîk de mijarên weke bi awayeke berfireh axiftina Kurdî, hewldana ku Kurdî bibe zimanê perwerdeyê, di çapemenî û weşanan de bi awayeke azad bikaranîna ziman, mijarên ku Kurd bi derfetên xwe çareser bikin in. Eger qedexeyên dewletê ranebin û dawî li astengiyan neyê, ji bo parastin û pêşxistina ziman çalakî dikarin werin pêşxistin. Eger mafê perwerdeya zimanê zikmakî neyê dayîn, ji boykotkirina dibistanan bigire heya çalakiyên parastina rewa, di Kurdistanê de bi çalakiyên berfireh mirov dikare pergala perwerdeya dewletan bêbandor bike. Divê rêxistin û kedkarên perwerdeyê piştgiriyê

bidin vî mafê demokratîk. Pêkûtiyên ku li ser xebatên çapemenî-weşana Kurdî tên meşandin hene, ji ber ku ew pêkûtî ji holê rabin, divê her cure çalakî werin pêşxistin. Dîsa weke parçeyeke wan çalakiyan divê çalakiyên weke; li hemberî çapemeniya mêtînger a dewletê boykotkirin, nexwandin û nexistina wan a Kurdistanê pêşbikeve.

Ji ber ku Kurdî bibe mijara lêkolînên zanistî, divê saziyên akademîk werin birêxistinkirin. Bi şertê ku peyvên Kurdî yên kevn wateya xwe winda nekin, divê Kurdî li gorî çanda roja me were lêguncadin û di wê wateyê de divê Kurdî ji nû de bigihije dewlemendiya xwe. Bi wê ya re ew peyvên ku derbasî zimanê cîran bûne û di roja îro de di nava zimanê Kurdî zêde nayên bikaranîn, ji nû de bikaranîna wan peyvan jî dê ji bo Kurdî bibe wesileya pêşxistina dewlemendiyê. Dîsa sererastkirina dengên ku şaş tên bikaranîn, bi awayeke rast vesazkirina têkiliyên zaravayan a bi hev re û bi awayeke rast vesazkirina derbasbûna nava hev a zaravayan, xebatên akademîk ên serekene ku divê despêkê werin kirin. Bi xebatên xurt ên lêkolîn û vekolandinê ew peyvên ku di zarava û devokên herêmî de tên bilêvkirin, bi xebatên ferhengî divê weke xwe bin tomarkirin.

Despêkê berhemên Rêbertiya me di nav de û hemû metnên nivîskî yên Tirkî yên ku di nava têkoşîna me ya azadiyê de derketine holê, divê bi awayeke plansazî û bi pergalî bi zimanê Kurdî werin wergerandin û bên tomarkirin. Teşwîqkirina xwendin û nivîsandina Kurdî û wê ya di qadên erkdar de bi biryarên pêwîst re xistina meriyetê pir girîng e. Her wiha berhemên ku bi zimanên cuda hatine nivîsandin bi wergerandina Kurdî dê ji bo pêşketina ziman

sûdewar be. Yek ji şertê sereke yê hemwelatiyê netewa demokratîk ew e ku bi zimanê xwe perwerdeyê bibîne, biaxive binivisîne û bixwîne û her ferdeke Kurd ku hemwelatiyê KCK'ê be, divê li dijî asîmîlasyona(bişavtin) ku di ziman de tê jiyan kirin bisekine. Mînak; pîvana sereke ya malbateke welatparêz ew e ku Kurdî nîşanî zarokê xwe bide. Divê pîvana welatparêziyê bi nîşandan û nenîşandana zimanê Kudî ya ji zarokan were bidestgirtin. Erkên esasî yên welatparêziyê ya dayik û bavan, bi fêrkirna ziman a ji zarokan despê dike. Divê her maleke Kurd weke akademiyeke ziman be. Divê were zanîn ku ew helwest di heman demê de li dijî qirkirina çandî ye jî. Çawa ku bi bendewariya dewletê avakirina netewa demokratîk pêk nayê, bi gotina "mafê me yê bikaranîna ziman bide, mafê perwerdeyê bide" ew maf nayên bidestxistin. Jixwe di wê mijarê de her çi qasî astengiyên fermî û kardarî(fiîlî) yên ku tên jiyan kirin rabin jî, eger civakek zimanê xwe bikar neyîne, zimanê wan her tim di bin xeteriyê de ye û rû bi rûyê windabûnê ye. Bi zanebûna wê xeteriyê, qada ku tevahiya sazî û dezgehên netewa demokratîk ji her hêlê ve digihîne hev, divê qada ziman be. Gelê Kurd bi ruhê seferberiyê mijara sereke ya digire dest, divê axiftin û bikaranîna Kurdî ya di jiyanê de be. Divê were zanîn ku yek jî peywira bingehîn a xweseriya demokratîk wê ya ye.

Ji ber ku xweseriya demokratîk ne projeyeke ku tenê ji bo Kurdan e, bi gelên din ên ku Kurd pê re jiyan dikin jî, divê pêwendî li ser ziman were saz kirin. Di wê mijarê de bi taybet pêwendiya Kurdî û Tirkî weke ku Rêbertiya me jî bal kişandiye li ser, mijareke girîng e ku divê were nîqaşkirin û zelal kirin. Nêzîkbûna

sereke ya ku di wê xisûsê de esas were girtin, rastiya netewa demokratîk a ‘ne neteweke yek ziman e’ ye. Ji ber wê rêgezê Kurd dikarin li gel Kurdî li gorî pêwîstiyê di qadên din ên jiyanê de perwerdeya Tirkî û Erebî jî bibînin û di wir de tu pirsgirêk nîne. Ew rewş dê ji Kurdan re dewlemendiya çandî û civakî bîne. Bê ku em li helwesta fêrbûn an jî nefêrbûna zimanê Kurdî ya Tirkan û gelên ku em pê re jiyan dikin binêrin, divê li gorî sekna netewa demokratîk zimaneke duyemîn were zanîn û nêzîkbûneke wisa ne rewşeke ku xweseriya demokratîk red dike ye.

Di mijara ziman de, di têkiliyên bi Tirkî re mijareke din a ku esas were girtin; di pevnivisî û saziyên fermî de(bi taybetî li Kurdistanê û deverên ku Kurd zêde lê jiyan dikin) bikaranîna zimanê Kurdî ya bi Tirkî re ye. Divê tecrûbe ji kêmaniyên ku li hin cihên reveberiyên xwecihî di pêkanên ku bi projeyên xizmetê yên pirzimanî hatine ceribandin de derketine holê, werin girtin da ku gavên nû werin avêtin. Li Kurdistanê tevahiya dîyalog û xizmetên rojane bi Kurdî pêkhatin, tişta herî xwezayî ye. Di xweseriya demokratîk de di Kurdistanê de ji bo Kurdan neçariyeke ku tevahiya jiyanê bi Kurdî be. Di avakirina netewa demokratîk de bi taybet di mijara ziman de divê were zanîn ku Kurdistan welateke cuda ye, lewma li gorî wê nîqaş kirin û biryar girtin dê ya herî baş be. Ya ku bi awayeke herî aşkere nasnameya me ya netewa demokratîk bi hemû cudahiyan ve derdixîne holê, bi zimanê Kurdî û zaravayên vê re axiftin, fikirîn, xwendin û nivîsandin e û wê ya rastiyeke ku divê yek saniyê ji bîra me neçe.

## 2- Netewa Demokratîk, Xweseriya Demokratîk û Dîrok

Tevahiya hêmanên çandî yên madî û manewî ku jiyana civakî ava dikin, mirov nikare ji dîroka mirovahiyê qut bigire dest. Ew bi awayeke giştî hilberandinên dîroka mirovahiyê ne. Dîsa di nava mekan û demên cuda de hêmanên çandî yên madî û manewî yên ava bûne hene ku ji dîrok û mirovahiyê qut nikarin bi dest werin girtin. Ew, teqabûlê rêxistinbûna formeke civakî ya xuya dike ne. Ji ber wê ya di wateya teqabûlbûna formên xuya de tu pêkhateyek bê dem û mekanê pêknehatiye. Di tevahiya hêmanên  ku netewa demokratîk pênase dikin de, di nava wê diyalektîkê de bûne nasnameya gelan. Lewma netewa demokratîk û pêkhateyên wê cih, dem û mekana ku di dîrokê de girtine divê rast werin tespîtkirin û divê di xebatên xweseriya demokratîk de li ser teoriyeke saxlem werin rûniştandin, dîsa ji ber ku danxuyakirinên heyî werin kûrkirin, xebateke rêgezî hewce dike. Rêbertî di wê derbarê de tespîtên girîng kirine û daneyên girîng pêşkêş kirine.

Nirxên çandî yên ku cewherê demokratîk a komunal a xwezaya civakî ne, herî kêm pênc hezar sal in li hemberî hêzên şaristaniya bi çîn a ku bi navend dewlet e, di nava berxwedanê de ye. Nirxên mayînde yên ku karibûne bibin nasnameya netewa demokratîk, di heman demê de civakbûna ku kêlî bi kêlî di nava berxwedanê de ye îfade dike. Lewma xweseriya demokratîk dîrokçeya wê berxwedanê derdixîne holê, li ser wê bingehê netewa demokratîk ava dibe û bernameyeke rojanekirinê ya vediguhere formeke guherîn û pêşxistinê derdixîne holê. Lê belê

di rojaneyî de ji ber pêkutî û êrîşên netew-dewletê nikare erka xwe baş bilîze. Xweseriya demokratîk çalakiyeke avakirinê ya ku jê re wê erkê dide serxistine ye. Pêkhateyên madî ku îfadeya dewlemendiya çanda civakî ne û hêmanên weke ziman, ol, fikir û ramanên cuda di nava xwe dihewînin, eger ji bo dîroka civakî çi îfade dikin were zanîn, wê baş were dîtin ku netewa demokratîk realîteyeke(rastî) dîrokî ye.

Pirsgirêkên ku pergala kapîtalîst weke netewe-dewlet afirandine, di rastiya xwe de bingehê xwe ji pêpeskirina(pêkûtîkirin) netewê digire. Pergala kapîtalîst, dewleta netewe digire bin serweriya xwe û bi vî awayî berjewendiya xwe dixe bin ewlehiyê. Wê armanca xwe bi bîrdoziya nîjadperest ku netewê ji xisletê(karakter) demokratîk dûr dixe, pêk tîne. Li hemberî kesên ku hez dikin netewê bê dem û mekan bifikirin û nirxên dîrokî û çandî yên weke zanistî, huner, wêje, ol-mezheb ku nasnameya netewê ava dikin, bi riya nîjadperestiya ku wan nirxan weke olekî derdixîne pêş û ji netew dewletê ve girê dide, berxwedanake dîrokî ya netewa demokratîk heye. Dîroka çar sed salên dawiyê, bûye şahidê mînakên bi xwîn ên wê ya. Li hemberî feraseta ku hez dike netewê bi riya netew-dewletê bixe “qefesa hesin,” hêmanên demokratîk ên netewê ew 400 sal in li berxwe dide.

Yek ji xerabiya ku modernîteya kapîtalîst li mirovahiyê kiriye; olîkirina cudahiyên netewî û bi derxistina nakokiyên di navbera wan cudahiyan de pêşxistina rewşa pevçûnê ye. Di bingehê wê ya de weke dîrokî di feraseta serdestiyê de, ol tenê weke kirûyeke(diyarok) siyasî bi dest girtin heye. Di

xweseriya demokratîk de feraseta dîrokê, feraseteke çandî û civakî ye. Lewma em ê danxuyakirina Rêbertî ya dibêje "**Divê dîrok bibe civaknasî, civaknasî jî bibe dîrokî"** esas bigirin. Rêberê me bi danxuyakirina xwe ya dibêje **" dîrok niha ye"** rastiya ku di rojaneyî de tê jiyan kirin bi dîrokê re girê dide. Gava ew girêdan tê çêkirin jî, hebûna nirxên çandî yên madî û manewî ku bi guherînê heya roja îro hatine û reng dane jiyana civakî, esas tên girtin.

Xweseriya demokratîk mijarên weke; civakek di kîjan şeran de biserketiye, çend dewlet ava kirine, ji çend gelan re çok daniye erdî, çend împaratoriyên mezin derxistine weke dîroka xwe qebûl nake. Dîroka xweseriya demokratîk, weke kirûyeke ku bi emrê qral û serdestan hatiye çêkirin, nayê bidestgirtin. Lê şûna wê, geşedanên weke civakekê çi qasî hilberandin kiriye, çend gund û bajar ava kirine, bi çend formên civakî re derbas bûye, çi qas huner û zanistî pêşxistiye, li hemberî êrîşên dewlet û deshilatdaran çi qasî li berxwe daye esas digire. Feraseta dîrokê ya xweseriya demokratîk, geşedan û pêkhatinên nirxên demokratîk ên komunal ên dîroka civakî, di nava dem û mekana xwe de digire dest. Têkiliyên civakan ên bi hev re, li gel têkiliyên serdestan ên ku di navbera xwe pêk tînin de bi dest nayê girtin. Wê terzê têkiliyî jî red nake. Lê gengeşî û têkiliyên olî, ziman, çandî, aborî, leşkerî û siyasî yên ku gel bixwe di navbera xwe pêk tînin de, ji serdestan cuda dike û digire dest. Têkiliyên di navbera gelan de bi piranî têkiliyên çandî ne. Mînaka herî xuya ya wê ya; têkiliyên di navbera Kurd-Tirk, Kurd-Fars, Kurd-Ereb, Kurd-Ermen, Kurd- Asûr, Keldan de ne.

Xweseriya demokratîk li gorî wê feraseta dîrokê divê weke projeyeke ku pêwendiya dîrokî ya di navbera gelan de bi hêz dike were dîtin. Pêwendiyên dîrokî yên di navbera gelan de hatine ava kirin, li gorî danehevên çandî yên dewlemend ên netewa demokratîk ji nû ve birêkûpêk dike. Jêderka wê ya roja îro xwe dispêre mîrateya mînakên jiyana civakî yên berê hatine jiyan kirin. Ger di pêvajoya netew-dewletê de li pêvajoyên berê yên dîrokê were nêrîn, dê were dîtin ku têkiliyên di navbera civakan de tu deman sînorên erdnîgariyê qebûl nekirine û ziman û çandên cuda parvekirinên di navbera gelan de asteng nekirine. Di serdema ku forma civakî rewşa xwe ya netewe bi dest xistiye de, weke ku Rêbertî dibêje; bi tesadûfî teqabilê serdema kapîtalîst dike. Moderniteya kapîtalîst, amûrên deshilatdariyê yên pratîk û dezdehî û netew-dewlet bi sînorên ku weke sînorên netewî dane kifşkirin, civak mehkûmê girtîgeheke servekirî kirine. Her wiha ji bo berjewendiya xwe bi awayeke xurt propagandaya wê ya kirin û komkujiya çandî ya herî mezin a dîrokê pêk anîn.

Di serdema pergala kapîtalîzm de yek ji rêderketina herî cidî ku pêkhatiye, girêdaniya civak-erdnîgarî-çandê ji hev qetandin ango tengkirine. Bi wê riyê jî di jiyanê de kesayet û çandeke yekteşeyî hatiye avakirin. Bêguman di nava pêvajoya geşedana dîrokî de civakan ji bo xwe weke welat erdnîgarî desteser kirine. Ew jî ji bo gelan çandeke pêwîst e. Lê belê sînorên welat ber bi “ dîwarên girtîgehê” ve veguherandin, huner û pêkana pergala kapîtalîst û netew-dewletê ye. Sînorên xuyakirî an jî zagonên ku netew-dewletê danîne derbas kirin, li beranberî redkirina

hebûna xwedê ya ku di olan de tê, wê ya jî têkiliyên civakî, bi taybet jî pêwendiya erdnîgarî û çandê xerab kiriye. Her çandek erdnîgariyekî ku xwe dispêrê heye. Li şûna çîtên(perjan) feodal, sînorên netew-dewletê weke dîwarên girtîgehê civak dorpêç kiriye. Di erdnîgariyeke wisa de çand pêşnakeve û ber bi tunebûnê ve diçe. Bi wî awayî rê li ber qutkirina têkiliyên çandî yên di navbera gelan de vedibe û herikîna jiyana organîk a xwezayî tê astengkirin û nakokî di navbera gelan de tê derxistin.

Xweseriya demokratîk bi têkiliyên xwe yên di navbera gelan de sînoran, "dîwarên girtîgehê" yên ku dewletan di nava dîroka xwe de ava kirine, lihevhatin-nelihevhatina siyasî yên di navbera serdestan de her çi qasî bi nedîtî ve neyê jî, esas nagire. Pêwendiya çandî ya di nava civakan de ku li gorî xwezaya jiyana civakî ye, zêdetir rast û demokratîk dibîne. Eger Kurd li ser esasê wan tespîtên bingeh ên xweseriya demokratîk a Kurdistanê pêwendiyên xwe yên heyî re bi gelên ku pê re jiyan dike bigire, dikare yekitiya azad û demokratîk a gelan ava bike.

Tevahiya têkiliya dewletan a ku hem bi gelên ku derdixîne pêş û navên bikar tîne, hem jî bi gelê ku hez dike bike mêtîngeh, li ser esasê mêtîngeriyê ava bûye. Ji gel û heq dûr e. Zordest û redker e. Xwezayiya wan têkiliyên dewletan a bi gelan re, li ser esasê redkirina helwesta demokratîk a gelan ava bûye. Di wê hêlê de nêzîkbûna dewleta Tirk a bi gelê Kurd re, bi cewherî em bi têgehên înkar û tenekirinê rave dikin. Her çi qasî di nava xwe de hin guhertin hebin jî, ew şêwazê têkiliyan di navbera hemû dewlet û gelan de heye. Ji ber wê ya xweseriya demokratîk perspektîfa ku jiyana hevpar a gelan bi hêz dike û qada demokrasiyê fireh

dike, esas digire. Xweseriya demokratîk a Kurdistanê ji bo ku gelên Tirkiyê û tevahiya gelên cîran bi nasname û çanda xwe jiyan bikin, erka xwe ya pêşengtiyê bi cih tîne. Di xweseriya demokratîk de sînorên erdnîgariyî esas nayên girtin. Xweseriya demokratîk xwe dispêre civakên ku li kêleka hev û bi hev re jiyan dikin, jiyana xwe birêxistin dikin û xwe weke îradeyekê îfade dikin.

Di xebatên xweseriya demokratîk de ya ku di qada dîrokê de were kirin ew e ku gelê Kurd bi hişmendiyeke kûr û bingehîn xwe bigihîne dîroka xwe. Ger miletekê dîroka xwe nasnekiribe, hestên wê yên welatparêzî qels dibin, lewma bi qasî ku tê xwestên nagihije hişmendiyeke nirxên nasnameyî. Bi wê rastiyê ve girêdayî pêwendiya dîrokî ya Kurdan a bi erdnîgariya Kurdistanê ve girêdayî ye, dê derkeve holê û di mijara dîroka Kurdistanê de dê tevahiya beşên civakê bigihijine zanebûnê. Di hêla dem û mekan de çanda Kurd di kîjan pêvajoyan de derbas bûye bi belgeyan tê peyîtandin(îspatkirin) û bi wî awayî weke erkekî demokratîk a bingehîn gel tê zanekirin. Li gorî rêgeza “**dîrok niha ye**” divê em weke gel aliyên xwe yên bi hêz û ne bi hêz di nava dîrokê de çawa ava bûne bizanibin. Divê were zanîn ku dîrok tecrûbeyeke ku komî ser hev bûye, lewma em dikarin hêza çareserkirina pirsgirêkên pêvajoya ku em di tê de ne ji dîroka xwe bigirin. Bi taybetî dîrok û çanda berxwedaniya têkoşîna me ya azadiyê ku dîrokê rojaneyî dike, hêza çareseriya her cure pirsgirêkan dide.

Gava ku em pêkhatina çanda xwe bi pêvajoyên dîrokî bigirin dest, dê hem di dîroka gelan de hem jî di dîroka têkoşînên demokratîk de rastiya me ya tevkarî

derkeve holê. Aliyên ku em sereke li ser bisekinin, weke gerdûniya dîroka me ew xal e. Rêbertî “**A ku Kurdî ye, gerdûnî ye”** got. Pêwendiya wê rêgezê ya bi dîroka me ya çandî re her roj zelaltir derdikeve holê. Dîroka me ya gel dîroka azadî, berxwedan, xwişk û biratiyê ye. Mirov dikare bêje ku bi hezaran sala li hemberî pergala şaristaniyê, çand û dîrokeke Kurdan a ku bê navber li berxwe daye û di hin vedoran de di asta pêşengtiyê de rist lîstiye heye. Ew sekn ji ber rastiya dîrokî ya dirêj, di çanda me de rê li ber taybetmendiyeke berxwedêr vekiriye. Wê rastiyê mirov dikare di mêzekirina jiyan û tevgera rojenayî ya mirovên Kurd de bibîne. Hin jî hêzbûna çanda eşîrtiyê, teşeya têgihiştina jinê ya di nava civakê de, zaravayên Kurdî yên dewlemend û folklorîkbûna gel, hin taybetmendiyên sereke ne ku wê rastiyê radixînin ber çavan. Çanda gelê Kurd xwediyê cudakariyeke wisa ye ku jin pêşeng e û şoreşa gund a çandiniyê ya neolîtîkê pêk aniye. Nirxên çanda madî yên ku rê li ber avabûna cudakariyeke wisa vekirine çi ne, divê derkevin holê û di nasnameya xwe de hêzê bidin jiyanê. Di wê hêlê de li gundan, çolteran û çiyayan li Kurdan gerîn a herî rast e. Gelê Kurd geleke çiyayî ye. Şop û bandora wê ya ya li ser çandê û xisletên(karakter) ku ji cewherê xwe derxistine peyda dibin, lewma lêkolînkirin û bi awayeke şênber rojanekirina wê ya girêdayî xebatên dîrokê ye.

Xweseriyên erdnîgariya Kurdistanê bûne sedem ku dîroka civakî di wan erdan de despê bike. Di nava berdevamiya jiyana civakî de gelê Kurd gelek formên civakî girtine. Di esasê xwe de li Kurdistanê cudahiya formên civakî yên diguherin, teşeya nedewletbûna xwe bi awayeke hêz jiyanê dikin. Çanda eşîrtiyê ji bo

wê ya mînakek herî şênber e. Girêdayî vê xisûsê taybetmendiyeke din bawerî û olên li Kurdistanê jiyan dikin û çandên wan ên madî û manewî yên ku wan dide jiyankirin e. Çanda dewlemend a ku nûnertiya mîrateya berxwedaniya dîrokî ya gelê Kurd dike jî, bi wî awayî ava bûye. Di serî de Êzdiyatî û Elewiyatiya Kurd di nav de ku reng didin nasnameya me ya gel, gelek bawerî û çandên din ên cuda hene ku di navbera gel û çandan de rista pirekê dilîzin. Nirxên madî û manewî yên wan çandan jî di bergeha dîroka xweseriya demokratîk de tên nirxandin. Ji wan çandan her yek bi serê xwe ew qas berfireh e ku dikarin di qadên xebatên akademîk de bibin mijara lêkolînê. A pêwîst ew ku tevahiya wan çandan rojaneyî bibin, bi nasnameya xweseriya demokratîk zêdetir hêz bibin û bi rengên xwe derkevin pêş.

Sedema ku gelên din Kurd weke gel nasnekirine, ji ber nêzîkbûna şaristaniya dewletperest a di derbarê Kurdan de ye. Lewma divê li ser bingehê xwişk û biratiyê civak û çanda Kurd li ser dîroka xwe, xwe bi gelên din bide naskirin. Bi taybetî rastiyên dîrokî yên berhem û daneyên ku di encama lêkolîn û vekolandina arkeolojîk de derketine holê, divê ji aliyê her kesekê ve werin zanîn û ew erkeke sereke ya xweseriya demokratîk e. Weke gel taybetmendiyeke girîng a ku dîroka me nîşan dide ew ku, em xwediyê erdnîgariyeke herî kevn a jiyana niştecihiyê û xwediyê çanda herî dewlemen a herêmê ne. Eger nirxên çanda Kurd bê lêkolînkirin û vekolandin, xweseriya ku ewil were dîtin; rastiya gelek nirxên me yên çandî ye ku di cudakariya "despêkê" de ne. Wê ya ji bo çandekê resenbûnek e. Di nava geşedana dîrokî ya çanda Kurd de taybetmendiya herî xuya ya derdikeve pêş,

resenbûna wê ya ku çavkaniyê ji çandên din re dike ye. Bi lêkolîn û vekolandineke rast û têr a dîroka çandekê, dê rastiya çanda Kurd a ku çi daye derve û çi ji derve girtiye, wê derkeve holê. Yek jî sedema spekûlasyona ku li ser nasnameya me ya çandî tê kirin ew ku em dîroka xwe nizanin, sedemeke din a duyemîn jî; nirxên ku em xwediyê wan in dernaxînin holê û girîngiya pêwîst nadin wan. Pêwîst e ku xweseriya demokratîk vê kêmasiyê jî bide derbas kirin.

Di xweseriya demokratîk de mirovê welatparêz çawa ku zimanê xwe dizane, bi heman awayî dîroka xwe jî dizane. Ew di asta rêgezekê de ye. Ew erka welatparêziyê nirxên demokratîk ên komunal ên gelê me derdixîne holê. Erdên welatê me û mîrateya me ya çandî rûxmî ku pir dewlemend e, îro pir kêm mirovên me ji wê dewlemendiyê sûd digirin. Di Kurdan de dîrok û çandê xwe nezanîn zêdetir serwer e. Ji ber redkirin û bişaftina Mêtîngeriyê, wê ya gihiştiye asteke wisa ku kesên ji xwe re dibêjin em hunermend, nivîskar û rewşenbîrên Kurd in jî, ne di hişmendiya wê dewlemendiya çanda dîrokî de ne. Bi xweseriya demokratîk re divê Kurd seferberiya fêrbûn, jiyankirin û danjiyankirina dîrok û çanda xwe bidin despêkirin. Ji bo wê jî bi lez akademiyên dîrokê vekirin, divê weke pêwîstiyeke bingehîn bi dest were girtin. Di vê mijarê de divê dezgehên weşan-çapemeniyê û qada hunerê ji her demê zêdetir rista xwe ya hîndekariyê bilîzin. Di vê mijarê de nivîsandina pirtûkan, amadekirina broşûr û atlasên dîrokê, dayîna semîneran û qadên hunerê yên weke sînema, şano, belgesel, wêne û peykerî zêdetir kartêkerkirin ango bibandorkirin, dê pêwîstiyan di

asteke girîng de pêk bîne. Di vê mijarê de rojanekirina çanda dîrokî û dîroka ku îro jiyan dike bi koka vê re pevgihandin, wê bibe xebateke gelek pîroz.

Weletê me mûzeyeke servekirî ye. Weke avên wê, cihên wê yên dîrokî jî gelek in. Li her derê qadên sît(deverên dîrokî) peyda dibin. Cihên nehatine kolandin, ji cihên hatine kolandin gelek zêdetir in. Berhemên ku herî dawiyê li Girê Xirabreşkê derketine, kûrahî û hêza dîrokî ya bêhempa ya welatê me carekî din nîşan daye. Bi wê hêza dîrokî ya tê jiyankirin re paşdevegerîna me ya rastiyê, tişteke çi qas bêhempa ye nîşanî me dide. Eger em weke gelê Kurd wê paşdevegerîna bêhempa pêk bînin, em bi xwe re çi qas şanaz bin jî dê kêm be. Îro li çar parçeyên welatê me ku weke bakur, başûr, rojava û rojhilat tê dabeşkirin gelek vedîtinên herî kevn hene ku dîrok dane despêkirin. Lê, qedexeya siyasî û mêtîngeriya li ser gelê me, hilberandinên çandê yên ku daneyên şênber ên wê dîrokê ne, bi awayeke tam li xwe mikur nayê ku ew hilberandin ên çand û dîroka Kurdan in. Li ser çand û dîroka me qedexeyek navnetewî heye. Gava ku em bi xweseriya demokratîk netewbûna demokratîk kûr dikin, em li rastî beralîkirina wê qirkirina çandî tên. Lewma divê em ji bo lêkolîn û vekolînên zanistî şert û mercên pêwîst amade bikin. Divê bi dirûşmeya xwedîderketina hemû nirxên çandî, xwedîderketina pêşeroj û paşerojê ye, hestiyariya netewî were pêşxistin. Yek ji xebatê ku bi lez were kirin jî; divê pêşxistina rêxistinkirin û zanekirina hişmendiya parastina cih û berhemên dîrokî be.

Di derbarê dîrokê de xisûseke din a girîng jî, mîrateya çandî ya ku heya niha derketiye holê ye. Ew

mîrate hem a wê erdnîgariyê ye hem jî ya nasnameya me ya gel e, lewma divê ew mîrate were kifşkirin û tomar kirin. Di serî de berhemên ku ber bi Îngiltere, Fransa û Elmanyayê ve hatine revandin, kîjan berhem ji welatê me hatine derxistin û ji bo paşdevegerina berhemên ku hatine revandin, divê rê û rêbaz werin peyda kirin. Dîsa weke tê zanîn; gelek berhemên ku dewleta Tirk di Kurdistanê de derxistine û xwediyê wan Kurd in, hatine winda kirin an jî di cihên gelek veşartî de tên girtin. Di wê mijarên de gelek pêkanên dewleta Tirk ên qirker tên zanîn. Mînak; di demên ewil ên Komarê de wê ya bi destê Mûfetîşên Umumî(Umumu Müfettiş) ku di Kurdistanê de di meşandin û venêrîna polîtîkayên bişaftînê de erkdar bûn, dihat kirin. Ew, bi awayeke herî berbiçav ji aliyê Abidîn Ozmen ê ku weke Mûfetîşê Umumî yê yekemîn ku di sala 1935'an de ji aliyê Îsmet Înonî ve hatibû tayin kirin ve dihat kirin. Nirxên me yên çandî ku li rastî gelek komkujiyên bi wî awayî hatine, ji ber ku careke din dernekevin li ser rûyê erdî, îro jî bi polîtîkaya bendavan(baraj) di bin avê de tên hiştin. Rêxistinbûn û hişmendiya me ya dîrokê divê bizanibe ku bi xeniqandina nirxên me yên dîrokî û çandî, di esas tê wateya daliqandina gelê me, lewma bergiriyên parastinê pêşxistin, erka her kesekê ye. Polîtîkaya bendavan ji bo Kurdan komkujiyeke çand û dîrokê ye. Ji bo xweseriya demokratîk erk û berpirsyariya rojaneyî ya sereke, sekinandina bendavan e. li beranberî bendavan divê projeyên berdîl(alternatîf) ên enerjiyê bên pêşkêşkirin û bikevin dewrê.

Weke mijareke aktûelî(rojaneyî) jî divê navên ku hatine guhertin di dorhêla dîrokê de werin nirxandin. Hem qedexeya ku li ser ziman tê meşandin

hem jî dijminahiya ku li hemberî çand û dîrokê tê kirin, pêkanên faşîzmê ne ku mînakên wê di dinyayê de nînin. Ji nû de bikaranîna navên Kurdî yên ku hatine qedexekirin û guhertin, tê wateya xwedîderketina çand û dîrokê ye. Kurd, di pratîkê de bi awayeke hêsan dikarin wê pêkanê vala derxin, lewma divê bi israrî navên Kurdî(navên gund, bajar, navçe, av, deşt û çiyayan) bikar bînin. Pêwîst e ku bi inyateke mezin Kurd navên zarokên xwe Kurdî deynin û bi taybet tîpên weke Q,W,X bikarbînin. Nivîsandin an jî nenivîsandina wan navan a di fermiyeta dewletê de zêde ne girîng e.

Xisûseke din a girîng jî, divê tevahiya nirxên ku di çeçoveya berhemên dîrokî de ne bi derfetên heyî werin parastin û ji bo wan tedbîrên parastinê werin pêşxistin. Divê girîngiyeke mezin ji bo mûze û pirtûkxaneyan hebe û bi wê girîngiyê divê em nirxên xwe bixin bin ewlehiyê.

### 3- Netewa Demokratîk, Xweseriya Demokratîk û Huner

Huner, qadeke çalakiyê ya înşaya civakî û ji nû ve afirandina çandê ye. Weke ziman huner jî ji dîrok û nirxên çandî ya civaka xwe têr dibe. Huner, bi xisletê(karakter) xwe ve ji her qadê jiyanê re rasterast di nava têkiliyê de ye. Eger em ji qadên ku beşên hilberandina civakî pêk tînin re çandîbûn bêjin, huner bi nirxên xwe yên çandî ve çalakî û hilberandina nûbûnê ya ku herî zêde dide û distîne ye.

Di nava dîroka şaristaniyê de, herî zêde jî di dewra kapîtalîzmê de yek ji qada ku herî zêde hatiye berovajîkirin, qada hunerê ye. Sedema sereke ya wê ya; têkiliya hunerê ya rasterast a bi civakê re ye.

Pergala şaristaniyê rewşa jirêderketina komunalbûna civakî ye. Qadên ku herî zêde ew rewşa jirêderketinê xwe dide der û dibe sedemê bandorên neyînî, bêguman qadên ku taybetmendiyên komunal ên civakî lê bi hêz in. Çawa ku jin di avakirina jiyana civakî de ji ber rista xwe ya pêşengtiyê di pêvajoya şaristaniya çînî de gav bi gav ji jiyanê hatiye qutkirin, huner jî di nava demeke wisa de ji rastiya xwe hatiye dûrxistin. Mixabin îro huner weke amûreke cilvirandina(dejenerbûn) civakî bi destê serdestan hatiye bêbandorkirin û nikare erka xwe bilîze. Sedema din a nakokiya şaristaniya çînî ya bi hunerê re, çavkaniya xwe ji aliyê exlaqî yê hunerê digire. Weke tê zanîn hunerê baweriya xwe bi nirxê ku fikrê jiyana exlaqî ye aniye û weke pratîka yekemîn a fikrê pajirandinê derketiye holê. Jiyana civakî yekitiya exlaqî ye. Rêgezên jiyana civakî rêgezên exlaqî ne. Ango rêgezên ku ji bo jiyanê di asta jêvenegeriyê de ne, kirûya ku jê re exlaq tê gotin bixwe ye. Ji ber ku kapîtalîzm pergalek şaristaniya çînî ya ku herî zêde pêkhateya exlaq belav dike ye, huner di dewra kapîtalîzmê de veguheriye berovajiya hinceta hebûnê.

Huner, qadeke ku bi awayeke herî bi hêz û xweser aliyên çandê derdixîne holê ye. Huner, çanda madî û manewî di nava zimanê xwe yê xweser de vedihûne. Nirxên çandî yên ku dibin mijara hunerê, di zimanê hunerê de ji nû ve tên afirandin. Ji ber wê taybetmendiyê divê herî zêde huner têkiliya xwe bi çand û dîrokê re hebe. Huner, qadeke yekane ye ku dikare duh, îro û sibe di nava hev de bide. Ya ku dibe sedemê berhemeke hunerî bi bandor, mayînde bibe û weke felsefîk bi estetîk bibe, ew aliyê hunerê ye. Huner, di derbarê jiyana civakî û çandî de ya xweşik çi

be, wê tîne ziman. Rêbertî; **"ya ku xweşik e, exlaqî û polîtîk e"** dibêje. Wê gavê mirov dikare bêje ku huner; çalakiya lêgerîn û peydakirina karên herî baş ên civakê û bi awayeke herî xweşik pêkanîna karên civakî ye.

Di xuliqandina civakî de huner di heman demê de qadeke ku herî zêde hest û hişmendî pê divê ye. Rastiya têkiliya gelek kûr a dîrok û çandê ku bi hunerê derpêş dibe, lewma berhemên hunerê bi hest û hişmendiyeke ji rêzê wê nebe bersiv. Ya ku herî baş hest û ramanê hunermend an jî civakekê û pîvanên demokratîk ên jiyanê derdixîne pêş, berhemên hunerê ne. Huner jî weke ziman di tevahiya qadên din ên çandî de xwediyê zerengiyekê(kapasîte) ye ku dikare civakê bi awayeke herî baş derxîne pêş û bide naskirin. Weke şaristaniya çînî(tebeqe) çand û formên civakî yên şaristaniya demokratîk jî xwe di berhemên hunerê de dane xuyakirin. Hilberînên hunerê yên ku em weke hunerên gel dizanin, tevahiya hêmanên folklorîk ên dewlemend ên gelan, nasnameya hunerî ya civaka demokratîk derdixînin pêş. Bi şaristaniya çînî re hêmana sereke ya ku bûye mijara hunerê; berxwedana gelan a li dijî pergala dewletperest û çanda ku di encama wê berxwedaniyê de derketiye holê ye. Huner, li hemberî zilma zaliman mertalê herî girîng ê berxwedana mezlûman e. Lewma di dîrokê de heya roja îro çand-huner li dijî serweran her tim di pozîsyona piştevaniya gelan de bûye.

Di mijara taybetmendiyên pêwîst ên dîroka hunerê felsefeya wê de, di hunermend û berhemên hunerê de gelek xalên berfireh hene ku werin ziman. Estetîka ku di felsefeyê de qadeke bi serê xwe ye, di qada civakî de jî di nava xwesertiya xwe de rewşa xwe

ya heyî ku civakê hembêz dike, derbas dike û ji ber ku bi civakê re “**pêşeroja xweşik”** ava bike, divê xwe bigihîne hêza xwe ya cewherî. Lêgerîneke cuda dê ji bo hunerê bibe sedemê ji hêzketinê û wê nikaribe li pêşberî civakê berpirsyariya xwe pêk bîne. Rewşa ku bi destê hişmendiya serdestan tê jiyan kirin, îxaneteke ku li hunerê tê kirin. Ew hunera ku bi bilêvkirina pîroziyan dest bi meşa riya dîrokî kiriye, divê bi tu awayî vê rewşa bi xerab a ku li ser hatiye ferzkirin qebûl neke. Ew rewşa xerab, teşeyeke din a mirin û tunebûnê ye. Di qirnê ku em di tê de jiyan dikin, yek ji sedema ku jiyana civakî bi qemariyê hatiye pêçan, ew e ku huner “bi destê hin kesên ku navên wan hunermend e ve tê kuştin.” Êdî ji xeynî ku huner xwe ji nû ve vejîne vêdetir, şanseke din nîne. Bi wê vejîne di bicihanîna erka xwe ya bedewkirina civaka ku pê re girêdayî de, berpirsyar e. Berpirsyariya hunerê ya li hemberî civakê, ji rastiya exlaqî ya ku di nava xwe de dihewîne ye tê.

Erka esasî ya hunerê ku bi taybetmendiya xwe ya ji nû ve afirandina jiyana civakî li pêş e, bi awayeke herî balkêş wê di jiyana netewên demokratîk de derdikeve holê. Pêkûtiya feraseta dewletperest a ku netewan dixe cendereyê, çawa ku gelek nirx û qadên çandî tune kiriye, bi awayeke gelek aşkere huner jî tune kiriye. Pîrozî, nepenî û bandora berê ya hunerê hema bêje nemaye. Modernîteya kapîtalîst a ku hewil dide netewa demokratîk bi feraseta dewletperest bike nîjadperest, ji bo deshilatdariya xwe li nirxên çandî yên hunerî mêze nekiriye, li ên ku ji bo dewlet û deshilatdariyê sûdewar in, mêze kiriye. Ew rastî di bin navê hunerê de bûye sedem ku gelek kar weke pîşekarî(sinet) pêş bikevin. Eger qadeke weke hunerê

ji xuliqkariyê dûr ketibe, sedemê wê di kapîtalîzm de dubarekirina şêweyê pîşekariyê ye, ango lasayî(teqlîd) ye. Di avakirina netewa demokratîk de "herikîna robar" a mezin a dîrokê, di esas de wê xwe di hunerê de nîşan bide. Di dema Ronesansa Ewroyayê de kêm be jî gelan xisletên(karakter) xwe yên demokratîk birêxistin kirine û hewl dane ku bibin hêzek, di demên kurt ên beriya şoreşa Fransa û Rûsyayê de, hunera ku rabûye pêdarê(coşbûn) nîşaneya bêhempa ya wê ya ye. Ew bilindbûna qada hunerê ku avabûna netewa demokratîk lê kûr dibe, li Kurdistanê jî gihiştiye derfeta wê derketina dîrokî. Di xweseriya demokratîk a Kurdistanê de divê huner di pêşengbûna Ronesansa Kurd û Rojhilata Navîn de xwe berpirsyar bibîne. Xweseriya demokratîk a Kurdistanê îfadeya nasnameya qada wêje û hunerê ye û bi wê ya xwe digihîne nasnameya xwe ya cewherî. Xwesertiya ku di xwezaya çandan de heye, bi piranî bi saya huner û wêjeyê wê ya didomîne.

Ji ber wê erka stratejîk a ku dikeve qada hunerê, beriya her tiştî li Kurdistanê serkeftina ku ber bi mecraya xwe ve diherike, teqez dike. Bi xweseriya demokratîk hunera Kurd neçare ku nasnameya xwe bi awayeke xuyatir nîşan bide. Riya serkeftina wê ya di hunermendiya ku bîrdozî û felsefeya Rêbertiyê de kûr dibe de derbas dibe. Bi perwerdeyên felsefîk û bîrdoziyî yên hatine berfirehkirin re perwerdeyên pîşeyî(meslekî) pêşxistin û bi pratîkên xurt pêşxistina berheman, nêzîkbûna hunerî ya bingeh a pêvajoya xweseriya demokratîk e. Qada hunerê ji pêvajoya avakirina netewa demokratîk re hem weke çalakvaneke avaker tevlî dibe, hem jî bi xwegihandina rêxistinbûneke berfireh xwe ava dike. Ji bo wê teşeya

tevlibûnê, xebatên akademîbûnê jî weke pêwîstiyeke esasî derdikeve holê. Qada hunerê berpirsyar e ku di çerçoveya rêgezên demokratîk de hemû beşên ku xizmeta nasnameya netewê dikin, bîne li cem hev û sazîbûna xwe kûr bike û bi taybetî di wê pêvajoyê de divê xwe ji feraseta hunera kapîtalîst biparêze.

Parêznameyên Rêber Apo bi qasî manîfestoya civaka demokratîk in, ew qasî jî manîfestoya hunerê ya ku pêşengtiya ronesansa Kurdistan û Rojhilata Navîn dikin in. Ji bo meşeke bi aheng a di riya xweseriya demokratîk de, divê huner û wêje xwe bigihînin kokên xwe û veguherin cewherê xwe yê ku di civakê de pîroziyê diafirînin. Feraseta hunerê ya netewên demokratîk çavkaniya xwe ji çandên gelan û ji berxwedana wan a roja îro digire. Berxwedana gelan a li hemberî çanda şaristaniya çînî(tebeqeyî) refên pêşiyên yên kozikan her tim bûne yên hunerê. Gel, herî hêsan û zû di qada huner û wêjeyê de şaristaniya dewletperest teşîr dike û vala derdixîne. Di hin serdemên dîrokê de sedema şewitandina mirovan û derxistina mirovan a ji welatê wan, bi hêza hunerê û çandeke rast derdikeve holê. Şaristaniyê li hemberî wê hêza bi bandor a hunerê, êrîşa xwe tenê bi rêbazên fîzîkî yên çors(qeba) nekiriye, hêza xwe ya bîrdoziyî û madî jî bikaraniye. Netewa demokratîk û weke pêvajoya wê ya avakirinê xweseriya demokratîk, bi rêxistinbûn û hişmendiyeke bîrdoziyî valaderxistina êrîşeke wisa ya li ser hunerê esas digire. Xweseriya demokratîk a ku rêxistinbûna tevahiya qad û nirxên netewa demokratîk e ku bi rengê xwe derdikeve holê, herî zêde bi rêxistinkirina qadên pêşeng ên weke hunerê pêk tê. Xweseriya demokratîk ciheke sereke dide nêzîkbûna rêgezî ya ku

dibêje; “huner bê bîrdozî, tevgera hunerê jî bê rêxistinbûn nabe.”

Berhembûna fikir û hestên pîroz û bilind ên hunerê, bi teqezî bi xwe re girêdanbûneke bîrdoziyî jî tîne. Hebûna gelek beşên hunerê ku her beşeke hunerê jî di nava xwe de ji yekitiya gelek enstrûmanan pêk tê, rêxistinbûna wê qadê jêveneger dike. Dîsa li kêleka hunerê eger em qadên din ên xebatê ji wê qada çalak zêde bikin, dê bergehek berfireh derkeve holê. Divê ew beş û karên ku qada hunerê çalak dikin di nava xwe de werin organîzekirin. Ango bi gotineke din; çawanî û çendaniyek ku koordînekirina wê organîzasyonê derbas dike, derdikeve holê. Ew jî rêxistina hunerê ye. Divê her xwecihiyeke li gorî xwesertiya xwe ya dîrokî û çandî bibe xwediyê sazî, komele û akademiyên pêwîst ên hunerê. Bi wan sazî û dezgehan, qada hunerê wê veguhere civatek ku hejmara wê digihije bi hezaran kesan. Di tevahiya qadên hunerê de afirandina kesayetên azad ên demokratîk, wê bi xwe re qadeke hunerê ya ku vediguhere tevgereke çandî û hunerî ya ku heqîqeta hunerê derxîne holê. Ew taybetmendiyên ku hatine xuyakirin nîşan didin ku huner bê rêxistin nabe. Kesên ku hunerê bêrêxistin dikin, ew kes in ku yên huner û nirxên hunerê difiroşin. Ew, feraseta şaristaniya dewletperest û çanda deshilatdariyê ya hunerê ye. Xweseriya demokratîk pêşxistina tevgera hunerê di bîrdoziyê de dibîne û rêxistinbûnê weke riya ku dimeşe dibîne û li ser wê esasê digihije biryaran.

Di xweseiya demokratîk de huner elît(di destê komeke biçûk ên sermayedar an jî deshilatdar de) nabe. Hunermend nikare di jor de li civakê binêre. Di

pergala xweseriya demokratîk de parvekirina hilberandinên hunerê jî ne weke ya pergala kapîtalîst e. Bi cewherî ew hilberandinên hunerê yên bi bandor, nabe ku ji civakê dûr bên xistin û bi avakirina bendên di navbera hunermend û civakê de, bi pêşbirkên propagandayên xurt ên wurşedar(şatafatî) ku di bin dirûşma "bila berhemên hunerê bi bandor bin, em nirx didin hunerê" tên pêşkêşkirin de, bê wate ne. Wê ya pêşkêşkirina hunerê ya bazarê ye. Huner, wijdana civakê ye. Lewma xweseriya demokratîk destûr nade ew hunera ku dengê wijdanê ye derkeve bazarê. Xweseriya demokratîk a ku hunerê weke pêwîstiyeke jiyana civakî dibîne, hişmendiya " li her derê huner" esas digire. Di heman demê de feraseta hunerê ya çandên gelan, li hemberî şaristaniyê berxwedanê temsîl dikin. Di ala felsefeya hunerê ya di mertebeya netewa demokratîk de rêgeza ***" ya ku şer dike azad dibe, ya azad bedew dibe, ya bedew tê hezkirin"*** hatiye nivîsandin. Bi wê nêzîkbûna estetîk, berhemên hunerê yên herî bi bandor ên serdema me, wê riya jiyana komunal a demokratîk nîşanî mirovahiya ku ketiye kaosê bide. Ew, di heman demê de kesayetên ku kapîtalîzmê kirine dilkevir û çavkor, wê bi ûtopya bike û di avakirina hunera netewa demokratîk de wê bike xwediyê ferasetek bi hêz.

Bêguman pergala kapîtalîst huner xistiye asteke jêr a ku pê dilîze. Ew, mertebeyeke ku qutbûna hunermend û hunerê ya ji civakê nîşan dide. Di xweseriya demokratîk de huner; hêzkirina hevgirtina civakî, di ruh û hestên hevpar de motîvekirina civakê û li hemberî rewşên ku ji derveyî vînê pêk tên û gelek bi dilşewat in, teseliyê(dilxweşiyê) dide. Her wiha huner, ji bo ku mirovahî ji hêz û bedewiya xuliqkariya

xwe bihese, tê pêşxistin. Coşa ku huner di fikir û hestê mirov de diafirîne, tenê weke kêf pênasekirin û wê ya jî ber bi sektorekê ve veguherandin, êrîşeke herî mezin e ku li mirovahiyê tê kirin. Her qada ku huner xwe digihîne civakê, weke cihên xwe îfadekirina hunerê nirxandin, ji bo rêxistinkirinek terzê tevgera hunera demokratîk û ji bo yekitiya hunermendên ku wî karî dikin pêwîstiyek e. Xweseriya demokratîk projeyên ku wan pêwîstiyan pêşwazî dike, pêş dixe. Di nava ahengek hunerî de vehûnandina civakê ya bi huner û hunermendî re, di nava têkoşîn û şertên pergala xweseriya demokratîk de pêk tê.

**Weke Encam;**

Di çerçoveya projeya xweseriya demokratîk de şaxa(bûut) çandê ya ku hêmaneke bingehîn e, weke qadên ziman, dîrok û hunerê di nava xwe de dihewîne û qadeke bingehîn e ku cewher, armanc û rengê wê projeya jiyanî pêk tîne ye. Ew nirxên ku di nava wê projeyê de têne pênasekirin, xwesertî û reseniyek xwezayî rave dikin. Ew taybetmendiyên wê, dê bibin sedem ku hem xweseriya demokratîk hêz bibe, hem jî li gorî xisletên xwe erka xwe ya esil a civakî di nava pergala xwesertiyê de pêk bîne.

Di projeya xweseriya demokratîk a Kurdistanê de armanca şaxa çandî di esas de li hemberî qirkirina çandê ya li hemberî gelê Kurd pêk tê û civakê bi vîn, zana, rêxistinkirî û berxwedêr dike. Di çandên gelan de hebûna nirxên mayînde yên ku îfadeya xisletên berxwedêriyê ne, bi xweseriya demokratîk re derbasî xisleteke bi hêztir dibin û bi nirxên nasnameya gel rojaneyî dibin û xwe dihinînin kûrahiyê. Çand, di heman demê de kesayetî ye. Şaxa çandê, rastiya ku bi

têkoşîna gelê Kurd derketiye holê û di nirxê dîrokî de xwe gihandiye nûnertiya kesayetiyan, projeyeke ku di her qada jiyanê de weke çand mayîndebûnê pêk tîne ye.

Bi xweseriya demokratîk wê gelê Kurd zêdetir nêzî azadiyê bibe. Bi wê projeyê di pêkanîna yekitiya netewa demokratîk de wê gaveke girîng were avêtin. Şaxa çandê ya projeya xweseriya demokratîk di hest û fikirê avakirina yekitiya gelan de, wê risteke berfireh û girîng bilîze. Xîmê yekitiya me ya netewa demokratîk bi şaxa çandî pêkan e. Qada huner, dîrok û ziman ku şaxa çandî pêk tînin, pardara hevpar a tevahiya civatên netewa demokratîk a Kurd in. Şaxa çandî ya ku civatên netewa demokratîk bi awayeke gelek rehet li dor tên cem hev, ji bo derxistina holê ya nasnameya Kurd qadeke ku sûxreyek(xizmet) mezin pêk tîne.

Xweseriya demokratîk a Kurdistanê li dijî hilweşandin, talan, bişavtin(asîmîlasyon) û diziya ku li ser çanda Kurd tê kirine. Ji ber ku gelê me li hemberî dîrok û çanda xwe qelsiya esasî ya biyanîbûnê jiyan dike, hebûna gel di bin polîtîkayên mêtîngeriyê de bê parastin maye. Wê rewşê rastiya me ya gel a ku xwediyê çandeke gelek bi kok e, veguherandiye pirsgirêkekê. Gelê Kurd ê ku bi wê projeyê bi hêz dibe, wê hem di nava xwe de yekitiya xwe ya netewî pêk bîne, hem jî li ser bingehê jiyana xwişk û biratiyê ya bi gelan re, wê pêşengtiyê bike.

## ŞAXA DÎPLOMASÎ YA XWESERIYA DEMOKRATÎK

**"Şaxa Dîplomasiyê ya Xweseriya Demokratîk:** Ew jî têkiliya Kurdan a bi gel û civakên din re digire dest. Bi welatên cîran û Kurdên bi parçeyên din re têkilî çêdibe. Em bi civakên din re têkiliyeke çawa dixwazin, em ê bi wan re çawa jiyan bikin? Şaxa Dîplomasiyê wê ya pêşwazî dike." **Rêber APO**

Ji bo dîplomasiyê gelek pênase hene. Weke ku para rastiya wan pênaseyan heye, aliyên ku dîplomasiyê tînin ziman hene. Wê ya aliyên ku têkiliya dîplomasî û hêz, dîplomasî û feraseta stratejîk, dîplomasî û vîna siyasî, dîplomasî û daneheva dîrokî hwd. derdixîne pêş in.

Di nava wê ya de pênaseyên weke; 'dîplomasî şerê bê çek e' an jî 'dîplomasiya şer a bi çek tê kirine' yên herî li pêş in. Kesayet û saziyên ku ji bo xebatên dîplomasiyê hatine erkdarkirin, ji bo berjewendiyên hêzên ku pê re girêdayîne biparêzin, vîna xwe ji aliyê dijber an jî ji aliyên din bidin pejirandin, bi pêveberdana(tawîz) herî kêm sûdeke herî zêde bigirin û hwd. tevahiya hevdîtinên ku dikin û xebatên cuda yên ku dimeşînin, bi awayeke giştî di bergeha mijara dîplomasiyê de ne. Têkiliyên bi gelan re, propaganda, danasîn, xebatên lobî hwd. di vê bergehê de tên nirxandin.

Gava qala dîplomasiyê tê kirin, zêdetir têkiliyên di navbera dewletan de tên bîra mirov. Lê bi taybetî kûrewiya ku pêncî salên dawiyê pêş ketiye, geşedanên di asta şoreşê de yên ragihandina girseyî bûye sedem ku dinya weke gundekê biçûk bibe. Di encama wê ya de her çi qasî naveroka dîplomasiyê weke xwe mabe

jî, di bergeh û aktorên wê de guhertinên cidî çêbûn. Mînak; şîrketên navnetewî, rêxistinên girseyî yên demokratîk, sendîka, rêxistinên derveyî hikumetan, tevgerên rizgariya netewî hwd. û hema bêje her sazî, xebat û têkiliyên dîplomatîk ên legal-îllegal pêş dixin. Ji ber wê mirov dikare bêje ku; dîplomasî êdî di yekdestiya dewletan de derketiye. Bêguman ew rewş nayê wateya ku dîplomasî di navbera dewletan de rabûye ango di serweriya wan de nîne. Dîplomasî bi giraneyî hin jî di serweriya dewletan de ye û di navbera wan de tê kirin. Bes, dîplomasî weke xebateke ku tenê dewlet dimeşînin an jî xebateke ku tenê di bin serdestiya wan de ye, derketiye.

Eger dîplomasiya di navbera dewletan de tê kirin weke armanca çareseriya pirsgirêkan were fikirîn, wê ya xapandineke cidî ye. Bi taybetî grupên sermayedar û dewlet pirsgirêkên ku heznakin çareser bibin hene. Eger dest ji gelan û civakan were berdan, pirsgirên di navbera wan de çi qasî kûr, berfireh û giran bin jî, wê di navbera xwe de teqez riyeke çareseriyê peyda bikin. Di rewşên wisa de hêzên nûnerên sermayeya global, yekdestên sermaye û deshilatdarî bi dîplomasiya fermî ya ku dixin dewrê hem xwe wisa nîşan didin ku pirsgirêkê çareser dikin ku rayagiştî jî dixapînin, hem jî derfetên çareseriya pirsgirêkan ji holê radikin.

Di roja me ya îro de gelek mînakên wisa hene. Her du pirsgirêkên dîrokî yên Kurdistan û Filîstînê, ne tenê Rojhilata Navîn û gelên pêwendîdar, di asteke girîng de dinyayê jî bi bandor dikin. Çareserbûna her du pirsgirêk jî ya bi rêbazên siyasî yên demokratîk ên di navbera gelan de, bi rêzgirtina li hemberî hev û bi yekitiya azad a li ser bingehê naskirina netewî, civakî

û nasnameyî, ji aliyê yekdestên sermayeya kûrewî û deshilatdariyên netew dewletan ve tê astengkirin. Ji ber wê hin cihan dîplomasiya di tewereya(eksen) dewletê de, hin cihan jî komkujî û bişavtinê dixe dewrê. Ristlîstineke wisa bi xerab a dîplomasiyê jî, rûyeke din a mîsyona ku yekdestên sermaye û deshilatdar didin dîplomasiyê ye.

Ji ber wan sedeman di wê qadê de pêşxistina xebatên serkeftî ya kesên tên pêpeskirin a kesên ku di bin zilm, zordarî û mêtîngeriyê de ne û ya civatên gel, bûye sedem ku dewlet bitirsin. Hegemonya kapîtalîst ji ber ku xebatên civakan, beşên gelan, tevgerên siyasî yên civakî, rêxistinên girseyî yên demokratîk û hwd. ên wê qadê asteng bike, her cure rê û rêbazan bi kar tîne. Bi taybetî jî pêşxistina têkiliyên dîplomatîk ên di navbera gelan de ku bê dewletan tên meşandin, her wiha pêşxistina xebatên rêxistinên civaka sîvîl ên bi hev re û yên ku bi derdorên têkildar re dimeşînin, qadên dewletan ên ku lê bandor in, sînordar dike. Ji ber ku bi riya dîplomasiyê riya xwe tevlîkirina çareseriya pirsgirêkan a civatên gel, rêxistinên parastina mafê mirovan, rêxistinên mirovî û pîşeyî yên sînornenas vebûye, kar û têkiliyên dewletan ên ku li dijî berjewendiya gelan pêşdixistin, zehmet bûye. Rewşeke wisa jî tu dewlet heznakin ku pêk were. Lewma pêşnexistina hevgirtin, têkilî û yekitiya çalakiyan a ji derveyî dewletan, ango ji ber ku rewşeke wisa di kontrola dewletan de dernekeve, her cure rê û rêbazan diceribînin. Ji rişwetê bigir heya gefan, bi rêbazên cuda ji hewldanên beralîkirinê bigire heya girtinan û heya kuştina kesên ku di wan xebatan de cih digirin, her rê mubah(destûre) tê dîtin.

Îro beşeke girîng a rêxistinên ku di qada navdewletî de bi rehetî kar dimeşînin û di statûya Rêxistinên Derveyê Dewletê(RDD) de ne ku hejmara wan bi hezaran kes in, divê were zanîn ku ji girêdayî rêxistinên îstixbaratî pêk hatine. Bi riya rêxistinên ku bi destê îstixbaratên dewletan hatine avakirin an jî rêxistinên ku xistine bin destê xwe, ew qad ji gelan, ji nûnerên civatên gelan, ji rêxistinên girseyî yên demokratîk û ji tevgerên rizgariya civakî û demokratîk tê girtin.

Ruxmî tevahiya dorpêçkirinên wisa, ma gelo dibe tevgerên demokratîk, tevgerên rizgariya civakî, rêxistinên mafê mirovan, rêxistinên mirovî û pîşeyî yên sînornenas wê qadê biterikînin? Bêguman helwesteke wisa wê li kêrî xwestekên yekdestên deshilatdar û sermayeyê were. Organîzasyonên ku navên wan derbas dibin, pêwîst e ku di hişmendiyeke wisa de bin ku vê qadê ji yekdestên deshilatdar û sermameyê re nehêlin. Li dijî sermayeya kûrewî her çi qasî tevgera demokratîk a kûrewî di navbera xwe de pêwendiya organîk saz kiribe û di asta kûrewî de xwe gihandibe rêxistinbûneke avaniyî jî, qada dîplomatîk bi temamî ji yekdestên deshilatdar û sermayeyê re nehiştiye. Lê divê were zanîn ku di nava vesaziya lewaziyeke gelek cidî de ye.

## Dîplomasiya Ji Derveyî Dewletê

Xweseriya demokratîk ji dewletê qutbûn nîne, berovajiya wê dewletê ji hêja pirsgirêkên demokratîkirina civakê ve nermkirine, bi wî awayî navendperestiya ku rêbaza wê ya yekperest û tekedestiyî heye û gelek bi qirase(xantal) ye, ber bi navendparêziya ademî ve qels dike. Ango erkên netew dewleta

yekperest, yekedestî an jî erkên navendê bi cihiyên(xwecihî) civakê re, bi beşên cuda yên civakê re parvekirine. Pêşîvekirina xwe bixwe ya rêvebirina civakê ye. Ji her beşên civakê yên weke nasname, cins, ol, mezhep, pîşe(meslek) û hwd. bi riya nûnerên xwe yên cihî an jî xwerêvebirina rasterast a xwe tevlîkirina pêvajoyên biryarê ye. Ango bi kinahî di cihî de û rasterast pêkanîna demokrasiyê ye.

Ji bo wê jî di xweseriya demokratîk de xislet (karakter), armanc û hedefên dîplomasiyê, wê ji dîplomasiya klasîk a tê zanîn cudatir be. Beriya her tiştî wê ne di terzê dîplomasiya dewletê ya klasîk an jî ya navdewletî de be. Wê dîplomasiyek be ku tim di xizmet û bihêzkirina avakirina jiyana hevapar, hevgirtin û şertên xebatê ya di navbera gelan de be. Eger bi teqezî navek li wê ya were kirin; mirov dikare jê re dîplomasiya gel an jî dîplomasiya gelan bêje.

Pêwîst e ku mirov qala pêwendiya wê dîplomasiyê ya bi feraseta stratejîk, vîn û hêza siyasî re bike. Di plana pişt de dîplomasiyek ne xwediyê ferasetek stratejîk, vîn û hêzeke siyasî be, ji xeynî îstîsnayên konjoktûrel ne pêkane ku bigihije serkeftinê.

Xweseriya demokratîk; ji netew-dewleta ku çar sed sal in li serê dinyayê bûye bela û bi tu awayî ne li gori xwezaya Rojhilata Navîn e û ji yekdestên deshilatdariyê rizagarbûne û rasterast vekirina riya pêşxistina demokrasiyê ye. Lewma arastebûna stratejîk a xweseriya demokratîk rêveberiyek ne dewlet e, her çi qasî bi dewletê re lihevhatin pêk were jî, dewletbûnê nake armanc. Ango rasteras xwe bixwe birêvebirina civak û beşên civaka exlaqî û polîtîk e. Ji ber wê; di tevahiya têkiliyên xwe yên dîplomatîk de

ne dewletbûnê, afirandina rêxistinbûna cewherî ya gel û civakan û li ser esasê wekheviyê di nava cudahî û demokrasiya rasterast de pêwendîbûna gel û civakan esas digire û ji ber ku bi vîna xwe ya azad tevlî organîzasyonên hevpar bibin, rêveberiya xwe bixwe ya gel û civakan esas digire. Dîplomasiya ku di pişt de feraseteke wisa ya stratejîk nebe, bi navê çi tê kirin bila were kirin, nabe dîplomasiya xweseriya demokratîk an jî dîplomasiya gel.

Bêguman têkiliya wê dîplomasiyê dê bi dewletan re hebe. Di wan têkilyan de armanca bingehîn dewlet an jî dewletan ber bi demokasiyê ve guherandine, bi qasî ku vîna xweseriya demokratîk qebûl dikin, xweseriya demokratîk jî dê vîna dewlet an jî dewletan qebûl bike, bi qasî ku ji hiqûqa xweseriya demokratîk rêz tê girtin, xweseriya demokratîk jî dê ew qasî ji hiqûqa dewletan re rêzdar be. Bi wî awayî di nava cudahiyan de li ser esasê wekheviyê şertên bi hev re jiyan kirinê derdikevin holê. Weke din pêkanîna rewabûna xweseriya demokratîk wê zehmet be.

Heman tişt, di heman çeçoveyê de ji bo pergala navnetewî, ji bo têkiliyên organîzasyonên weke Miletên Yekbûyî(MY) û Yekitiya Ewropa(YE) jî derbasdar e. Ango saziyên navnetewî yên weke MY, YE û hwd. bi qasî ku hiqûq, vîn û rewabûna xweseriya demokratîk qebûl dikin, dê xweseriya demokratîk jî ew qasî hiqûq, vîn û rewabûna wan saziyan qebûl bike.

Feraseta stratejîk a dîplomasiya ku dê xweseriya demokratîk bimeşîne, di vê çerçoveyê de ye. Mirov dikare vê çerçoveyê ji erdzemîna navnetewî ya herî

berfireh bigire, heya yekeyên civakê yên herî biçûk teng û fireh bike. Di mehûyan de jî perspektîfa stratejîk a bingeh dê wisa be.

Bêguman ji bo dîplomasiyek bi tendurist feraseteke stratejîk tenê têrê nake. Pêwîst e ku hebûna vîneke siyasî ya ku bi plansaziyên rojane, demkî û demdirêjî wê feraseta stratejîk dixe jiyanê hebe. Qesta me ya vîna siyasî, di wateyeke teng de hebûna hêza hikumetekê yan jî ya rêveberiyekê nîne. Îro bi dehan hikumet, dewlet, hwd hene ku ne xwediyê vîneke siyasî ya serbixwe ne. Vîna siyasî ya ku em qala wê dikin; rêveberiya pêkhateyên xweseriya demokratîk a ku bi vîna xwe ya azad ava dike ye. Ew rêveberî li hemberî beşên civakê yên ku ji bo wan ketiyê binbariyê berpirsyar e, lewma hemû hêz û erka xwe ji civakê digire û bernameya xwe ya xebatê bi civakê dide erêkirin. Wê hesabê bide pêkhateyên xweseriya demokratîk ku di hemû xebatan de ji hêla wê pêkhatê ve hatine erdarkirin. Hişmendiya vîneke siyasî ya xweseriya demokratîk ku di rewşên nûnertiya qels ji erkê digire û hesab dipirse heye. Weke vîneke siyasî ku ji derveyî pêkhateyên xweseriya demokratîk xwe li hemberî tu hêzekê “deyndar” nabîne, berjewendiyên xweseriya demokratîk a nûnertiya wê dike li ser her tiştekê de dibîne.

Xisletê(karakter) giştî yê dîplomasiyê; pêwîstiya xwe tim bi hêzê heye. Dibe ku ew hêz tenê ne leşkerî an jî aborî be. Gava ku di pergala navnetewî ya heyî de qala hêzê tê kirin, gelemperî hêza aborî, siyasî û leşkerî tê bîra mirov. Bêguman ew rewş ji ber rastiya roja me ya îro derdikeve holê. Di xweseriya demokratîk de jî ew “hêz” weke mecbûrî hene. Lê

parametre û çavkaniya hêza wê ya bingehîn jî, wê ji parametre û çavkaniya hêza ku modernîteya kapîtalîst afirandiye cudatir be.

Çavkaniya hêza bingehîn a dîplomasiya xweseriya demokratîk, wê hêza cewherî an jî hêza rêxistinî ya pêkhateyên xwesertiyê ya ku nûnertiya wan dike be. Nîşaneya hêzê, wê ne yekîneyên leşkerî, hejmara pare ya di bankayan de û wurşedarî(şatafatî) be, wê daneheva civakî ya dîrokî, hêza gel ya birêxistinkirî û sekna siyasî ya bi saxlem be. Wê di polîtîkayê de nerm û ber bi lihevhatinê ve vekirî be, lê di rêgezan de wê xwedî sekn û bêtawîz be. Hêza ku nûnertiya wê dike, bi gotina Rêber Apo: " Hêza ku dinyayê têk bibe hebe jî êrîş nake, ger tevahiya dinyayê jî di ser de were, hêzek e ku wê li berxwe bide." Lewma bi vê zanebûnê tevdigere û wê bi saxlem bisekine.

Di bingehê wan sê kirûyên(diyarok) ku me bi kurtasî anîn ziman de, bi hişmendiyeke kûr a nirxên giştî yên paradîgmaya nû an jî yên felsefîk û bîrdoziyî, di her cure nîqaş û nêrînan de bi xwe bawer e, bi seknek hevgirtî û saxlem pêwîstiya xwe bi tu hêz an jî parametreya hêzê nîne.

Piştî diyarkirineke wisa ya kurt, niha jî em hinek li ser pêkanên wê yên qada şênber bisekinin.

**1-Dîplomasiya Netewî:**

Kurdistan, ji derveyî xwestek û vîna gelê Kurd û gelên Kurdistanî di pêvajoya hevparkirina Rojhilata Navîn a emperyalîst de, di navbera çar dewletên mêtînger de parçe bûye. Rêber Apo ew rewş weke "Dafika Kurd" pênase kiriye. Di nava parçebûneke wisa de , pêkanîna yekitiya netewî ya Kurdistanê û netewbûna demokratîk armanceke esasî ya Kurdan e.

Kurd, di konjonktûra dinyayê ya niha de, ne ku ji ber zehmetiyên guherandina nexşeyên siyasî, ji ber ku bi lîstina sînorên ku xwe dispêrên bingehê netew-dewletê dê rê li ber netew-dewletokên nû, ku bingehê tevahiya pirsgirêkan in veke û bê ku bi dewletên unîter(yekpare) re bikevin pevçûnê, rê û rêbazên pêkanîna yekitiya netewî digerin. Ew lêgerîn yek ji rojeva bingehîn a Kurdan e. Ew jî bi pêkanîna kongreya netewî pêkan e. Ango bê ku bi sînorên heyî re were lîstin, ji gundik, gund û taxan bigre, heya bajar û herêman gel û beşên civakê li ser esasê ocax, komun, meclîsên taxan, meclîsên navçe, bajar û herêman rêxistinkirin û bi dezgehên rêveberiya xweser, pêkanîna xwe bixwe birêvebirin esas e. Bi heman awayî ew rêxistinbûnên ku di her çar parçeyan de pêşdikevin, bi awayeke konfederal bi hev re girêdan, avakirina Kurdistana azad teqez dike.

Di rewşeke pêkanîna kongre-konferanseke netewî ku bi wê armancê kilîd bûye, kongre-konferanseke wisa dê bi xwe re hin sazîbûnên netewî jî ava bike. Meclîseke netewî, konseyeke netewî (navên cuda jî dikare were bikaranîn) ya ku hêza rêveberiya wê ya ye, dê bibe rojev. Bêguman di sazîbûneke wisa ya netewî de, wê di asta nûnertiya navnetewî de komîteyeke dîplomasiyê ya netewî jî hebe.

Di rewşa heyî de têkiliyên navnetewî yên rêxistinên Kurdan ên çar parçeyan û Herêma Kurd a Federe ya Başûr hene. Hema bêje tevahiya organîzasyonên Kurdan bi tevahiya dinyayê re têkiliyên dîplomatîk hene. Lê mixabin têkiliyên wan ên bi hev

re gelek bi sînordar in. Ew jî encama polîtîkayên emperyalîstan a “par bike-birêve bibe” ye. Lê divê bi teqez wê ya were derbaskirin.

Kongre-konferansa netewî ya Kurd yek jî ji ber wê sedemê pêdiviyek e. Ew kongre-konferans despêkê wê têkiliya di navbera Kurd û gelên Kurdistanê de birêkûpêk bike û bigihîne asteke xuya. Di têkiliyên di navbera Kurd û gelên Kurdistanê de, di tevahiya pirsgirêkên ku derdikevin de tundewarî tê redkirin û bi riya diyaloka demokratîk çareserî dibe biryar. Bi heman awayî dê saziyên netewî ku venêrîna wê ya dike û di asta rêgezî de biryarên wê ya digire, ava dike.

Weke berdevamiya wê ya jî, di nava xwesertiya tevahiya pêkhateyan de xebatên dîplomasiyê yên tên meşandin red nake, lê di mijarên netewî de wê tenê saziyeke nûner a dîplomatîk jî pêk bîne. Wê bibe saziya dîplomasiya netewî ya ku çeçoveya erk û berpirsyariya xwe ji meclîsa netewî digire ku li hemberî wê meclîsê berpirsyar e. Di mijarên ku berjewendiya tevahiya netewê, gelê me yê par parçeyan û gelên Kurdistanê eleqedar dike de, di tevahiya platformên navnetewî de, dê ev sazî bibe saziya nûnertiyan erkdar. Ango her rêxistin, eşîret û şexsiyeteke Kurd, di her têkiliya pêş dixe de, tenê dikare nûnertiya kesayetiya xwe ya taybet û hikmî bike. Erkê ku nûnertiya tevahiya Kurdan an jî gelên Kurdistanê dike, wê di xwe de nebîne. Ew erk, wê tenê di vê komîteya dîplomasiya netewî de be. Her tevgereke berovajiya wê ya, dê di nava pîvanên demokratîk de danekirineke(mueyîde) wê hebe.

Pêwîst e em careke din dubare bikin ku; ew sazî jî wê tevahiya erka xwe ji meclîsa netewî bigire û dê di tevahiya xebatên xwe de li hemberî meclîsa netewî berpirsyar be û hesabê bideyê. Wê dîplomasiyek vekirî ya ku taktîk, stratejîk û rêgezên wê hatine diyar kirin û çerçoveya wê hatiye xêzkirin, esas bigire. Şefafbûn yek jî prensîpên bingehînê yên wê ne.

## 2-Dîplomasiya Kurdistana Xweser a Demokratîk a Bi Pêkhateyên Parçeyan Re:

Li Bakurê Kurdistanê xebatên ragihandina xweseriya demokratîk bi hemû leza xwe ve didome. Bi esasî ya ku dê were kirin, ji hêla pergalî ve ya ku dê pêk were; ji rayagiştî ya netewî û navnetewî re rahihandina xweseriya demokratîk e.

Em di nava pêvajoya çareseriyê ya ku bi dirûşma "Tirkiya Demokratîk, Kurdistana Xweser" tê îfadekirin de ne. Di merheleya heyî de komara Tirkiye yan dê vîna netewî û li ser bingehê cudahiyan wekheviya gelê Kurd qebûl bike û bi hatina xwe ya çareseriya demokratîk dê maf û azadiya gelê Kurd bixwe bin ewlehiya makezagonî û xwe demokratîk bike, yan jî bê ku bendewariyek gelên Kurdistanî ji dewletê hebe, bi pratîkirina çareseriyên xwe dê Kurdistana Xweser bi hemû saziyên wê ve ragihîne û çareseriya xwe pêk bîne. Ji xeynî wê ya riyeke din a cuda nemaye. Gelo ew pêvajo dê bi tundiyê yan jî bi diyaloga demokratîk pêk were, girêdayî nêzîkbûna dewleta Tirk a vê mijarê ye. Rêbaza ku dewlet tercîh dike, bêguman hem bi erênî hem jî neyinî dê bergeha xweseriyê û asta têkiliya gelên Tirkiyê ku dewleta Tirkiyê jî di nav de ye, wê bandor bike.

Despêkê Herêma Federal a Başûrê Kurdistanê di nav de wê têkiliya dîplomasiyê ya Kurdistana xweser a demokratîk, bi tevahiya parçeyan re hebe. Eger ew têkilî li ser bingehê hêza cewherî pêşbikeve, divê Kurdistana xweser a demokratîk bi pêkhateyên parçeyên din re, di pêşxistina dîplomasiyek asta netewî de rist bilîze. Her wiha eger têkiliyên dîplomasiyê yên pêkhateya Başûr ne li ser bingehê heza cewherî û dînamîkên hundirîn bin û li ser bingehê polîtîkayên herêmî û hevkartiya hêzên derve pêşbikeve, wê nikaribe di pêşengtiya pêşxistina dîplomasiye netewî de û di parastin û pêşxistina deskeftiyên netewî bike de rist bilîze. Di parçeyên din de jî hêj geşedanek şoreşgerî ku bikaribe berpirsyariyeke wisa ya giran bigire li ser xwe, nayê dîtin. Ji bo Kurdistanê rewşa şoreşê bi awayeke aşkere û tûj, bi esasî di Bakur de tê jiyan kirin. Lewma îro di têkoşîna konfederalîzma demokratîk de herî zêde şoreşa Bakur dikare rista pêşengtiyê bilîze.

Mirov dikare mebest û armanca bingehîn a dîplomasiya ku bi pêkhateyên parçeyan re were meşandin, wisa rêz bike:

**a)** Bi Rêveberiya Herêma Kurd a Federe ya Başûrê Kurdistanê re têkiliyek dîplomatîk a ku demokratîkbûn, şopandina polîtîkayên netewî ku parastin û pêşxistina deskeftiyên netewî esas digire, hevgirtin û hevkariya di navbera Kurd û gelên Kurdistanî de dike armanc û di nava hev de pêşxistina têkoşîneke demokratîk esas digire. Wê rê nede pêpeskirina tevgerên demokratîk ên ku di wê parçeyê de pêşdikevin, zêdetir dê hewl bike ku riya wan veke û bi wan re têkiliyê pêş bixe. Li ser bingehê yekitiya demokratîk û azadiyê, têkiliya bi meclîs, rêxistinên

girseyî yên demokratîk, rêxistin û yekayên pîşeyî ku li ser bingehê wekhevî û rêzgirtinê tevdigerin, esas digire. Di nava eşîretên hevpar de ku xwediyê hejmareke girîng in; yekbûna hêzê, hevgirtin û yekitiyê esas digire.

Weke şênber parlementoya Kurdistanê; Yekitiya Parlementerên Kurdistanê, Yekitiya Baroyan, Sendîkaya Rojnamegeran, Yekitiya Çotkaran, Yekitiya Nivîskarên Kurdistanê civatên gel ên weke Êzîdî, Kakayî, Şebek, Kelhûr, Kurdên Feylî û Hewreman, Asûrî-Sûryanî-Keldanî hwd. û bi partiyên siyasî, rêxistinên civaka sivîl û civatên olî re, di çerçoveya ku hatiye xuyakirin de pêşxistina têkilî û hevgirtinê esas digire. Tevahiya wan beşan weke dewlemendiya Kurdistana Xweser a Demokratîk dibîne û deskeftiyên xwe weke deskeftiyên wan beşan dipejirîne. Di têkiliyên xwe de li gorî esasên konfedralîzma demokratîk tevdigere.

**b)** Rojhilatê Kurdistanê hem di aliyê erdnîgarî hem jî di aliyê gelheyê(nifûs) de duyemîn parçeyê mezin ê Kurdistanê ye. Ji wê hêla xwe ve ciheke xwe yê girîng heye. Bi qasî di demokratîkirina Îranê de, di demokratîkirina Rojhilata Navîn de jî dikare risteke girîng bilîze. Gelê me yê wê parçeyê, di dîrokê de heya niha ji tevgerên netewî yên parçeyên din re bê eleqe nemaye, her tim bi qasî derfetên heyî piştgiriya xwe daye. Bi sedemên pirsgirêkên rêbertiyê, bawerî ji pêşengên kevneşopiyî nemaye. Herî dawiyê gava ku Rêber Apo bi komployek navdewletî dîl hat girtin, bi hewldanên xwe yên serhildanan tercîha xwe di aliyê Rêber Apo û PKK'ê de dan û di şexsê PJAK'ê de gihiştin pêşengtiyeke rêxistinî ya nûjen.

Kurdistana Xweser a Demokratîk, di serî de PJAK di nav de bi Kurdên wê parçeyê û tevahiya gelên wê yê Kurdistanî re û bi rêxistinbûnên pîşeyî(meslek), mirovî, çandî, rêxistinên girseyî yên demokratîk, partiyên siyasî yên ku nûnertiya beşên civakê dikin re, li ser bingehê  wekhevî, yekitiya demokratîk û azadiyê pêşxistina têkiliyan esas digire û pêşxistina ruhê hevpar û bi hilberandina polîtîkayên hevpar ên demokratîk ên netewî re pratîkbûnê esas digire. Ji bo ku rejîma Îranê were çareseriyek bi aştiyane, piştgiriya pêwîst dide. Eger wê ya nebe; bi hêzên xwe yên cewherî, bixwe çareseriya xwe pêş dixe û ji ber ku ew çareserî bikeve jiyanê, piştgiriyê dide. Di têkiliyên xwe yên bi wan hêzan re Yekitiya Konfederal a Demokratîk esas digire.

**c)** Rojavayê Kurdistanê hem di aliyê erdnîgariyê de, hem jî di aliyê gelheyê(nifûs) de parçeyê herî biçûk ê Kurdistanê ye. Gelê me yê vê parçeyê ku di bin venêrana dewleta Sûriyê de hatiye hiştin, piştî Bakur herî zû têkoşîna demokratîk a netewî naskiriye û awayeke herî hêz tevlî bûye. Bi piştgiriya xwe ya geşedanên bi parçeyên din re wêdetir, yekem car cihê xwe di nava hêmanên esil ên şoreşê de girtiye. Berê Rojavayê Kurdistanê, bi taybetî ji bo tevgerên rêberiya siyasî yên Başûr weke eniyeke paş, piştgiriya lojîstîk û weke baxçeyek palpişt dihat nirxandin. Lewma gelê me yê wî parçeyî, bi awayeke xwezayî xwe weke xwediyê têkoşînê nedidît û xwe tenê weke piştevaneke pasîf ê ku di eniya paş de disekine didît. Ji sala 1979'an şûnde belavbûna PKK'ê ya ber bi Rojhilata Navîn, bi taybetî eleqeya nêz, perwerde û hewldanên xurt ên Rêber Apo, gelê me yê Rojava bû hêmaneke esil ê şoreşê.

Çi nêzîkbûnên nîjadperest-faşîst ên partiya Baas ango pêkûtiyên xurt ên dewletê, çi jî nêzîkbûnên şoven ên civakî yên partiyên sosyalîst û komunîst ên dûvikên SSCB, bû sedem ku Kurd bi metirsî nêzî rast û çepên hêzên pergalê bibin. Her çi qasî hin kesayet û malbat di nava grupên wisa de cihê xwe girti bin jî, piraniya Kurdan bi awayeke guman nêzî pêkhateyên wisa bûne û tim xwe dûrî wan girtine. Bes piştî ku hêviya rizgarbûnê di PKK'ê de dîtin, bi hemû hêza xwe ve tevlî refên têkoşînê kirin.

Kurdistana Xweser a Demokratîk; divê herî zêde ji bo rêxistinkirina gelê me yê Rojavayê Kurdistanê tevbigere û ji bo ku bigihije maf û azadiya demokratîk a netewî, divê di nava hewldanan de be. Despêkê KCK Rojava di nav de ku di vê parçeyê de birêxistiye, bi komun û meclîsan ku hêza nûner a gelê me ne, bi partiyên siyasî, rêxistinên girseyî yên demokratîk û pêkhateyên beşên civakî re, pêşxistina têkiliyan esas digire. Li ser bingehê Konfederala Demokratîk û bi feraseta têkoşîna hevpar, li ser bingehê cudahiyan wekheviyê, yekitiya netewî, demokrasî û azadiyê esas digire.

## 3- Dîplomasiya Derve ya Kurdistana Xweser a Demokratîk

(Têkiliya wê ya bi dewletên unîter(yekgirtî)- gelên cîran; Tirk, Ereb, Fars, Ecem, Tirkmen- beşên civakî yên mezhebî û olî- bi rêxistinbûnên xweser ên demokratîk û hêzên demokrasiya kûrewî yên di asta kûrewî de re) :

Kurdistana Xweser a Demokratîk ne mehkûmê jiyanek ku têkiliyên xwe ji cîhana derve re girtî ne û ne mecbûr e ku têkiliyên xwe bi tene dewletên unîter

ên ku di nav de jiyan dike re sînordar bihêle. Bêguman têkiliyên xwe yên bi derve re, wê bi têkiliyên ji dewletên unîter ên ku di nav de jiyan dike re, pêk bîne. Sedemên wê ya yên siyasî, aborî, çandî, hiqûqî, derûnî hwd. hene.

Beriya her tiştî mirov dikare sedemên psîkolojîk ên weke çandî, aborî, siyasî, xizmanî yên ku çavkaniya xwe ji jiyana hevpar digirin a gelên ku bi sedan sal in di nava wan dewletên unîter de jiyan dikin, bîne ziman. Bi taybetî jî di wan dewletan de bi gelên sereke yên weke Tirk, Ereb û Fars, di heman demê de bi dehan grupên gel ên kêmar ku di heman erdnîgariyê de jiyan dikin re, mîrateyek dîrokî ya hevpar heye. Bi esasî pevçûn, nakokî û şikestinên ku bi demê re gel xistine bin bandora xwe û çavkaniya xwe ji serdestan digire, di nava gelan de bûye sedemê bêbaweriyê û wê ya di asteke girîng de wê bi xweseriya demokratîk re were derbas kirin. Bes ya ku dê wê ya pêk bîne, dîplomasiya wekhevperest a di navbera gelan de ye ku xwe dispêre azadiyê.

Ji bo dewletan jî heman sedem derbasdar in. Di dîroka hevpar a sedan salan de, windahî û deskeftiyên ku bi hevre hatine jiyan kirin hene. Dîsa weke qutbûna ji wan dewletan armancên ku xweseriya demokratîk tenê bihêle nînin. Di rewşeke ku ew dewlet jî hebûn, vîn, maf û azadiya Kurdistana Xweser a Demokratîk bipejirîne de, wê bibin xwediyê hiqûqeke avaker a hevpar. Eger bê qebûlkirina wan dewletan Kurd xweseriya xwe ragihînin û şûn de li ser bingehê peymanên ku pêş dikevin hiqûqek ku bi terzê domandina jiyana bi hev re ava bibe, ew jî bi serê xwe wê bibe sedemeke girîng a ku di dîplomasiyê de dibin hevbeşên pêşî. Eger ew her du rewş pêk neyên û ji hev

qutbûn jêveneger bibe, bêguman Kurd neçar in ku ji bo wê ya jî amade bin. Di rewşeke wisa de jî ne qengaz e ku dijminahî heya dawiyê berdevam bike. Lewma ji bo têkiliyên Kurdistana Xweser a Demokratîk a bi dewletên unîter ên cîran re, divê perspektîfên gelek bi saxlem hebin.

Bi redkirina vebijêrka dawî mirov dikare wan pêşbiniyan bike; Kurdistana Xweser a Demokratîk ne pêkhatin an ji projeyek çareseriyê ya ku holêrakirina dewletan dike armanc e. Ne dijîtiya dewletê, ne jî helwesta pînekirina dewletê ye, bi dewletê re qasî ku dikare demokratîk bike têkilî datîne û ger dewlet neyê demokrasiyê, têkoşîna li hemberî dewletê esas digire. Di bingehê têkiliyên bi dewletê re de, naskirina hiqûqa hev du heye û li ser bingehê peydakirina rê û rêbazên demokratîkirina dewletê ku dewlet xwediyê taybetmendiya navendparêziya hişk e û her cure geşedanan di navendê de dixitimîne, pêşxistina têkiliyan esas digire. Ew jî ne kareke ku bê têkilî, beraftin(mûzakere) û diyalog pêk were.

Xweseriya demokratîk çawa ku qutbûna ji dewletê nîne, bi armanca holêrakirina zemînê jiyana hevpar a gelan jî tevnagere. Berovajî wê, di tevahiya mijarên ku welat eleqedar dikin de yên weke; bi dewletê re hevparbûn, têkiliyên navnetewî, ewlekariya derve, aboriya netewî û bazirganiya derve, li ser hiqûqa dewleta unîter tê meşandin. Di aliyê din de jî, di mijarên ku rêveberiyên herêmî eleqedar dikin de, wê hiqûqek ku dewrkirina erkan a ji bo rêveberiyên herêmî-xwecihî hebe.

Li gorî wê; a) Parlamentoyên Xweseriya Demokratîk bi xwezayî wê bi parlamentoya netewî re têkilî û hevkariyeke xurt hebe. b) Hikumet-Hikumetên Xweseriya Demokratîk wê bi hikumeta netewî re têkiliyeke xurt hebe û pê re di nava hevsengiyê de be. Bêguman têkiliya xurt a ku di wir de tê ziman, wê weke têkiliya hawirdor a ku bi awayeke xurt ji navenda pêkhateya unîter ve girêdayiye nebe. A ku di wir de tê ziman; têkiliyek wekhevparêz a ku xwe dispêre azadiyê û berjewendiya kesekê qurbanê ya keseke din nake ye.

Her wiha, weke têkiliyên ku di navbera saziyên xweser û saziyên netewî de, wê heman têkilî di nava rêveberiyên herêmî an jî herêmên xweser ên demokratîk de jî derbasdar be.  Çaxê ku gelek mijar du yan jî zêdetir herêmên xweser an jî rêveberiya xwecihî eleqeder dikin, bi awayeke rasterast dibe ku rêveberiya netewî eleqedar neke. Wê demê, ji xeynî rewşeke nelihevkirinek cidî, ne pêwîst e ku rêveberiya netewî xwe tevlî wan mijaran bike.

## Dîplomasiya Di Navbera Gelan De

Projeya Xweseriya Demokratîk ne projeyeke ku tenê ji bo Kurd û Kurdistanê hatiye pêşxistin. Ango ne projeyeke ku tenê ji bo grupek nijadî, yek erdnîgariyê an jî tenê ji bo beşeke olî-mezhebî pêktê ye. Îro di Tirkiyê de 7 herêmên îdarî hene. Hejmareke gelek zêdetir herêmên xweser ên demokratîk, rêveberiyên xwecihî yên xweser ên demokratîk hwd. dikare werin ava kirin. Tevahiya beşên civakî yên Tirkiyê, gava pêwîstî pê dîtin, dikarin rêveberiyên xwe yên xweseriya demokratîk ku dikarin di tê de bi rehetî xwe bînin ziman û xwe birêxistin bikin, ava bikin.

Elewî, Laz, Çerkez, Asûrî-Sûryanî, Rum, Musewî, Ereb hwd. dikarin rêveberiyên xwe yên xweseriya demokratîk ava bikin. Riya herî bi tendurist a demokrasiya rasterast û pêşxistina vîna jiyana hevpar û berjewendiyên hevpar; bi awayeke azad di xwe îfadekirin, birêxistinkirin û di her qada jiyanê de xwe gihandina hêza nûnertiyê de derbas dibe. Ew, dê bibe hêwên û çîmentoya herî bi hêz a yekitiya dildarî.

Ji bo pêkanîna tevahiya wan hevparbûnan bi rêkûpêkirina makezagonî û zagonî re, bi peydakirin û pêkanîna riya çareseriyê re pirsgirêkên ku di pratîkê de derdikevin û navgîna xwegihandina yekitiya hin pêştir, bi dîplomasiya di navbera gelan de pêkan e.

Ji xeynî Tikiyê heman feraseta ku bi Kurdistana Xweser a Demokratîk pêk tê, ji bo têkiliyên dewletên Ereb û ya Fars jî ku di serî de gelê Ereb û Fars di nav de ne û ji bo têkiliyên tevahiya grup û gelên din ên Îran, Iraq û Sûriyê jî derbasdar e. Eger pêk were heya di avakirina Konfederasyona Netewên Demokratîk ên Rojhilata Navîn de jî dikare pêşengtiyê bike û ew jî di nava peywirên dîplomasiya Kurdistana Xweser a Demokratîk de ne.

Di asta kûrewî de jî wê têkiliyên dîplomatîk ên Kurdistana Xweser a Demokratîk, bi hêzên demokrasiyê re hebin. Bi tevgerên dijî kûrewîbûnê, Rêxistian Efûyê ya Navnetewî, organîzasyonên mafên mirovan, ***Rojeva Xwecihî 21***,(Rêxistinek ku bi armanca diyarkirina rojeva bajaran bi rêveberiyên xwecihî, civaka sivîl û saziyên wê re têm cem hev û hem pêşxistina demokrasiya beşdarî, hem jî pêşxistina qalîteya jiyan û hawirnasiyê dike armanc.) ***Porto Allegre***(Bajareke ku li başûrê Birezîlyayê cih digire û

bi terzê rêveberiya xweser jiyan dike.) re û kurtasî bi hêzên demokrasiya kûrewî yên dijî kapîtalîzma kûrewî re, pêşxistina têkiliyên dîplomatîk ên herî berfireh, her wiha têkiliyên heyî bi hêz kirin û di wan têkiliyan de risteke navendî lîstin, erkên dîplomatîk ên sereke û bingehîn in ku Kurdistana Xweser a Demokratîk deyne pêşiya xwe.

## 4- Dîplomasiya Pekhateyên Kurdistana Xweser a Demokratîk a Bi Pêkhateyên Parçeyên Din Re

Xweseriya Demokratîk pêkhatinek ku tenê ji nîjadekê, ji erdnîgariyekê, ji grupek olî an jî mezhebî pêk tê nîne, heya tenê ya gelan jî nîne. Xweseriya Demokratîk yekitiya civatan a ku civak û beşên civakê bi nasname(nasname çi dibe bila bibe, çawa hez bikin, dikarin wisa xwe bidin naskirin) çand, bawerî, berjewendiyên aborî hwd. awayeke azad xwe îfadekirin, birêxistinkirin û di tevahiya beşên jiyanê de bidestxistina mafê nûnertiyê ye. Her wiha Xweseriya Demokratîk yekitiya civatan a ku her kesek li ser bingehê cudahiyan a li ser esasê yekitiya azadî û demokrasiyê xwe tevlî jiyana hevpar dike ye. Ji ber wê xwesertî; weke netew-dewletê ne vesazîbûneke ku yekperestî û yektîpkirinê dike ye.  Berovajî wê, tevahiya cudahiyan weke dewlemendiyê dibîne û pêkhatineke ku li ser bingehê wekheviyê di mafên netewî-civakî de yên ku jêvenegeriya jiyana hevpar in, yekitiyê ava dike ye.

Pêkhateyek wisa, rê li ber pêkhatineke dewlemend jî vedike. Ne ku mirov wan pêkhateyan hemûyan di siwanekê de bihelîne, weke avakerên hevpar ên jiyana hevpar, di maf û berpirsyariyan de hevpar-

bûn esas e. Ew jî di nava pêkhateyan de û di nava heman pêkhateyên parçeyan de şerteke jêveneger a pêşxistina têkiliyên dîplomatîn ên xweser û hevparbûna tevahiya wan pêkhateyan e.

Weke çîn û cinsa yekem a bindest tevgera azadiya jin, yek ji pêkhateya bingehîn a xweseriya demokratîk e. Pêkhateya tevgera jin a Kurdistana Xweser a Demokratîk, bi sazî û tevgerên jin ên parçeyên din ên Kurdistanê re, têkiliyên xwe yên dîplomatîk di asta herî jor de datîne û hevparbûnê pêş dixe. Bi heman awayî bi tevgerên jin ên gelên cîran re jî têkiliyek dîplomatîk, hevgirtinê, yekitiya hêzê pêş dixe û bê ku xebatên dîplomatîk û rêxistinî li rastî astengiyekî were, yekitiyê ava dike. Yek ji erka bingehîn a Rêveberiya Xweseriya Demokratîk jî ew e ku divê wê xebata rêxistinî û dîplomatîk bixe bin ewlahiyê.

Bi heman awayî tevahiya saziyên weke tevgera kedê ya demokratîk, tevgerên çandî, tevgerên ciwanan ên demokratîk, yekitiya kooperatîfên demokratîk, yekitiya cotkarên demokratîk hwd. jî di nava xwe de û bi saziyên heman ên parçeyên din re têkilî û xebatên dîplomatîk-rêxistinî wê pêş bixin. Tevahiya wan geşedanan, bi saziyên heman ên gelên cîran re, têkiliya dîplomatîk, hevgirtin, yekitiya hêzê û ger hez bikin wê xwe bigihînin pevrabûneke hin jortir. Tevahiya wan xebatan wê di bin berpirsyariya ewlahiya zagonên Kurdistana Xweser a Demokratîk û berpirsyariya rêveberiya wê de bin.

Pêkhateyên Xweseriya Demokratîk bi heman awayî di asta kûrewî de divê Tevgera Azadiya Jin di asta cîhanê de bi tevgerên jin ên demokratîk re têkilî

pêş bixe û di nava piştevaniyê de be. Dikare pirseke wisa were kirin; gelo ma tevahiya wan têkiliyan bi hev re nakevin nakokiyan? Na nakevin nakokiyan. Di asta parzemînî(kıta) û kûrewî de pêşxistina têkiliyan a tevgera kedê, ne bi zagonên xweseriyê, ne jî bi zagonên dewletên unîter e nakeve nakokiyê. Jixwe hevpeymana civakî ya ku gelê me dipejirîne jî, wê cih nade helwestên qedexeyî û sînorker. Çi qasî azadî, ew qasî demokrasî, çi qasî qedexe ew qasî bêdemokrasî ye. Bi gotineke din; "çi qas kêm dewlet, ew qas zêde civak- demokrasî ye.

**Di encam de;**

Kurd, bi wê tora pêwendiyên dîplomatîk a têkel de hem di navbera xwe de, hem jî bi gelên welatên cîran re hez dikin çawa jiyan bikin û ew jiyan dê di nava kîjan çerçoveyên nasnameyî, çandî, hiquqî hwd. de were pêşxistin, diyar dikin. Di dinyayê de wê ciheke çawa bigirin, dinyaya ku heya niha nasname, çand, bawerî û ew bixwe qebûl nekirine, ji îro pê de dê çawa nêzî wan bibe. Her wiha Kurd çi didin dinyayê û ji dinyayê çi dixwazin, wê diyar bikin.

Tora pêwendiyên civakî yên têkel ku tevahiya qadên jiyanê digire nava xwe, bê ku li ber îstismariya yekdestên sermayedar û deshilatdaran were hiştin, lê cihê layiq e tê rûnişkandin û ew dê bibe hewldana bingeh a dîplomasiya gelan.

Dîplomasiya ku bi hezaran sal e bûye qada lîstoka serdestan û bi wê ya pirsgirêkên me kûr dikirin û bê çareserî dihişt, wê di destê wan de were derxistin. Bi Xweseriya Demokratîk re tevahiya beşên civakê wê dîplomasiya xwe pêş bixin û weke amûreke çareseriya pirsgirêkên xwe dê bikar bînin û kesên ku

ber bi wê ya de neyê û wê ya nasneke jî, bi awayeke bisporî çareserkirina pirsgirêkan, dê ji bo wan kesan bibe bersiva pêwîst. Bê ku bendewarî û hêvî ji kes û deverên cuda hebe û destûr ji wan were girtin, bixwe çareseriya xwe dixe jiyanê û ew jî dibe bersiveke herî bi bandor.

## ŞAXA XWEPARASTIN A XWESERIYA DEMOKRATÎK

" Em dikarin ji wê ya re şaxa ewlahiyê jî bêjin. Ango em di wir de nîjadkujiyê digirin dest. Kurd wê çawa ji nîjadkujiyê werin rizgarkirin, divê ew were şênberkirin.

Nîjadkujiya li wir, tevahiya nîjadkujiyan digire nava xwe. Ez tenê qala nîjadkujiya fîzîkî nakim, ez qala nîjadkujiya çandî û her cure nîjadkujiyan dikim. Ango rewşa xweparastina Kurdan tê pêkanîn. Civak di wir de xweparastina xwe ava dike. Bi wê ya re qesta min; ne tenê rewşek ku çek di dest de ye. Xweparastin, ne vesaziyek çekdarî ya terzê KCK, PKK'ê ye, pêkanîna ewlekariya bixwe ya gel e. Ez qala civaka demokratîk a ku di her qadê de xwe birêxistin dike, sazîbûna xwe pêk tîne û xwe digihîne pergala xwe ya xweparastinê dikim. Wê ya zêdetir gel nîqaş dike û dikarin bigihijin encamên cuda. Mînak; gelo dê zarokên xwe bişînin leşkeriyê? Wê di leşkeriyê de cihê xwe bigirin, ew tên nîqaşkirin. Mînak; dê cerdevan çawa werin pelaştin(fesxkirin), dê meseleya cerdevanan çawa were helkirin, divê ew werin nîqaşkirin. Ew şaxa ewlekariyê, xweparastina gel bi qasî av û nan girîng e. Heya ew nebe, nayê jiyan kirin." **(Rêber Apo)**

Gava ewlekariya civakî tê gotin; di serî de taybetmendiyên nasnameyî(ziman,çand,hwd.) yên ku cudahiya civakê derdixînin holê di nav de, pêşwazî-kirina pêdiviyên jiyanî(aborî, siyasî, whd.) yên bingehîn, tevahiya astengiyên heyî(leşkerî, hiqûqî, îdarî, hwd.) rakirin û ji bo beralîkirina êrîşên ku li ser qadên jiyanê(di nava vehûnandina exlaqî-polîtîk de) yên bingehîn tên kirin, bi her awayî pêkanîna rêxistinbûna civakî tê hişê mirov.

Bi xwezayî ew rewş jî; ne rêveberiyên xweser ên ku bi dewletê re dikevin parvekirina erkê, rêxistin-bûna qada civakî ya ku cudabûna xwe bi vîna xwe nîşan dide, esas digire. Bes, di wê rewşê de mijara xweseriya demokratîk a ku Rêbertiya me qala wê kiriye û îro li ser ragihandina wê tim nîqaş tên kirin, bi wate dibe.

Du mijarên bingehîn ên ku civatên klanan derbasî jiyanê kirine ku bi tevahiya endamên xwe ve gihiştiye biryarê û bi plan kiriye, hene. Ew; pêkanîna ewlekariya civatê û pêşwazîkirina pêdiviyên jiyanî ne. Di wê mijarê de jî ya ku bi her awayî xwedî erk e, civat bixwe ye. Tevahiya karbeşiyên ku di nava peresaniya(evrim) civakî de derdikevin holê jî, li ser wê bingehê pêş ketiye. Li ser wan xwestekên civakî, her ku çû dewleta ku ew erk girt ser xwe û bi navê civakê ket hereketê, derket holê. Eger mirov bala xwe bideyê, tevahiya dewletan hebûna xwe ji bo sûd û ewlehiya sehî(gişt) û bi navê tevahiya civakê rave kirine. Ji bo wê jî feraseta ku dibêje; cihê dewlet lê nebe anarşî, teror, kaos(alozî) heye, ewlehiya tu kesekê ya can, kar û xebatê namîne, hatiye bicihkirin. Lê belê tevahiya dîroka mirovahiyê şahidiya rastiya berovajiya wê ya kiriye.

Ji bo wê temînata ewlahî an jî sûda sehiyê(kamu), ne dewlet û teşkîlatên ewlehiyê an jî rêxistinên wê yên sivîl-leşkerî-burokratîk in. Mîlyon salan û îro hêj di asteke bi sînor de be jî, bê ku rêxistinên taybet ên civakan hebin, sazûmaniya xwe ya civakî pêk anîne û pêk tînin. Ango weke ku feraseta dewletperest serwer kiriye, riya ewlahiya civakî ne yekîneyên ewlahiyê yên taybet û vesaziyên zagonî ne. Berovajiya wê, ew sedemên bê ewlehiya civakî ne. Ewlahî bi esasî di şertên exlaqî-polîtîk de ango di civakên demokratîk de pêk tê. Lewma di tevahiya qadên jiyanî yên civakî de avakirina xwerêxistin-kirinê(meclîs, komun, ocak, kooperatîf, rêxistinên tenduristî-perwerdê, kargehên aboriyê hwd.), tê wateya temînata ewlehiyê. Bi girêdayî wê ya gava tê xwestin, di bin venêrîna vîna civatî de dikare biçe rêxistinbûn an jî erkdarkirina ewlahiya taybet a ji erk tê xistin an jî tê dayîn. Bi taybetî gava teknîk û şerên rêxistinbûna leşkerî ya roja me ya îro tê fikirîn, dibe ku tenê rêxistinbûna sivîl a qada civakî nikaribe hemû pêwîstiyên qada ewlekariyê pêşwazî bike. Lê ruxmî wê ya tevahiya erk û yekîneyên ewlekarî yên ku ji ber pêwîstiyê hatine avakirin, divê di bin venêrîna qada civakî de bin. Di vesaziyên hiqûqî û leşkerî yên komunên sed sala 17-18-19. û rêxistinbûnên konfederal ên hatine ava kirin de, yên ku bi tevahî xwedî erk komun û meclîsên bajaran in. Di demokra-siya Atînayê ya serdema Antîk de, artêş û fermandar di erêkirina meclîsê de derbas dibin. Artêşeke birêkûpêk a Atînayiyan nîne, lê weke Swêd(Îsveç) a roja îro, perwerdeyên leşkarî yên vedorî(demî) hene. Dema pêwîst bike tevahiya hemwelatiyên Atînayê di bin fermandariyek ku ji aliyê meclîsê ve hatiye erkdarkirin de, her yek dibe leşkerek e. Bi vê

vesazîbûna xwe, bi hejmara xwe ya deh hezaran li hemberî artêşa Persan a sed hezaran, karibûne demokrasiya xwe li ser lingan bigirin. A di wir de esas demokrasî ye. Demokrasî jî, ji dûrketina dewletê û bi esasgirtina qada civakî pêk tê. Ji ber ku dijminê herî bingehîn ê ewlekariya civakê, dewlet û saziyên taybet ên ku girêdayî dewletê ne. Lewma xweparastin tê wateya parastina qada civakî  û nasnameya herî bingehîn a xwesertiya demokratîk.

Di mijara ragihandina xweseriya demokratîk û xweparastinê de ji xeynî mînakên ku hatine dayîn, mirov dikare mînaka Zapatîstan jî bide. Di Çileya sala 1994'an de bi hezaran xwecihî bi kevir, dar, kêr û çekan di pêşengtiya EZLN'ê (Artêşa Rizgariya Netewî ya Zapatîsta) de çar bajarên mezin ên eyalata Chîpasê ya ku dikeve sînorên Guatamalaya Meksîkayê, desteser kirin. Serhildêr, grupên cuda yên etnîkî(nîjad) ên xwecihî bûn. Hezdikirin ku pêkûtiyên ku 500 sal bûn didomiyan û komkujiyên ku bi navê 'rabûnê' 50 sal bûn berdevam dikirin, dawî lê bînin. Xwecihî digotin ku; em ê heya dawiyê parastina komunên ku me avakirine bikin û hêviyên xwe yên avakirina xwerêvebirin û terzê jiyana nû tînan ziman.

Tevgera Zapatîsta bi vê tevgera desteserkirinê navê xwe derxistin û ji mijdara sala 1995'an pêde, di herêma Zapatîsta de dest bi avakirina şaredariyên xweser kirin. Li dijî dorpêçiya leşkerî û pêkûtiyên din ên derve, Zapatîstayan li wir jî di nava her cemaetek ku her ji wan şaredariyekê pêk tîne, konseya rêvebir rêxistin kirin û ew der xistin bin venêrîna xwe. Bi wî awayî di her şaredariyekê de xweserî pêk anîn.

, ***"Ji ber ku di axa Zapatîstayan de şopandina rêvebirina kesên birêve dibin pêk were, Yekîneyên xweser ên herêma Zapatîsta hatine ava kirin. Di her herêmeke serhildêr de, dê Juntayek ku yek an jî du delegeyên ku ji konseya xweser(şaredarî) a her herêmekê ava bûye, peyda bibe."*** Ew xwevenêrîn, xwerêvebirin tê wateya rêvebirin û venêrîna gel a xwe bixwe.

Bi wî awayî şaredarî û cemaetên xweser rêxistinbûna xwe diparêzin, ji vê pêkhatina xwe re 'Juntas de Buen Gobiernoya'gotin ku hin şaredariya digire nava xwe. Di wê rewşê de wê ya konseyên xweser ên herêmê îfade dike. Her Juntayek di herêma xwe ya rêvebir de di şopandin û hilberandina çareseriyê ya nakokî û zehmetiyên ku jiyan dikin de berpirsyar e. Li gorî wê ya jî di cemaet(civat) an jî şaredariyan de gava neheqiyek çêdibe, an jî kar li gorî vîna cemaetê nemeşe, her kesek dikare serî li Juntayê bide. Ew Junta di heman demê de bi civaka sivîl re an jî di dema pêwîst dike de bi peywirdarên hikumetê re berpirsyariya pêşxistina têkilyan jî digire li ser xwe.

Zapatîstayî herêmên ku bidest xistine, li hemberî dorpêçiya leşkerî û gefên paramîlîter ên berdevam dikin, li gorî xwesteka xwe ya ku hez dikin parastin û rêveberiya xwe pêk tînin. Bi rastî jî ji derveyî feraseta piyase, dewlet û sermayedariyê jiyan dikin. Li ser erdên hevpar ên şûnde bidestxistine, teşeya rêveberiya xwe ya xweser zindî dikin. Gava wê ya dikin jî, ji hikumetê ti xizmet û fonekê nagirin.

Hikumetên Meksîkayê ew rewşa ku ji despêka sala 1995'an heya niha hatiye, rasterast nas nakin. Bi wê rewşê re ji ber ku hikumeta Meksîka û artêşa wê li

qadên ku Zapatîstî bi çalak in, wan bêbandor bikin û bandorbûna wan a qadên din asteng bikin, bi awayê dorpêçkirin dest bi operasyonan kirin. Li beranberî wan dorpêçî û operasyonan, Zapatîstî hin jî li berxwe didin û li ser erdê ku lê jiyan dikin rûxmî hebûna dewleta Meksîka, hebûna xwe diparêzin û her diçe bandora xwe zêde dikin. Ew dorpêçî ji aliyê ji sêyan yek a artêşa Meksîkayê ve tê meşandin.

Bi taybetî piştî salên 2000’an ji aliyê hikumetan ve jî hat ziman ku dorpêçiya leşkerî û operasyonan sûda xwe ji bo çareseriya pirsgirêkê nînin. Piştî wê pêvajoyê berxwedana aştiyane bi wî awayî hat fêmkirin. Li ser wê ya di pêşengtiya fermandar Marcos de, di encama meşeke aştiyê de Zapatîstan li Meksîko City hevdîtin pêkanîn û hin jî di qadên ku lê bandor in de rûxmî dewletê, bi pêkhateya xwe ya komun û meclîsên demokratîk hêzeke xweparastinê ya ku ji tevahiya xwecihiyan pêk tê, ava kirin. Ji bo wê di eyaleta Chipasê de, di herêmên xwe yên xweser de xwe bixwe birêve dibin û bi wî awayî ruhê Mayayên ku kalikên wan in, didin jiyan kirin. Weke tê zanîn ji Mayayan re “nobedarên dîrokê” jî tê gotin.

Marcos, piştî meşa xwe ya aştiyê di axiftinên ku bi rojnemevan re kiriye de nêrînên xwe yên di derbarê nêzîkbûna gel de wisa tîne ziman:

***“Xwestek û daxwaz ne yên me ne, yên wan in. Lewma ew me baştir xwestek û pêwîstiyên xwe kifş dikin. Bilêvkirina wan xwestek û daxwazan jî ne erka min, a wan e. Peywira min, wan jî ew ku bi têkoşînkirinê zemînê ku ew bikaribin daxwazên xwe bînin ziman pêkanîne. Ji bo wan aştî anîne. Erdên wan ên hatine desteserkirin ji wan***

***vegerandine. Û erka peywira xwerêvebirinê radestkirina wan e.”***

Di rastiya wê daxuyanê de wateya xweparastinê bi awayeke aşkere tê xuyakirin. Nirxandina Rêbertiya me jî ya ku me despêka mijarê daye, tê heman wateyê.

“Kurd çawa dikarin ji komkujiyê rizgar bibin, divê wê ya şênber bikin… Civak di wir de xweparastina xwe saz dike… Ez dibêjim; bila di her qadê de rêxistinbûn, sazîbûn û xwegihandina pergala ewlehiyê ya civaka demokratîk pêk were. Wê ya zêdetir gel nîqaş dike û dikarin bigihijin encamên cuda. Mînak; gelo dê zarokên xwe bişînin leşkeriyê? Wê di nava leşkeriyê de cih bigirin? Ew tên nîqaş kirin. Mînak; dê cerdevan çawa werin fesxkirin (pelaştin), pirsgirêka cerdevaniyê dê çawa were çareser, divê ew werin nîqaş kirin.” ( Rêber Apo)

Di wê beşê de ku me dîsa bi dubarekirina nirxandina Rêber Apo hewl da ku em weke hêza hewcedariya gel-civakê ya xweparastinê bînin ziman. Ji ber ku me di hemû aliyan de derfetê ku em tevgera netewî ya xwecihiyan û EZLN’ê lêkolîn bikin, peyda nekir. Her wiha gelên Çermesor ne ku ji Meksîkayê qut bibin, bi azadiyên xwe hez dikin weke parçeyek hevpariya welat bên naskirin. Têkoşîneke Meksîkayî ya ku ber bi demokrasî, edalet û azadiyan ve vekiriye, didin. Bi wê hêlê ve jî tevgera Zapatîst ji derveyî mînakên din, bê ku dest bide sînorên dewlet û nêzîkbûna ji dewlet-deshilatdariyê, çareseriya pirsgirêkê digere û di her qada jiyanê de rêxistinbûna civakî esas digire û li ser wê bingehê bi pêşxistina

feraseta xweparastinê jî, mînakeke ku divê ji aliyê me ve jî bi baldarî were şopandin.

## Di Kurdistana Xweser a Demokratîk De Xweparastin

Di wê wateyê de divê mirov ji du aliyan ve ji şaxa(bûut) xweparastinê ya xweseriya demokratîk a ku çerçoveya wê ya giştî bi nirxandina Rêber Apo hatiye xêzkirin, binêrin. Ji wan a yekemîn şaxa netewî ye.

Gava Rêber Apo konferansa netewî digire dest, di nava pênc rêgezin ku pêşkêş kirine de xweparastinê jî dinirxîne. Bi awayeke giştî wê rewşê wisa tîne ziman:

***"Meseleya Konferansê...Divê di çerçoveya şertên pênc rêgezan de were destgirtin; 1- Rêgeza şer û aştiyê, 2- Rêgeza yekitiyê, Kurdên li Tirkiyê, Kurdên li Îranê, Sûriye û Iraqê di nava xwe de wê rewşê nîqaş dikin. Di Rojhilata Navîn de Tirkiye, Îran, Iraq û Sûriye li hemberî Kurdan di nava hevkariyê de ne. Kurdên ku di wan welatan de jiyan dikin jî, divê yekitiya di navbera xwe de pêk bînin. 3- Rêgeza demokratîkbûnê, 4- Rêgeza mafên çandî, 5- Rêgeza siyaset-civak-aboriyê ya demokratîk. Bê ku Kurd sînoran bikin pirsgirêk, dikarin di navbera xwe de biçin vesaziyên aborî, bazirganî(ticarî) û civakî. Divê tevahiya wan rêgezan di konferansê de zelal bikin. Di konferansê de mijareke din a ku were nîqaşkirin; hêzên çekdarî yên Kurdan ên ku niha hene divê weke yekîneyên xweparastinê werin parastin. Li Başûr yekineyên Kurdan Pêşmerge hene. Hêzên çekdarî yên PKK'ê jî bi Pêşmergeyan re vediguherin hêza netewî ya Kurd. Bi hêzeke***

***parastinê ya ku tevahiya Kurdan ji komkujî û pêkanên weke wê diparêze û ewlehiyê pêk tîne ve, tê veguherandin. Berpirsyariya parastina Kurdên her çar parçeyan digire ser xwe. Ew hêz dikarin weke yekîneyên xweparastinê bimînin..."***

Bêguman formûlasyona ku bi wî awayî hatiye ziman, divê weke hatina gel hev a hêza leşkerî ya tena serê xwe neyê fikirîn. Gava her pênç rêgez tên gel hev, a ku derdikeve holê feraseteke parastina gel an jî xweparastineke weke RRF(Rêxistina Rizgariya Filîstinê) ya konjonktûra heyî ya netewa Kurd e. Di rewşeke ku şertên din pêkneyên de, jixwe ne konferansa Kurd digihije armanca xwe, ne jî xwepastinek ku tevahiya hêzên çekdarî yên Kurdan tîne li cem hev, pêk nayê. Bêguman konferans xebateke bingehîn a roja me ya îro ye ku divê pêk were.

Dîsa di aliyê din de bi kinahî be jî em feraseta xweparastinê ya ku bi esasî navenda xwe Bakur e, lê ji bo tevahiya parçeyan jî derbasbûna xwe heye, bînin ziman:

***"Xweparastin pêkhatina çekdarî ya terzê PKK, KCK'ê nîne, pêkanîna ewlahiyê ya ku gel xwe bixwe pêk tîne ye. A ku ez tînim ziman; di her qadê de sazîbûn û rêxistinbûna civaka demokratîk a ku xwe digihîne pergala xwe ya ewlehiyê ye..."***

Pêwîst e ku em roja îro ya ku em di dîroka têkoşîna xwe de weke merheleya çaremîn bi nav dikin û ruxmî dewletê ragihandina xweseriya demokratîk esas digire, di çerçoveya perspektîfa Rêber Apo de binirxînin û nêz bibin.

Ji wan a yekemîn; xweparastinê weke pêkhatineke çekdarî a terzê PKK-KCK'ê nabîne. Lê di mînaka parastina netewî de jî weke ku me dîtiye, em nikarin pêkhatineke wisa jî red bikin.

Mijara din; xweparastin tenê weke pêkhatineke çekdarî bi dest nayê girtin. Xweparastin di derbarê nasname û xwejiyanê de, di her qadê de rêxistinbûna civakê îfade dike. Ji bo wê jî weke ku di gelek mijaran de heye, divê di mijara leşkerî û cerdevantiyê de jî civak biryara xwe bide.

Çaxê ku civak li beranberî erkek wisa dimîne, weke Marcos jî daye diyar kirin; li kêleka herikadina ber bi têkoşînê ve ronîkirin û rêxistinkirina civakê, her wiha bidestxistina nirxên ku ji aliyê hêzên mêtînger ve hatine desteserkirin, wê bibe erkekî me yê esasê ku em tevlî xaneya nirxên civakî dikin. Li ser vê bingehê xwestekên bingehîn ên ku heya niha ji aliyê têkoşîna azadiyê ve hatine meşandin, dewlet qebûl bike yan jî qebûl neke, pêwîst e ku derbasî jiyanê bibin. Nirxên demokratîk ên ku 35 salên dawiyê hatine bidestxistin, hin jî rû bi rûyê xeteriya tesfiyekirinê ne. Komkujiyên ku nêzî 85 sal in didomin û xwe dispêrin înkar-tunekirinê, bi rêbazên cuda hin jî berdewam in. Civaka Kurd rû bi rûyê komkujiyên aborî, siyasî, çandî hwd. ne. Lewma sekna civakê ya ku xwe li beranberî wan komkujiyan diparêzê, di heman demê de dibe têkoşînek xweparastinê.

Mînak, çawa ku boykotên ku di hilbijartina referandum û vekirina dibistanan de dikevin wê bergehê, qursa zimanê Kurdî ya ku Medya biçûk li Amedê di mala xwe de vekiribû, dikeve nava vê bergehê. Keça biçûk a ku li Wêranşarê ku

raşehitiyan(meczûp) hewl dida birevînin û ji aliyê gel ve rizgarkirina vê keça biçûk û girtina wan raşehitiyan jî dikeve nava vê bergehê. Di aliyê din de li Şemzînan bombevanên ku ji aliyê serfermandariya giştî ya Tirkiyê ve weke "zarokên baş" hatibûn binav kirin, ji aliyê gel ve hatibûn girtin û bi belgeyan ve sûc û kiryarên ku li hemberî gel pêk anîbûn hatibûn aşkere kirin, mirov dikare wê helwesta gel jî weke feraseteke bi bandor a xweparastinê bigire dest.

Weke ku di wan mînakan de diyar dibe, Kurd li hemberî rewşên wisa ên ku çand û jiyana wan dixe xeteriyê, bi rêxistinî an jî jiberxwe ve helwestên xwe derdixînin holê. A girîng ew ku; li hemberî gefên ku civakê dixin xeteriyê wê ya li gorî rêza pêşîn û zanebûnî-rêxistinî pêş bixin.

Kurd, ji xeynî komkujiya fizîkî li beranberî kîjan komkujiyan rû bi rû ne, xuya ye. Komkujî; ji ber ku civakek ji holê were rakirin êrîşeke bi berfireh e ku hêzên organîzeyî bi plan û zaneyî-rêxistinî dimeşînin. Wê ya sûcê mirovahiyê ye. Wê gavê ne tenê di wateya gelan de, ji aliyê hiqûqa navnetewî de jî ew êrîşên ku weke sûc tên hesibandin çi ne? Divê bi teqez ew rast werin tespîtkirin û li gorî wê rêxistinbûn werin kirin. Rêbertî gava mijarên weke akademî, malên penahiyê(xwespartinê), kooperatîf, meclîs, konsey, kongre tîne ziman, di heman demê de wan weke navendên xweparastinê jî dinirxîne. Divê em jî li ser wê bingehê xweparastinê bigirin dest.

Lewma rêxistinbûna ziman-çanda Kurd a ku li hemberî komkujiya çandî tê pêşxistin û tevahiya cureyên têkoşînê(weke mînaka boykot û qursa li malê ya ku hatibû dayîn) yên ku li hemberî çanda serdest a

komkujîner tên dayîn, di nava bergeha xweparastinê de ne.

Tevahiya rêxistinbûnên(partiyên siyasî, rêxistinên civaka sivîl hwd.) ku li hemberî komkujiya siyasî tên pêşxistin û teşeya têkoşîna ya ku tê pêşxistin (boykota referandumê û bêîtaetiyên sivîl hwd.) di nava bergeha xweparastinê de ne.

Rêxistinbûnên hilberandin-birandoxî (mezaxî) yên ku xwe dispêrên keda kolektîf a ku li hemberî komkujiya aborî tê pêşxistin an jî dê were pêşxistin, di heman demê de xisletê(karakter) çalakiya herî demokratîk a ku pêdiviya madî ya bingehîn pêşwazî dike, digire ser xwe. Bi taybetî gava ku mirov li rastiya Kurd a hewl tê dayîn ku tevahiya nirxên wê bi riya birçîbûnê werin firotin û gavên ku di wê qadê de tên avêtin û têkoşîna ku li dijî yekdestîkirinê tê meşandin, tê wateya xweparastineke bi bandor.

Li hemberî artêşa Tirk a ku weke navenda komkujiyên fizîkî, hebûna xwe didomîne û li ser Kurdistanê her cure komkujiyan pêk tîne helwest danîn û neşandina zarokên Kurdan a leşkeriyê, mijarên girîng ên xweparastinê ne. Her wiha gelek girîng e ku di serî de cerdevan di nav de, tevahiya gel divê li hemberî pergala cerdevaniyê xwedî helwest bin.

Weke di mînaka Zapatîstan de hatiye jiyan kirin, bi ragihandina xweseriya demokratîk ji zabita an jî polîsan vêdetir, weke hêza xweparastinê bi awayeke çekdarî rêxistinbûna milîsan jî di nav de, sekna gel a birêxistinî dê risteke gelek girîng bilîze. Bêguman ne tenê li Bakur, gava ku mirov li hêzên çar parçeyan û herêmên din dinêre, her wiha li hêzên navnetewî û

êrîşên wan dinêre, hezeke bi bandor a gerîla dê weke hêmaneke herî girîng a xweparastinê hebûna xwe bidomîne.

Tevahiya wan hêzên ku hatine diyar kirin, wê çavkaniya xwe ne bi rêxistinbûna terzê dewletê, wê ji rêxistinbûna civakî bigirin. Weke xwezayî civaka ku di her qadê de rêxistin bûye, wê di her qadê de bi awayeke xurt xwe li dora jiyanê kom bike û biryardariya xwe ya xwerêvebirinê nîşan bide.

Eger bi baldarî lê were nêrîn, heya li wir û ji wir şûn de formûlasyonek rêxistinbûna dewletekê nîne. Qala polîsên ku dê di bajaran de werin saz kirin û qala hiquqa ku dê herêmê de were pêkanîn nehatiye kirin. Eger mêtîngerî dest ji înkarê berde û vîna demokratîk a gelê Kurd nas bike û dest ji polîtîkaya xwe ya komkujiyî berde, wê gavê hiquqa ku dê pêk were, dîplomasiya ku dê were pêşxistin, çalakiyên hevpar an jî yên cuda yên tên kirin an jî birêxistinbûn, dikarin bibin rojev. Di beşe ku heya li wir hatiye ziman de şaxa ewlehiyê ya xweseriya demokratîk, bi awayeke giştî di asta "ruxmî dewletê dê pêk were" de bi dest hatiye girtin. Di şertên komara demokratîk de ya ku li ser bingehê dewlet+demokrasî tê ava kirin, bi dewleta ku ber bi demokrasiyê ve nerm dibe re, civak dikare pêkanîna xweparastina xwe nîqaş bike.

## NÊZÎKBÛNÊN ÇEWT ÊN DI DERBARÊ XWESERIYA DEMOKRATÎK DE

Di sed salên 19. û 20. de, di xisûsa ‘ mafê tayînkirina çarenûsa xwe ya netewan’ de ku ji tevahiya netewan re hatiye nasîn, li ser bingehê dersderxistina Kurdan a ji dîrokê eger pirsek were kirin; bersiv xweseriya demokratîk e. Lê belê ev xweseriya demokratîk çi qasî li gorî naverok û cewherê xwe tê nîqaşkirin. Li gorî hin kesan; ji ku hatiye ne diyar e û bê wext e, li gorî hin kesan; ji bo ‘ Kurdistana Demokratîk a Yekgirtî û Serbixwe’ gaveke pêşîn e ku Kurd tavêjin, li gorî hin kesan jî; di nava dewletê de dewleteke cuda ye… Eger ne wisa be, vê gavê ew xweseriya demokratîk a ku gelek tê nîqaşkirin, di rastiya xwe de çi ye? Eger mirov bi angaştên ji derve anîn ên ku bi awayên cuda tên ziman bigire dest, bêguman xweseriya demokratîk a ku Rêbertiya me qala wê dike wê neyê fêmkirin. Ji ber ku her kesek xweseriya demokratîk li şûna ku kesê ew aniye ziman guhdar bike û fêm bike, li ser bingehê agahiyên ku ji mînak an jî çavkaniyên cuda girtine, dinirxîne.

Divê em ji despêkê bidin diyar kirin ku projeya xweseriya demokratîk xwe dispêre perspektîfa ‘dewlet+demokrasiyê’. Xwesertî di vê formûlasyonê de rista “zêdekê”(+) dilîze. Ango xwesertî di navbera dewlet û civaka demokratîk de bi esasî rista pireke hiqûqî dilîze. Lewma di wir de em qala formûlasyona yekgirtî ya ku ji sê hêmana pêk tê, dikin: ‘Dewlet’, ‘xwesertî’ û ‘demokrasî’. Di nîqaşên ku çerçoveya wan têgehan tê kirin de çewtiyên cîdî hene, ew jî dibin sedem ku xweseriya demokratîk şaş were fêmkirin.

Xweseriya demokratîk a ku rojaneyî tê nîqaşkirin, ji bo gelê Kurd û dewleta Tirk gihiştiye xisleteke(karakter) cuda. Li gorî naveroka xwe xweseriya demokratîk, taybet hem ji bo gelê Kurd, hem jî ji bo giştî ji aliyê dewletê ve nasîna tevahiya civakê pêwîst dike. Lê belê dewleta Tirk hin jî gelê Kurd weke gel û civak, weke hêzeke bi vîn nasnake. Li ser wê ya komkujiyeke pir alî li ser gelê Kurd ferz dike. Lewma di merheleya ku em di tê de ne, her çi qas dewlet Kurdan weke vîn nasneke jî, bi konfederalîzma demokratîk a ku di sala 2005'an de hatiye ragihandin, xweseriya demokratîk kirine xwedî naverok. Lewma mirov dikare qala du aliyên bingeh ên xweseriya demokratîk bike. Ji wan yek; sazûmankirina têkiliya bi dewletê re ye. Ji wê hêlê ve di dewlet+demokrasiyê de bi rista zêdek(+) radibe. Aliyê wê yê din jî; xwe bi têkiliyên dewletê re û mafên ku ji dewletê digire, sînordar nahêle û di cewher de jî rêxistinbûna ji derveyî dewletê ya ku dewletê di jiyana civakî de bê bandor dike ye. Ya duyemîn, xweseriya demokratîk weke naverok dike kirûyek(diyarde) nêzî konfederalîzma demokratîk. Wê ya nayê vê wateyê ku her du heman tişt in. Hin zêdetir rewşeke pratîk a nenêzbûna dewleta mêtînger a ber bi têkiliya xweseriyê ve derdikeve holê.

## Nêzîkbûnên Çewt Ên Di Derbarê Xweseriya Demokratîk De:

### 1- Nêzîkbûnên ku xweseriya demokratîk dispêrin nîjadekê, çandekê, gelekî an jî pêkhateyeke cuda ya civakê

Xweseriya demokratîk xwe naspêre pêkhateyek tenê ya civakê, xwe dispêre tevahiya pêkhateyên civakê. Naveroka têgeha 'civaka' li wir, divê weke 'tevahiya beşên ku ji derveyî dewletê mane' were fêmkirin. Gava em qala 'tevahiya beşên ku ji derveyî dewletê mane' dikin jî, em tevahiya beşên civakê yên ku ji derveyî hêza dewletbûnê ya serwer û ji derveyî deshilatdariyê mane, tînin ziman. Rêberê me ji wan beşan re 'civaka jêr' an jî 'gel' dibêje û ji ber ku were fêmkirin, ji beşa dewletî re jî 'civaka jor' dibêje. Têgeha gel a di wir de jî, ne di wateya formeke civakî de, di wateya jidervemayîna dewletê de tê bikaranîn. Lewma xweseriya demokratîk pergala vê civaka jêr e.

## Xweseriya Demokratîk Xwe Dispêre Pêkhatina Piraniyî Ya Civakê

Angaşta ku xweseriya demokratîk derxistiye holê, xwe naspêre rastiya civakek bi parçeyî. Ji ber ku her cure parçekirinê weke hilberîna pergala dewletperest a hiyerarşîk dibîne. Lewma ew parçebûn di aliyekê de civakê qels dikin, di aliyê din de jî kesên serdest wan parçeyên qels îdare dikin û ji dewletê re rewabûnekê çêdikin.

Xweseriya demokratîk feraseteke ku civakê weke pêkhatineke organîk(zîndî) dibîne. Li gorî vê ferasetê civak bi tevdayî ye û tevahiya pêkhateyên wê, di çerçoveya potansiyel û cewherên xwe de, di nava

hevgirtiniyekê de cihê xwe digirin. Civak jî vê hevgirtinê, ji exlaq û polîtîkbûna xwe digire. Ji ber wê ya jî exlaq û polîtîkayê weke xwezaya civakî an jî weke cewher ango xwezaya civakê dinirxîne. Civakê weke yekitiya cudahiyan a ku bi hev re ne û ji bo hev hene, pênase dike. Di têgihiştina civakê de reng, deng û cudahî hene û ew giştî weke pêkhateyên şixulker ên organîzmayê hevgirtinekê ava dikin. Ew angaşt di civak û xwezayê de bi navê tekîtiyê(yekperestî) tiştekê qebûl nake. Tekîtiyê weke mirin an jî tunebûnê pênase dike. Lewma xweseriya demokratîk weke pergalek têgihiştina civakî ya giştî dibîne. Ji ber ku xweseriya demokratîk parçe nake, xwe naspêre parçeyekê(Kurd an jî Tirk, Elewî an jî Sûnî, jin an jî mêr, hindikayî an jî piranî…) tenê. Jixwe her cure parçebûnê weke ji dûrketina cewherê xwe û hêzek ku îdarekirina parçeyan dike, weke parçeyek ji dewletê dinirxîne.

## Xweseriya Demokratîk Xisleteke Gerdûnî Digire Ser Xwe

Ji ber ku xweseriya demokratîk pergalek bi hêzkirina civakê ya ku di nava nakokiyan de ye, xwe dispêre tevahiya civakê. Di serdema dewletî ya em jiyan dikin de, dewlet û deshilatdariyê rehên xwe berdena her qadên jiyanê yên civakê û civak dorpêç kirine. Ji ber ku civak di her qadên jiyanê de li hemberî dewletê bibe hêz, nabe ku xweseriya demokratîk bibe pergalek herêmî û xwedî sînor. Ji ber wê gerdûnî ye û li her derê li dijî dewletê, civakê dike xwedî hêz. Lewma ji aliyê gel ve jî bê ku li hebûn an jî nebûna pirsgirêka ziman, çand, nasnameyê binêre, li cihê ku dubendiya dewlet û civak peyda dibe, pêwîstî bi xweseriya demokratîk heye. Di rojaneyî de jî kesên

ku pêwîstiya xwe bi xwerseriya demokratîk hene, ne tenê gelê Kurd e. Ji ber wê ya xweseriya demokratîk rêxistinbûna gelê Tirk di nav de, tevahiya gelên ku li Tirkiyê jiyan dikin, ango tevahiya civakê dike armanc. Heya li welatên Ewropayê yên ku di asteke girîng de pirsgirêkên wisa li ser xwe derbas kirine jî, pêwîstî pê heye ku civak ji dewletê rizgar bibe û bibe xwedî hêz, lewma li wan deran jî divê daxwaz û xebatên xweseriya demokratîk hebin. Cihê dewlet lê heye, divê li wir xweseriya demokratîk a ku parastina civakê dike û derfetên xwepêkanîna wê ava dike hebin. Ji ber ku xweseriya demokratîk ji dewletê dixwaze ku civakê bi hemû pêkhateyên wê ve nas bike. Çaxê ku dewlet vîna civakê nas bike, xisûsa ku dê ew civak pergala xwe çawa birêxistin bike, êdî li ser feraset û terzê jiyanê ya wê civakê dimîne.

Weke tê dîtin; ji ber gelê Kurd hebûn û jiyankirina xweseriya demokratîk tê rojevê. Bes wê ya nayê wê wateyê ku xweseriya demokratîk tenê bi gelê Kurd re sînordar e. Xwesriya demokratîk çawa ku ji bo gelên din jî derbasdare, xwe bi gelan re jî sînordar nahêle û xwe dispêre tevahiya civakê ya ku xwediyê rastiyeke piranî ye. Tevahiya beşên civakê li hemberî dewletê bi îrade dike û derfetên ku her kes bikaribe rengê xwe di çerçoveya nirxên komunal ên demokratîk de jiyan bike, ava dike. Ji ber wê xweseriya demokratîk a tevahiya civakê ye û divê tevahiya beşên civakê xwedî lê derkevin û weke pergala xwe bihesibînin.

**Nêzîkbûnên Ku Xweseriya Demokratîk Bi Awayî 'Dewleta Navendî+Dewleta Xwecihî' Digirin Dest:**

Ji girêdayî pirsgirêka Kurd xweseriya demokratîk a ku li ser nîqaş tên kirin, dibe ku herî zêde di vê mijarê de nêzîkbûna xapandinî çêdike. Li gorî wê, xweseriya demokratîk ji bo xeyala ' Kurdistana Demokratîk, Yekgirtî, Serbixwe' ku çavkaniya xwe ji feraseta ' ji her netewekê re dewletek' digire, weke gavek pêş an jî amadekariyekê tê nirxandin. Ji ber wê jî xweseriya demokratîk weke taktîk tê destgirtin, lewma tê gotin ku PKK tişta heyî berovajî nîşan dide û bi tundî li dijî xweseriya demokratîk derdikevin. Êrîşên bizanebûn ên li ser gel û civakê li aliyekê, gotinên wisa yên kesên ku xwe weke 'civakparêz', 'demokrat' pênase dikin jî, bi rastî nêzîkbûna wan a reştarî ya di derbarê PKK'ê de, bi xwe re hebûna cehaletekê nîşan dide.

## Xweseriya Demokratîk Hilberîna Angaştek Ku Çareseriyê Ji Derveyî Dewletê Dibîne Ye

Angaşta ku dibêje; PKK bi xweseriya demokratîk ji bo dewleteke ' yekgirtî û serbixwe' amadekariyê dike, gotinek vala tîne ziman û bi her awayî ji angaşta demokrasiyê, ji terzê jiyan û feraseta dîrokê ya xweseriya demokratîk re bi nakok dibe. Xwendinên me yên dîrokê û qeyrana binyadî ya pergala hiyerarşîk û dewletperest a ku di roja me ya îro de jiyan dike, bi awayeke zelal ew tişt nîşan daye; rêxistinbûnek ku xwe dispêre dewletê an jî bi riya dewletê çareseriya pirsgirêkên civakî, ne pêkan e. Berovajiya wê, çavkaniya tevahiya pirsgirêkên civakî,

feraseta dewleyê ya serwer-deshilatperest e. Heya ew çavkanî neyê ziwakirin, heya ji feraset, sazîbûn û pergala dewletê rizgarbûn çênebe, çareseriyeke mayinde ya pirsgirêkên civakê ne pêkan e. Gava mirov bi vê perspektîfê lê dinêre, weke çavkaniya tevahiya pirgirêkên civakî dewlet xuya dibe. Ji ber wê jî; kesên ku çareseriya pirsgirêkan dikin armanc, nabe ku pêkhateyekî ku dibe çavkaniya pirsgirêkan, bike armanc. PKK bi pêkanîna guherîna paradîgmayî, wê ya bi awayeke teqez di rojeva xwe de derxistiye. Êdî ji aliyê şaristaniya navendî bixwe ve jî pergala hiyerarşîk-dewletperest û her cure versiyonên vê, di dîroka civakî de ne weke pêşketin, weke paşketin dibîne. Sedemê ku gel û bi awayeke giştî civakbûn ew qasî bê hêz hatine hiştin, di bingehê ku nikarin xwe bixwe têra xwe bikin de, operasyonên parçekirina sîstematîk ên ku dewlet li ser civakê dide meşandin hene. Xebata herî domdar û stratejîk a dewlet dike, bi awayeke sîstematîk(birêkûpêk) parçekirina civakê ye. Ji ber ku civakên hatine parçekirin, tevahiya(bitûnî) wan xerab dide, ji xwezabûna xwe derdikevin û dibin civakên bê hêz. Ji ber ku di rewşeke wisa de civak, ji tevahiya(bitûnî) xwe ya ku ji cudahiyan pêk tê, derdikeve û nikare hêza xwe kom bike. Ji ber bêhêzbûna xwe civak têra xwe nake û weke keriyên ku tên ajotên dibe.

Lewma di merheleya heyî de sazkirina dewletê, bi dewletê re hevparbûn, parvekirina deshilatdariyê û dewletbûn, ji bo PKK û xeta wê ya bîrdoziyî ji armancekê vêdetir, rastiyeke bi rûreş e ku divê li hemberî wê bê sekinîn û têkoşîn were meşandin. PKK ne bi dewletbûnê, li hemberî pergala dewletperest di hundir û derve de, tenê bi meşandina têkoşîneke bi

hêz dikare biserkeve. Jixwe PKK di merheleya heyî de, di her firsendê de dide diyarkirin ku; riya yekane ya mirovbûneke rast, bi awayeke rasterast ji qutbûna pergala hiyerarşîk-dewletperest de derbas dibe. Hemû hêza xwe jî, ji bo '***di gelemperî de qutbûna ji nîvenda dewletê, di taybet de jî, ji qutbûna jiyana modern a kapîtalîst***' serf dike. Qutbûneke wisa jî weke ***' zayîna sêyemîn'*** pênase dike û her kesekê li ser wê bingehê dawetî mirovbûneke rast dike. Di rewşeke wisa de ti rastiyeke ku dibêje; PKK hewl dide dewletê saz bike û xweseriya demokratîk weke zemîneke dewletê binirxîne, nîne. Ji aliyê PKK'ê ve rêgeza sereke ya serkeftin, pêkanîna şoreşê û şoreşgeriyê, li ser nirxên polîtîk û exlaqî ku em weke xwezaya civakê pênase dikin, zêdekirina nirxan e û li gorî wan nirxan jiyan kirine. Riya wê jî; di jidervemayîna dewletê de û di têkoşîna li hemberî tevahiya versiyonên dewletê de derbas dibe.

### 3- Nêzîkbûneke Din a Çewt; Nêzîkbûna Ku Dibêje Xweseriya Demokratîk Bi Sînoran Dilîze û Weke Tişteke Ku Berovajî Pêkhateya Unîter(yekpare) Nîşan Dide Ye

## Cudahiya Dewleta Unîter-Dewleta Netewe

Di bingehê nêzîkbûna ku xweseriya demokratîk a weke projeyekê hewl dide da ku pêkhateya unîter ji holê rake de, hem şaş fêmkirina xweseriya demokratîk heye, hem nezanîna cudahiya ku di navbera dewleta unîter û dewleta netewe de heye û hem jî tevlihevkirina wan heye. Sedema bingehîn a wê ya, hişmendiya ku dewleta unîter û dewleta netew weke heman tişt dibîne ye. Têkilheviya wan her

duyan, di wir de risteke xuyaker dilîze. Bes, divê em bidin diyar kirin ku; her du pênase jî, ji bo şaxên cuda yên ravekirina dewletê tên bikaranîn. Em dikarin cudahiya bingehîn a di navbera wan her du pênaseyan de wisa formûle bikin: Netew-dewlet weke ruh, felsefe, feraset û bîrdoziya dewletê ya ku weke rewşekî girêdayî guherîna di serdema moderniteya kapîtalîst de pêk tê ye, dewleta unîter jî, tê wateya model an jî forma rêxistinbûna wê. Lewma ya yekemîn rewşeke ku girêdayî cewherê dewletê pêk tê ye, ya duyemîn jî, di derbarê teşeya dewletê de ye. Lewma çawa ku netew-dewlet dikare di pêkhateya unîter de nebe, dewleta unîter jî bi derbaskirina feraseta netew-dewletê dikare xwe nêzî standartên demokrasiyê bike. (Weke Fransaya roja me ya îro)

Dewleta unîter weke makezagonî serweriya xwe bi rêveberiyên herêmî û xwecihî re parve nake û teşeyeke dewletê ya ku rêveberiyê di bin otorîteyek navendî de kom dike ye. Zagon û makezagonên ku di navendê de tên çêkirin, li her derê welat tên pêkanîn. Ew rewşeke girêdayî çawaniya unîteriya dewletê ye, di gelek dewletên unîter ên roja me ya îro de, ew çawanî neçar bûye ku were derbas kirin. Ew çawanî, herî zêde heya nîveka sed sala 20. karibûye were domandin. Mînak; rûxmî ku Îngiltere dewleteke unîter e, Îskoçya, Galler û Îrlandaya Bakur zagon, parlamento û hikumetên xwe hene. Dîsa heman rewş ji bo Îspanya û Fransayê jî derbasdar e. Lewma unîterî, li pêşiya demokratîkirina dewletê ne asteng e.

Gava qala demokratîzekirina dewletê tê kirin, a tê qestkirin; li hemberî civaka demokratîk hesaskirina dewletê ye. Teşe dikare li gorî wê pozîsyonê be. Ji vê hêlê ve jî xweseriya demokratîk bi hin guhertinên ku

tên kirin, bê ku bi pêkhateya dewletê ya unîter re pirsgirêkê jiyan bike, dikare pêk were. Divê bi awayeke teqez cewher û feraseta netew-dewletê ya ku xwe dispêre helandina her cure kêmhejmaran (hindikahiyan) û gelên ku ji derveyî dewletê dimînin, were derbas kirin. Lewma bi feraseta netew-dewletê ya bişavtîner, yektîpkirin, xweferzkirin, pêkûtîner, nîjadperest û redker re her tim di nava nakokî û pevçûnê de ye. Nirxandinên Rêber Apo yên di wê mijarê de pêşiya me vedike:

***"Çawa ku gelek caran di navbera hêzên demokratîk û hêzên şaristanî de pêktê, hêzên modernîteya kapîtalîst û hêzên modernîteya demokratîk jî dikarin hebûn û nasnameya hev qebûl bikin û li ser bingehê naskirina rêveberiyên xweseriya demokratîk, bi hev re di nava aştiyê de jiyan bikin. Di bin wê bergeh û şertan de, di nava hundir û derveyî sînorên netew-dewletê de pêkhateyên siyasî yên konfederala demokratîk û pêkhateyên netew-dewlet dikarin bi hev re di nava aştiyê de jiyan bikin. Çawa ku konfederalîzma demokratîk xwediyê vê taybetmendiyê ye ku dikare neyîniyên ku ji ber pergala netew-dewlet derketine derbas bike, amûra herî guncav a polîtîkirina civakê ye jî."***

## Xweseriya Demokratîk Ne Projeya Cudakeriyê Ye, Ya Yekitiyê Ye

Xweseriya demokratîk ne hilberîna hewesê avakirina dewletê û binesaziyeke dewletê ye û xwe dispêre tevahiya civakê, lewma sînoreke xwe ya xuya nîne. Xweseriya demokratîk çawa ku xwe naspêre ti sînorên erdnîgariyî, bi sînoran re jî mijûl nabe. Bi vê

hêla xwe ve jî, bi pêkhateya unîter re nakok nabe. Ji ber ku formûlasyona ku çawa dikare bi dewletê re were jiyankirinê ye, berovajiya ku tê angaştkirin ne projeyeke cudahiyê ye, projeya yekitiya azad a ku xwe dispêre tevahiya civakê ye. Pergaleke di nava cudahiyan de pêkanbûna pevrebûnê nîşanî me dide. Riya sereke ya jiyankirina reng, deng, cudahiyan û riya herî guncav a xwezaya civakî ye. Jehrkujiya(panzehîr) li dijî nîjadkujî û yekperestiya netew-dewletê ye û tê wateya pergaleke berdîl (alternatîf).

Berovajiya ku tê angaştkirin ne xweseriya demokratîk, netew-dewlet jevqetan û dabeşker e. Ji ber ku organîzastona netew-dewletê ji her kes û her tiştî re jêbûniyê(eynîtî) dispêre. Ji bo xweza û civakê jî eynitî nîne û eynîtî di cewherê xwe de tişteke nahewîne. Eynîtî xwe dixe navenda her tiştî û dahêneke endezyarî ya feraseteke serdest a ku xwe li ser her kesekê ferz dike ye, ji ber ku ji derveyî xwezabûnê ye, ne pêkane ku bi encam be. Jixwe dewletên Ewropayî jî yên ku dahênerên(mûcîd) netew-dewletê ne, ruxmî ku di asteke girîng de dest ji wê ya berdane, dewletên weke dewleta Tirk ku paşdîtî, hêj di wê de israr dikin. Bi rastî jî mirov tenê li dîroka dewleta Tirk a ciwan binêre, netew-dewlet bi çi qasî komkujîner e, dê were dîtin. Anatoliya ku weke baxçeyê gelan e, di merheleya heyî de ji gelek gelan re bûye goristan. Gelên ku bi demdirêjî di Anatoliyayê de jiyan kirine, hema bêje ji Anatoliyayê hatine paqijkirin. Mirov dikare Rum, Ermenî, Sûryaniyan weke mînak bide. Di dema komara Tirk a netew-dewletperest de ya ku li ber kesên ne Misilman ketiye; tenê komkujî, mişextî û çokdanîn bûye. Ya ku para

kesên Misilman bûye jî, her çi qasî di nava xwe komkujiyên fizîkî bihewîne jî, zêdetir komkujiya çandî bûye. Di rewşa îro de, hema bêje gelên din ên Misilman bi temamî bûne Tirk û mirov li rastî têgihiştinên ku dikare xwedî nasnameya xwe derdikeve û xwe weke rengeke cuda ya ku dikare jiyan bike, nayê. Bişavtina ku li ser nasname, ziman, çand û jiyana civakê pêk hatiye, rengên din jî tune kirine. Bi wî awayî jî 'tekîtî' ku ne xwezayî ye, derketiye holê. Mirov dikare bêje ku; yên li hemberî wê ya hewl dane ku reng û cudahiyên xwe biparêzên û ji bo wê berdêlên giran dane û di merheleya heyî de yên bûne sedem ku di feraset û pergala netew-dewletê de şikestinên mezin çêbin, gelê Kurd e. Ji wê hêlê ve têkoşîna ku gelê Kurd dimeşîne, di rastiya xwe de têkoşîna xwegihandina cewherê berê yê Anatoliya ku baxçeyê gelan bû. Ji ber wê jî Kurdan weke 'dabeşker, cudaker' sûcdarkirin, bi her awayî şaş e û bi wê ya veşartina komkujî û dabeşkeriya esil a ku netew-dewlet pêk tîne, tê armanckirin. Gelê Kurd, bi yekitiyê re ye û xwediyê pergala xweseriya demokratîk a ku projeya çareseriyê ye. Di esasê xwe de yên ku dabeşker û komkujîner, deshilatdarên Tirk û netew-dewleta komara Tirk a ku organîzasyona wan a siyasî ye. Êdî dem hatiye ku gel ji netew-dewlet û feraseta wê ya ku bi dem, xwezabûn û bi asta gelê Kurd a ku gihiştiyê re nelihevhatî ye û di heman demê de rizî û mehiye, rizgar bibe. Tiştên ku Komara Tirk jiyan dike jî, bi vê rastiyê re girêdayî ye. Îro Komara Tirk, di navbera mecbûriya guherîn-veguherîn û israkirina terzê klasîk de maye. Ew jî dibe sedem ku di nava gengeşiyê de be û sanciyan jiyan bike.

Cihê ku dewlet lê heye, li ser bingehê demokratîk û komunaliyê ji nû ve bi esasgirtina avakirina civakê, xweseriya demokratîk xwe bi sînorên ti netew-dewletekê heps nake. Neyîna sînorên xweseriya demokratîk, ji ber neyîna sînorên civakê ye. Weke ku me li jor jî daye diyar kirin, ew projeyek gerdûnî ye. Li hemberî dewleta yekperest, tê wateya rêxistinbûna civakê ya ku xwediyê gelek xisletan(karakter) e, di heman demê de girîngiyê dide jidervemayîna dewletê. Ji bo wê jî xweseriya demokratîk yek mirovekî/ê bê rêxistin nahêle, dewletê ji jiyana civakê dûr dixe û xwe bixwe têrîkirina civakê pêş dixe û wê ya weke nêzîkbûna herî stratejîk digire dest.

## Bi Xweseriya Demokratîk Tevahiya Cudatî Digihijin Mafên Xwe Yên Ku Hatine Xespkirin

Xisûseke din a girîng ku di wir de were fêmkirin; xweseriya demokratîk tenê taybetmendiyeke erdnîgariyî nagire ser xwe, lê ew rewş li pêşiya avabûna taybetmendiyên erdnîgariyî ne asteng e. Ango xweseriya demokratîk li gorî taybetmendiya civakê ya pirpêkhate, ji hebûna hêmanên erdnîgariyê re ne xemsar e. Nexwe dê ji pêkhateyeke civakê re derfetên xweparvekirinê neyên naskirin. Mînak; di qadeke erdnîgariyî ya ku nasnameyeke civakî lê zêde bûye de, çawa ku ew nasnameya nîjadî dikare pergala xwe ya xweser ava bike, ew kesên ku girêdayî vê nasnameya nîjadî ne jî ku di erdnîgariyeke din de jiyan dikin, dikarin di nava wê pergalê de cihê xwe bigirin. Bi awayeke herî hêsan; eger em rewşa Kurdan bigirin dest, teşeya pêkhatina xweseriyê neçare ku wisa be. Weke tê zanîn ku Kurd di erdnîgariyeke pir belave de

jiyan dikin. Mînak, mirov dikare bêje ku tenê li Stenbolê nêzî şeş mîlyon Kurd jiyan dikin. Nêzîkbûneke xweseriyê ya ku xwe dispêre erdnîgariyê, dê bibe tunehesibandina rastiya wê çawahînî û çendanîhiyê. Lewma mirov nikare xweseriya demokratîk tenê weke hêmaneke erdnîgariyî binirxîne.

Xweseriya demokratîk a ku li girêdayî cudahiyên civakê pêşdikeve, eger ji hêla dewletê ve were naskirin, dewlet neçar dibe ku ber bi demokrasiyê ve nerm bibe ango biguhere, lewma mafên ku di wir de tên bidestxistin, wê tevahiya gelan û hemû beşên civakê jê sûd bigirin. Ji ber wê jî weke ku hatiye gotin; mafên ku tên xwestin, tenê bi gelê Kurd re ne sînordar e. Eger em ji bo Tirkiyê bêjin; mafên ku mewzûbehs in, dê ji bo Anatolyayê, hemû gel û beşên civakê yên ku li Kurdistanê jiyan dikin, derbasdar bin. Tevahiya gelên din û hindikahiyên olî an jî civakên cuda, di rewşeke azad a demokratîk de wê bibin xwediyê mafê bikaranîna mafên xweseriyê û xwe birêxistinkirinê. Mînak; civatên gelan ên weke Çerkez, Laz, Gurcî hwd. wek civatên nîjadî wê bikaribin xwesertiya xwe birêxistin bikin. Wê bigihijin derfetên ku dikaribin ziman, çand û dîroka xwe jiyan bikin û pêş bixin. Tevahiya wan civatên nîjadî weke dewlemendiyekê wê di nava pergala demokrasiyê de cihên xwe bigirin. Bi wê ya re girêdayî, dê civatên olî ên weke Êzîdî, Xiristiyan, Elewî û hwd. jî bikaribin baweriya xwe li gorî xwe jiyan bikin û jiyana xwe birêxistin bikin. Di wir de dewlet neçar dibe ku ji netew-dewletê dûr dikeve û li hemberî hemû pêkhateyên civakî di pozîsyoneke wekhev de bisekine. Cureya dewletê ya ku weke ‘Komara Demokratîk’ tê pênasekirin jî, tenê wê demê dikare derkeve holê. Dewletên ku bi

perspektîfa netew-dewletê ya ku ti mafeke civakê nasnakin tevdigerin, erdnîgariya ku lê jiyan dikin veguherandine goristanekê, lewma her çi qasî berovajiya wê ya gotinên wan hebin jî, ber bi demokrasiyê ve girtîne. Mirov dikare tenê dikare ji bo komareke Tirkiyê ya ku bi tevahiya gelan re lihevhatiye û tevahiya beşên civakê yên ku dikarin bi awayeke azad û wekhev xwesertiyên xwe jiyan bikin re 'komara demokratîk' bêje.

### 4- Nêzîkbûnên Ku Xweseriya Demokratîk Weke Pergaleke Civakî Ya Ku Ti Eleqeya Xwe Bi Dewletê Re Nîne Digirin Dest.

Em di serdemeke dewletî de diyan û her çi qasî em sînoran esas negirin jî, em di nava sînorên ku dewletan xêz kirine de jiyan dikin. Xweseriya demokratîk jî di rastiya xwe de formûlasyona dewlet+demokrasî rave dike.

## Xweseriya Demokratîk Di Heman Demê De Cudabûna Xwe Ji Dewletê Daxwaz Dike

Dewletan, mafên gelan û bi awayeke giştî mafê civakan di asteke girîng de xesp kirine. Lewma divê di roja me ya îro de dewlet ber bi demokrasiyê ve werin guhertin. Ji ber ku tiştên ku gel ji dewletan bixwazin hene. Ji aliyê civakê ve tişteke ku ji dewletê neyê xwestin nîne. Ji ber ku dewlet hemû qadên jiyana civakî kontrol dike, beralî dike û dewlet pergaleke ku bi rojaneyî hez dike bi bandor bibe ye. Pergala xwe ji derveyî dewletê girtin û hewldana ji derveyî dewletê mayîn, tişteke cuda ye. Bes, ji ber ku bi dewletê re tê jiyan kirin, têkiliyên ku bi dewletê re hene berçav derbaskirin û weke civak, dewleta ku ber bi demokrasiyê ve naguhere jê re daxwazkirina maf,

tişteke cuda ye. Daxwaza ji dewletê, nayê wateya ku mirov an jî civak bi dewletê re were girêdan. Berovajiya wê, ji ber helwesta azadîxwaziyê ye ku daxwaz ji dewletê tê kirin. Lê, ji ber ku ew rewş bi girêdayî birêxistinbûna qada civakî pêş dikeve û eger civaka birêxistî ji derveyî dewletê bi serbixwe qada xwe ya peywirê fireh bike, digihine wateyekê. Ango ji dewletê daxwazkirin, tenê ji derveyî dewletê birêxistinkirina qada civakî dikare bigihije wateyê. Nexwe ti wateyeke meşandina têkoşînê ya li hemberî dewletan namîne. Ya girîng; bi rêxistinbûna ji derveyî dewletê bê ku xwe tevlî têkiliyên dewletên ên ku di nava sînorên wê de cih digirin bike, bê ku yekî tercîhê ya din bike, her duyan bi hev re meşandin e.

Xweseriya demokratîk di çerçoveya parvekirina erk-deshilatdariyê de û tenê weke têkiliya di navbera dewlet û civakê de bidestgirtin çi qasî şaş be, tenê weke rêxistinbûneke civakî ya ji derveyî dewletê bi dest girtin û weke ku ti pêwendiyeke xwe bi dewletê nîne bidestgirtin jî ew qasî şaş e. Li jor, weke rêxistinbûna ji derveyî dewletê me di asteke xuya de qala xweseriya demokratîk kir. Niha jî bi mînakên cuda yên dinyayê hiqûqa xweseriya demokratîk a bi dewletê re çawa dibe, em ê bînin ziman. Lê rewşek di wir de heye ku divê em bal bikişin li ser û rave bikin.

Hema bêje di tevahiya welatên ku pêkanîna xweseriya demokratîk pêk hatiye de, ji ber ku perspektîfa ku jê sûd hatiye girtin di tewereya(eksen) dewletê de ye, di nava xwe de rêxistinbûna komunalîst demokratîk a civaka polîtîk-exlaqî di asteke pir kêm de dihewîne. Lewma feraseta ku naveroka xweseriya demokratîk dadigire, gelek ji perspektîfa konfederalîzma demokratîk dûr e. Zedetir

modelên ku di parvekirina deshilatdariyê de dewrkirina erk esas digirinin. Jixwe xisûsa herî girîng a ku xweseriya demokratîk ji modelên din ên xweser cuda dike, feraseta me ya xweseriyê ya ku di xisletê demokratîk de ye. Xisletê wê ya demokratîk; tê wateya ku ne dewletperest e, ango dabeşkeriya erkê ya ku xwe dispêre deshilatdariyê qebûl nake.

Di wê wateyê de xweseriya demokratîk di nava dewletê de nayê wateya dewleteke din a duyemîn. Tê wateya li dijî dewletê parastina xweseriya civakê. Ji xeynî taybetmendiya wê ya ku ji derveyî dewletê ye, ji ber ku di jiyanê de demokratîk e, her kesekê dike endameke çalak a polîtîkayê. Ji ber wê taybetmendiyê, xwe dispêre demokrasiya rasterast û demokrasiya komunal, bi heman awayî xwe dispêre exlaq û polîtîkaya ku cewherê xwezaya civakî û civatan esas digire. Tevahiya wan tiştên ku hatine diyarkirin, feraseta xweseriya demokratîk ji feraset û modelên xweseriyê yên ku pêk hatine weke cewher û binyadî cuda dike. Eger em bi yek hevokê bînin ziman; ferasetên din ên xweseriyê, xwe dispêrên hevkariya dewletê, lê xweseriya demokratîk tê wateya rêxistinbûna civakê ya ji derveyî dewletê.